

K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



NOSTALOJÎ DI HELBESTÊN HACÎ QADIRÊ KOYÎ DE

LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

Shakhawan Khoshawi Mustafa DOLAMARI

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Van- 2020

T.C
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI



HACİ QADİRÊ KOYI'NIN ŞİİRLERİNDE NOSTALJİ

YÜKSEK LİSANS

HAZIRLAYAN

Shakhawan Khoshawi Mustafa DOLAMARI

DANIŞMAN

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Van- 2020

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Shakhawan Khoshawı Mustafa DOLAMARI tarafından hazırlanan “Nostaloji Di Helbestên Hacı Qadirê Koyî De ” adlı bu çalışma, 13/01/2020 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

2020
Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ
Enstitü Müdürü



BİLDİRİM

Hazırladığım tezin/raporun tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin/raporumun kâğıt ve elektronik kopyalarının Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü ABD arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım:

Tezimin/Raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

Tezim/Raporum sadece Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi yerleşkesinden erişime açılabilir.

Tezimin/Raporumun yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden erişime açılabilir.

[Jüri Tarihi]

[İmza]



Shakhawan Khoshawi Mustafa DOLAMARI

NAVEROK

NAVEROK	I
(Nostalojî Di Helbestên Hacî Qadirê Koyî De)	III
KURTE	III
(Haci Qadirê Koyi'nın Şiirlerinde Nostalji)	IV
ÖZET.....	IV
ABSTRACT.....	V
PÊŞGOTIN	VI
KURTEBÊJE	VIII
DESTPÊK.....	1
1. Nostalojî	4
1.1. Têgeha Nostalojîyê	4
1.2. Pênaseya Nostalojîyê	5
1.3. Cûreyên Nostalojîyê	14
1.3.1. Nostalojîya Takekesî (Xwedî)	15
1.3.2. Nostalojîya Giştî (Cem'î)	17
1.4. Nostalojî û Rehendên Cuda Cuda Yên Wê.....	19
1.4.1. Nostalojî û Derûnzani (Saykoloji)	19
1.4.2. Nostalojî Di Dîrokê De.....	23
1.4.3. Nostalojî û Edebyat.....	28
1.4.4. Nostalojî û Klasîzîm.....	30
1.4.5. Nostalojî û Romansîzîm	33
1.4.6. Nostalojî û Riyalîzîm	35
1.4.7. Nostalojî û Sîmbûlîzîm	38
1.5. Nostalojî Di Edebyatê De	41

1.5.1. Nostalojî Di Edebyata Ewropayê De.....	41
1.5.2. Nostalojî Di Edebyata Kurdî De.....	43
2. Nostalojî Di Helbestên Hacî Qadirê Koyî De.....	53
2.1. Jiyana Hacî Qadirê Koyî	53
2.2. Hacî Qadir û Xwendina Melatîyê	54
2.3. Jiyan Hacî Ya Li Istenbulê	55
2.4. Nostalojîya Takekesî (Xwedî).....	57
2.4.1. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Serdemê Ciwanîyê.....	57
2.4.2. Nostalojîya Dûrî Li Bajar û Gund.....	59
2.4.3. Nostalojîya Dûrî Li Malbat û Hevalan	61
2.4.4. Nostalojîya Dûrî Li Me'suq:	64
2.4.6. Nostalojîya Pîrî û Hizir Kirin Li Mirinê û Tirsî Mirinê:	66
2.4.7. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Nav Xwezayê:.....	69
2.5. Nostalojîya Giştî(Cem'î).....	71
2.5.1. Nostalojîya Dûrî Li Welat	71
2.5.2. Nostalojîya Bîranînên Dîrokî û Neteweyî:.....	73
2.5.3. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Kesayetîyên Neteweyî:	75
2.5.4. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Efsaneyan:.....	80
Encam.....	84
Çavkanî	86
JİYANNAME	90

Lîsansa Bilind

SHAKHAWAN KHOSHAWI MUSTEFA DOLAMARI

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Berfanbar- 2020

(Nostalojî Di Helbestên Hacî Qadirê Koyî De)

KURTE

Armanca serekî ya vê vekolînê, pêk tê li derxistina Nostalojîyê di nav helbestên Hacî Qadirê Koyî. Herweha naskirina têgeh û pênaseyên Nostalojîyê. pêşçavxistina Nostalojîyê li nav Edebyata cîhanî. Herweha naskirin û rengvedana Nostalojîyê li nav Edebyata Kurdî û hebûna Nostalojîyê di nav Edeba Kurdî de. Sedema vê vekolînê ew bû, Nostalojîya li alfyê Hacî Qadirê Koyî bi sedema derbider bûnê bû li warê xwe ji bo Istembolê. Ev dûrketine jî bûye sedem ku li nav helbestên Hacî Qadir de herdû cureyên Nostalojîyê hebin, Nostalojîya Giştî û Takekesî. Herçend Nostalojîyaya takekesî di helbestên wî rengvedan kirîye, lêbelê zêdetir Nostalojîya giştî rengvedan kirîye di nav helbestên wî de, bi sedema hindê ku Hacî Qadirê Koyî zêdetir di xema gelê xwe de bûye, ku hertim Hacî Qadiri pêkol kirîye ji bo pêşketina gelê xwe, ji bo vê çendê jî gelek xem ji bo gel û milletê xwe xwarîye.

Peyvên Sereke: Nostalojî, Saykolojî, Bîranîn, Vegeryan, Êş, Xerîbî, Diltengî, Hacî Qadirê Koyî, xwedî, Giştî.

Hejmara Rûpelan: 102

Şêwirmend: Doç. Dr. Nesîm SÖNMEZ

Yüksek Lisans

SHAKHAWAN KHOSHAWI MUSTAFA DOLAMARI

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

Aralık- 2020

(Hacı Qadirê Koyî'nın Şiirlerinde Nostalji)

ÖZET

Bu çalışmamızın temel amacı Hacî Qadirê Koyî'nin şiirlerinde Nostalji'nin etkisini ve Nostalji kavramının anlamını ve oluşumunu irdeleyip bunun Dünya Edebiyatı üzerindeki etkilerini ortaya çıkarmaktır. Bunun yanı sıra Nostalji'nin Kürt Edebiyatı'ndaki izlerini ve etkilerini üzerinden inceleme yapmaktır. Bu çalışmamızı ortaya çıkaran sebep Hacî Qadirê Koyî'nin kendi yurdundan İstanbul'a göç etmesidir. Bu hasretlik Hacî Qadirê Koyî'nin şiirlerinde Nostalji'nin her iki türünün de olmasına sebep olmuştur; Genel Nostalji ve Öznel Nostalji. Hacî Qadirê Koyî'nin şiirlerinde her ne kadar Öznel Nostalji var olsa da çoğunlukla Genel Nostalji'yi görürüz. Bunun nedeni de Hacî Qadirê Koyî'nin daha çok ulusunun derdine yanması, daima ulusunun ilerlemesi için çabalamasıdır. Bu yüzden de ulusu için çok çalışmıştır.

Anahtar Kelimeler: Nostalji, Psikoloji, Hatıra, Dönüş, Ağrı, Gariplik, Ezinti, Hacı Qadirê Koyi, Sahip, Genel.

Sayfa Adedi: 102

Danşman: Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Master Thesis

SHAKHAWAN KHOSHAWI MUSTAFA DOLAMARI

YUZUNCU YIL UNIVERSITÛY

INSTITUTE OF THE LITERATURE OF LIVING LANGUAGES

KURDISH LANGUAGE AND CULTURE DEPARTMENT

December- 2020

(Nostalgia in Haje Qadr Koy's Poetries)

ABSTRACT

The main purpose of this research is to identify and define nostalgia in order to represent the event of nostalgia in the case among Kurdish literature, such as the poetry of the renowned Kurdish poet Haji Qadre Koyi, also in the literature of the world. As well as understanding the consequences of nostalgia in Kurdish literature.. The result of the investigation was that a nostalgic incident with Haji was able to displace him to Istanbul. This departure led to two types of nostalgia in Haji Qadr's poetry. Individual nostalgia and general nostalgia. However, individual nostalgia can be seen in his poems. But most of the general nostalgia is in his poems. Because Haji has been capable of more in the sadness of his people. Haji has been able to make the Kurdish nation prosper like other nations. That is why sadness has had its people.

Keywords: Nostalgia, Psychology, Pain, Rememberess, Back, Exile, Dismalness, Hacı Qadre Koyi, Owner, General.

Quantity Page: 102

Thesis Supervisor: Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

PÊŞGOTIN

Ev vekolîna Edebî li ser Têgeha Nostalojî û Nostalojîyê hatîye piraktîzekirin. Herweha Nostalojî bi giştî û bi cûreyên xwe hatîye şirove kirin di helbestên Hacî Qadirê Koyî de. Ev mijara ku ji bo vê vekolînê hatîye destnîşan kirin, di warê Edebê de bi giştî û di warê Edeba Kurdî de bi taybetî girîngîyeke zêde heye, çimkî Nostalojî weke mijareke Derûnî û Edebî hêj nebûye mijareke naskirî di nav Kurdan de, bi wê wateyê ku hêj vekolîn bi awayekê belav li ser nehatine encamdan. Ev vekolîn jî dibe berhemeke pirr baş ku li ser vê mijarê hatibe bikaranîn û dibe weke çavkanîyeke baş ji bo xwendekaran were nîşan kirin daku hînî vê mijara nû derketî bibin. Herweha ev mijar li ser helbestên Hacî Qadirê Koyî hatîye praktîze kirin, ku ji vê mijarê re helbestvanê herî baş e, çimkî di serdemeke weha de bûye û rewşeke weha li ser jiyana wî çêbûye, ku bûye sedem ji bo ku pirraniya cureyên Nostalojîyê li ba wî derbikevin.

Rêbaza vê vekolînê (Tiyorî û Şirovekirin û Piraktî) ye. Di beşa yekem de bi awayekî Tiyorî ev vekolîn li ser mijara Nostalojîyê hatîye encamdan û şirove kirin, ku li gorî wan çavkanîyane ku hatîne bi destxistin. Herweha di beşa dûyem de ev vekolîn bi mînakên di Dîwana Hacî Qadirê Koyî de mijara Nostalojîyê û cureyên Nostalojîyê hatîye piraktîze kirin û şirove kirin. Navnîşanê vekolînê jî bi vî awayî ye (Nostalojiya Di Helbestên Hacî Qadirê Koyî de).

Ev vekolîn weke mijareke nû di nav Kurdan de, di warê bi destxistina çavkaniyan pirr dijarî rastî nivîsandina vê vekolînê hatine, çimkî çavkanî bi zimanê Kurdî hindik bûn. Ji ber vê çendê jî em neçar bûyîn ji bo domandin û nivîsandina vê vekolînê berê xwe bidîn zimanên neteweyên din, ku bi awayekî zêde ev mijar li ba wan vekolîn li ser hatîne encamdan. Lê bi awayekî giştî ew çavkanîyên ku weke çavkanîyên serekî hatîne bikaranîn ev in:

Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, Bergê Yekê, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2010.

Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, berga dûyem, weşanxaneya Aras, çapa dûyem, Hewlêr, 2010.

Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, Bergê Sêyê, Weşanxaneya Aras, Çapa Dûyem, Hewlêr, 2010.

Rêbwar Sîweylî, *Kitêbî Hacî Qadirî Koyî*, Weşanxaneyê Rojhelat, Çapa Yekem, 2016.

Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mistefa Şareza, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, Weşanxaneyê Kurdistan, Sine, 1390.

Boym, Svetlana, *Nostalgia and Its Discontents*. The Hedgehog Review, 2007.

Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şîrî Hawçerxî Kurdî Da*, Weşanxaneyê Taran, Çapa Yekem, 2016.

Ev vekolîn bi alîkarîya hinek mamosteyên hêja hatîye encamdan û divêt em wan ji bîr nekîn û ji bo keda wan bi min re kişandî ez xwe bi deyndarê wan dizanim û pirr ji dil spasîya wan dikim, bi taybetî jî mamoste û şewermendê min birêz Doç. Dr. Nesîm Sonmez, ku alîkarîya wî ji min re pirr zêde bû bi dirêjahîya nivîsandina vê vekolînê. Herweha hêjayê gotinê ye ku navê hinek mamoste û hevalên din jî bidim nîşan kirin, ku di vê xebatê de ji min re bûyîn alîkar, di warê bi destxistina çavkanîyan û werger kirina çavkanîyên zimanên biyanî bi taybetî jî Dr. Keyfî Ezîz û mamoste Şehzad Ehmed. Herweha spasîyeka taybet ji bo mamoste Hendirên Ehmed ku min pirr qezenc li gotin û şîretên wî kirîye di warê vê vekolînê. Herweha spasîya hemû heval û mamosteyên din jî dikim, ku bi tiştê kêrîyê jî be bûyîn alîkar di vê xebatê de.

Shakhawan Khoshawi Mustafa DOLAMARI

Van- 2020

KURTEBÊJE

r. :rupel

htd. :heta dawiyê

dr. :diktor

c. :cild



DESTPÊK

Bi sedemên siyasî û şer û mal wêranî di jiyana Kurdan de, veqetyan û xerîbî kirin ji bo malê hertim di jiyana Kurdan de hazirî hebûye, ji ber vê çendê ev ji hev veqedyan û xerîbî kirin û dûrketin ji malbat û hevalan bûye mijareke serekî di nav helbestên klasîk û moderin de. Ev diyarde jî di nav helbestên Hacî Qadirê Koyî de bala min bixwe re kişand, çimkî ew helbestvanekê girîng û naskirî ye li nav Edebyata Kurdî de. Sedema hebûna Nostalojîyê ji aliyê Haci Qadirê Koyî ve vedigere ji bo derbider bûna wî li Kurdistanê ve ji bo bajarê Istanbulê, ev awareyî û dûrketine bûye sedem ku bi xerîbî li nav welatê Roman(Osmanîyan) de biçê ber rehma xwedê.

Di vê vekolînê de emê hewil bidîn ku bizanibîn ka çawa ev derbider bûn û dûrketin li welat ji aliyê Hacî Qadirê Koyî rengvedan kirîye.

Di beşa yekem de bi awayekî Tiyorî mijara Nostalojîyê hatîye analîz kirin û li gorî çend teknîkeka ev analîz kirine li ser Nostalojîyê hatîye encamdan. Li destpêkê Têgeh û pênaseya Nostalojîyê li gorî nêrînên nivîskar û ferhengên neteweya hatîye analîz kirin, pişt re cureyên Nostalojîyê hatîne destnîşan kirin û şirove kirin. Herweha eleqeya Nostalojîyê bi Zanistên din û Rêbazên Edebî ve weke pêwîstîyek ji bo bêhtir nasandina Nostalojîyê hatîye şirove kirin. Li dawîya vê beşê de jî Nostalojî li nav Edebyata Ewropayê û Edebyata Kurdî bi kurtasî û bi hinek nimûneyên têkistên Edebî hatîye şirove kirin.

Di beşa dûyem jî bi awayekî piraktîkî vekolîn li ser Nostalojîyê di nav helbestên Hacî Qadirê Koyî hatîye encamdan, ku tê de herdu cureyên Nostalojîyê (takekesî û giştî) bi awayekî hûr hatîne piraktîze kirin, herweha her yek li wan hestên Nostalojî jî bi rêya çend nimûneyekan li helbestên Hacî Qadirê Koyî hatîye şirove kirin. Li dawîya vê vekolînê jî ew encamên hatîne bi destxistin di derheqê vê mijarê yê hatîne nivîsandin.

Armanca Xebatê

Armanca di vê vekolînê de pêkol kirine ji bo diyarî kirin û nasandina têgeh û pênaseya Nostalojîyê di helbestên Kurdî de bi nimûneya helbestên helbestvanê navdarê Kurd Hacî Qadirê Koyî, çimkî di Edebyata Ewropayê û neteweyên din di setsala bîstan û setsala 21an de girîngîyeke zêde bi mijara Nostalojîyê hatîye dan.

Edebyata Kurdî jî weke neteweyên din berhemên wê pirr in li hestên Nostalojîyê û diyardeya Nostalojîyê, lêbelê weke pêwîst vekolîn li ser nahatîne kirin.

Sedema Hêlbijardina Vê Mijarê

Sedema helbijardina vê vekolînê vedigere jî bo wê çendê ku heta niha vekolînên zêde li ser mijara Nostalojîyê nehatîne kirin û herweha tu vekolîneka Zanistî û Ekdîmî li ser Nostalojîyê di helbestên Hacî Qadirê Koyî jî nehatîye kirin, digel wê hindê jî ku hejmareka gelek kêr li vekolînan li ser Nostalojîyê hene di Edebyata Kurdî de. Yê ku haya me jê hebe tenê dû tez hene ew jî yek li zanîngeha Selaheddîn hatîye nivîsandin jî alîyê M. Soran Mamend bi navê (Nostalojî di helbestên nûjîn de), herweha teza din jî li zanîngeha Soran hatîye nivîsandin jî alîyê Dr. Helmet Bayîz ve, weke din tu vekolîneka Ekdîmî û Zanistî li ser nehatîye nivîsandin.

Sinûrên Xebatê

Li navnîşanê vekolînê xuyaye, ku mijara me Nostalojî ye di Dîwana Hacî Qadirê Koyî de. Bi wê wateyê ku tenê ew helbest hatîne şirove kirin û wergirtin, ku hestên Nostalojî tê de berceste ne.

Di vê vekolînê de Dîwana Hacî Qadirê Koyî weke bingeha vekolînê hatîye wergirtin, ku li sala 2011an Weşanxaneya Kurdistan li bajarê Sine çapa yekem derketîye.

Rêbazên Xebatê:

Ev xebata me xebateke Edebîye, herweha bi vekolînên nivîskî hatîye derxistin, bi awayekî ku rêbaza Tîyorî û Şirovekirin û Piraktîkî hatîye bikaranîn. di beşa yekem de me bi awayekî tîyorî wesfa Nostalojîyê kirîye li gorî wan çavkanîyên ku hatîne bi destxistin. Herweha di beşa dûyem de bi awayekî piraktîkî hestên Nostalojî di nav helbestên Dîwana Hacî Qadirê Koyî me daye wesif kirin û şirovr kirin.

Dijwarîyên Xebatê:

Ew dijwarîyên ku di vê vekolînê de hatine pêşya me, nebûna çavkanîyan bû weke pêwîst bi zimanê Kurdî, ev çende jî bû sedemê hindê ku ji bo domandina xebata xwe berê xwe bidîn wan çavkanîyan ku bi zimanên din hatîne nivîsandin û xwe bavêjîn ber zehmetîya werger kirina wan çavkanîyan.



1. Nostalojî

1.1. Têgeha Nostalojîyê

Destpêkê de û berî ku pênasê û çemka Nostalojîyê bidîn naskirin, gereke em ji alîyê pêkhate û çawahîya raman gehandina vî zarawey(Nostalojî) bidîn pêşçavxistin. Zaraweya Nostalojîyê li gorî ferhenga Longman a Îngilîzî, ku bi nav hinavên vê zaraweyê de hatîye xar û li gorî wê ferhengê Nostalojî bi eslê xwe di zimanê Girîkîyê de yê çûye nava zimanê Latîniyê, pişt re di navbera salên 1700-1800an yê hatîye nava zimanê Îngilîzîyê de, digel vê yekê jî ev zaraweye jibilî hinek gohertinan di formê xwe yê zaraweyî, heman ew raman û wateya hey ku di zimanê Girîkî û Latîniyê de hebûye. Her li gorî ferhenga Longman ev zaraweye(Nostalojî), li dû beşan pêkhatîye, beşa yekem (Nostos) bi wateya vegeryana malê dihêt, pişt re beşa duyem jî (Algia) bi wateya êş û azarê dihêt.¹ Li gorî serinc û li pey çûna me di derbareyê Nostalojîyê, li niha de jî di nava zimanê Îngilîzîyê de heman raman û wateya hey, ku êş û azara vegeryana malê ye. Dibe ku ev êş û azare rehendeka hizrî jî hebe û nivîsîn an jî helbestan bike mala xwe ya didoyan û xem û kulên xwe di nav de bi cih biket. Anku dibe li derdora wan bîranîn û ew şiklê jiyana xweru be ku kesek an jî helbestvanek li dem û zemenekî ku hatîye ji destdan hebe, bi wê wateyê ev kese hesret û axan dikişîne ji bo zemenkî ku hatîye ji destdan, ji ber vê çendê jî dibe ev zaraweye li ser astê takekesî û li ser astê giştî xwe menafêst bike.

Herweha li destpêkê de Nostalojî ji alîyê çemk û bingeha derketina xwe girêdayî mijarên Pizîşkî û zanistên Saykolojîyê bûye, bi wê wateyê ku li destpêka derketina xwe de weke zaraweyeke Edebî derneketîye, belkî weke zaraweyeke Pizîşkî û Saykolojî derketibû, ku di sala 1688an di xebateka akadîmî de ji alîyê xwendekarekê Siwîsrayê ve bi navê Yuhanis Hofer hatîye bikaranîn. Bikaranîna Nostalojîyê ji alîyê Hofer ve weke zaraweyeke Pizîşkî û Saykolojî ji bo wê yekê vedigere, ew serbazên bi sedema şerr û pevçûnan li welat û malbatên xwe dûrketibûn, rastî hinek haletên Derûnî yên nexweş hatibûn, weke: bê xewî, ta, dilekute û bi taybetî jî hizirkirneka zêde ji bo malbata xwe. Digel vê yekê jî ku Nostalojî weke nexweşîyekê hatibû naskirin, lêbelê tu dermanek weke çareserî ji bo vê nexweşîyê

¹ Summers, Della, and Adam Gadsby, Eds. "Longman Dictionary Of Contemporary English.", London 1995.

bikar nedihat, tenê derman û çareserya vê nexweşîyê di setsala 17an de ku dihat zanîn, vegeryan bû ji bo welat û nava malbatê.²

1.2. Pênaseya Nostalojîyê

Nostalojî weke teknîkeke nivîsîna têkistên Edebî xudan bingeh û taybetmendîyên xwe ye. Ji bo ku vê mijarê(Nostalojî) baş bidîn naskirin, divêt li wê yekê re dest pê bikîn, ka çawa Nostalojî ji alîyê nivîskar û vekolera ve hatîye pênase kirin, herweha di nava ferhengên neteweyan de bi çi awayî hatîye naskirin, anku ew tişt çîye ku dibe sedema derketina Nostalojîyê? çawa Nostalojî hatîye nava têkistên Edebî? Herweha nivîskar çawa serederîyê digel Nostalojîyê dikin? Li vir de emê li gorî wan çavkaniyên ku di destê me de hene bersiva van pirsan bidîn.

Zaraweya Nostalojîyê bi awayekî curbicur ji alîyê neteweyan ve dihête naskirin, ji bo ku em cudahîyên vî zarawayî(Nostalojî) ji alîyê neteweyên cuda cuda bizanîn, divêt li destpêkê de em wê yekê bizanibîn ka ramana Nostalojîyê di nava ferhengên neteweyan de çîye û çawa hatîye naskirin.

Ferhenga Oxford Nostalojîyê weha didet naskirin, ku "Nostalojî hestekê bi soz û xemgîn û germe ji bo rabirdûyê"³ Herweha di nav neteweya 'Ereban de û di ferhenga Elme'anî de hinek raman û hev wate li hemberî peyva Nostalojîyê hene, ku weha daye naskirin, "soz ji bo welat, peywest bûn bi demên berê, soz û xem, soz ji bo rabirdûyê, kelecânîbûn ji bo vegeryana malê û welat".⁴ Herweha di ferheng Mu'în a Farisîyê de ku li şeş bergan pêk hatîye, weha Nostalojîyê didet naskirin, "dilteng bûn bi sedema dûrbûyîna ji welat an jî diltengî li encamê wan bîranînên zêde xweş û nexweş ku li demên berê de hebûne".⁵ Di nava ferhengên zimanê Kurdî de jî peyva Nostalojî derbaz nebûye, lêbelê hinek peyv hene ku ramana Nostalojîyê didin û di zimanê Kurdî de ew peyv xwe li hemberî Nostalojîyê didin xuya kirin. Nostalojî di Ferhenga Kurdistan a Gîwî Mukiryânî de weha dihêt naskirin, "derdê dûrîyê, xem û hesret bi sedemên dûrîyê ji malbatê an jî welat û dostan".⁶ Li vir de xuyaye heger rasterast jî

² Boym, Svetlana, *Nostalgia and Its Discontents*. The Hedgehog Review, 2007, r 8.

³ Hornby, a.s., Oxford advanced leanness, *Dictionary, Oxford University*, London, 2003, r 84.

⁴ Ehmed Sabir Mihemed 'Elî, *El-Me'reb Mîn L-Lefaz L-Hizaret L-Madîyet Fî El-Qamus L-Muhît: Dîraset Tarîxîyet Fî Zewî L-Me'anî L-Mecumîyet*, Misir, 2012.

⁵ Mehmud Behbehânî, *Zeruretê Bazengerî Der Bexşê Terkîbatê Xariciyê Ferhengê Farisîyê Mû'în*, Îran, 1352.

⁶ Gîwî Mukiryân, *Ferhengî Kurdistan*, Çapa Dûyem, Weşanxaneya Rojhilat, Hewlêr, 2017.

peyva Nostalojîyê di nava zimanên xeyre Îngilîzî de tune be, lêbelê dîsa jî ew wate û ramanên ku li hemberî Nostalojîyê di nav zimanê Îngilîzî de hene, di nava zimanên din jî heman wate û raman li hemberî Nostalojîyê hatîne parve kirin, Nostalojî li gorî ferhenga wan neteweyên ku li jor hatine xuya kirin, wate û ramana wan mîna yeke û weha xwe dide naskirin, ku Nostalojî diyardeyeke, ku pêk dihêt li xem û hesret, dilteng bûn, hezkirin ji bo welat, hezkirin ji bo vegeryana welat, xem û hesret xwarin ji dûrîya welat û malbat, dilteng bûn û hizir kirineka zêde ji bo rojên berê û ji bo rabirdûyê ..htd.

Nostalojî diyardeyeke, ku li ba her kesî û her neteweyekî ve heye, lê hebûna Nostalojîyê li ba her kes û her neteweyekî dikeve formekê cuda û taybet, dibe ku helbestek ava bibe li ser êş û azarên neteweyî li çaxek û zemenekê diyarî kirî, dîsa jî dibe helbestek ava bibe li ser xerîbî kirin û dûrbûn ji malbat û welat, an jî romanek bihêt nivîsan li ser wan mirov û wan bîranînên ku hatîne ji destdan, tu kesek jî nikare wan roj û wan xweşîyên berê careka din ji mirov re vegeîne.

Nostalojî li gorî hizir û ramanên mirovan dihête guhartin, bi wê ramanê, Nostalojî li ba hemû neteweyan ve wek hev nîne, herweha li ba hemû mirov û hemû kesan jî wek hev nîne, her kes li gorî wan hest û bîranînên ku di jiyana xwe de ezmûn kirine û dîtîye coreyeke taybet li Nostalojîyê li ba wî/wê çê dibe. Niha jî wê li wan hest û taybetîyên nivîskar û vekolera meyze keyn, ka ezmûnên wan li ser Nostalojîyê çîye û çawa dê Nostalojîyê ji bo me den naskirin.

Nostalojî "eleqedarîye bi jîngehî ve, weke ku hizirkirineka têkilbûnê heye li nava mirovan de, teqlîdkirin û bîranînên wan buhayane ku hatîne ji destdan, ku ev çende jî bixwe delîle li ser hez û xwezîyên mirovên Nostalojî li ser wan cihan ku bîranînên wan digel de hene".⁷ mirov tu carî naxwaze li cih û warên xwe û mirov û malbatên xwe biqede, heger bê hemdê xwe jî li cihê xwe û malbata xwe biqede, dixwaze careka din li wan ciha vegere. Ew kesê rastî Nostalojîyê dihêt pirr caran dixwaze vegere ji bo wan rojên berê, herweha teqlîda wan deman diket û pêkolê li ser wê yekê diket ku derdoreka mîna zemanê berê ji xwe re çêke, lêbelê wexta ku dihête ser wê rastîyê ku ew tişt careka din ji mirov re venagere û nikare careka din ji bo wan

⁷ John j.su, *Ethics end nostalgia in the Contemporary novel*, Cambridge University_ London, 2005, r 22.

roja vegere, dikeve nav kul û xeman, herweha rastî barekê Saykolojîyê pirr nexweş dihêt. Ew nexweşî û diltengî jî bi aşkerayî li ser sîma û şiklê wî/wê xuya dibe.

Nostalojî "şêwazê gerrîneka dûr û dirêje, li ser ew cihê ku balkêş be di nav cîhana kevin de, kû li niha de dibe dostê xeyalên me".⁸ Cîhana kevin mebest lê ew roj û demin ku bi ser mirov de borîye, ew sefer û dîtînen wan rojan weke sefereka kur û kurt dihête nav xeyala mirov, ku digel wan xeyalan xwezaya vegeryanê ji bo cîhana kevin dixwaze, ew cîhana ku tê de bi dost û xizmên xwe dilxweş bûye, cîhana kevnar ji aliyê kesên Nostalojî ve cîhaneka bê hempa û bilinde ji bo jîyanê. "Nostalojî ew bîranînen namon ku di xeyala te da bûne, herweha tuyê wê yekê qebûl bikî, ku Nostalojîya rabirdûyê di niha de li nava xeyalan bi hemû tiştên xwe ve nemaye û li nav çûyîne, Nostalojî li dahatûyê de dihêt nivîsan li ser rabirdûyê".⁹ Lê teqez li ser mijareka din dihêt kirin ew jî nivîsandina Nostalojîyê ye, nivîsîna Nostalojîyê dikeve demê derketina Nostalojîyê li ser rabirdûyê, wate heger li niha de em bi xizim û dostên xwe re bîn û rewşa jiyana me jî pirr xweş be, lêbelê piştî demekê dirêj ku ev xweşî hatine ji destdan wê çaxê Nostalojî çê dibe û derdikeve holê, digel ji destdana xweşîyan Nostalojî ji aliyê mirov dest pê dike, pişt re dihête ser nivîsîna Nostalojîyê, hemû ew bîranîn û xweşîyên hatîne ji destdan di niha û di dahatûyê de dihête nivîsan li ser rabirdûyê, ew rabirdûya ku bi malbat û xizman re tijî bûye li xweşîyan, lêbelê niha tu xweşîyek ji wan xweşîyan nemaye.

Di nerîneka din de weha dihêt, ku "Nostalojî ji wan cihan derdikeve ku tê de hizra bîranînen rabirdûyê dihêt kirin, bal xistine ser wan cihane ku yadgarî li ser heye li demekê diyarî kirî, Nostalojî dûdil bûne ji wî cihê ku niha tê de dijît",¹⁰ Li vir de Nostalojî weha didet naskirin, ku ew kesê ji nav malbat û warê xwe diçe cihekê din û dûre ji malbat û hevalên xwe, herweha dûre ji wê xwezaya ku ew tê de mezin bûye, ji ber vê çendê jî ew bi dûdilî û şaşmayî li wê derê dimîne, qet nikare xwe digel cihê nû li hevbîne û xwe digel biguncîne, ev çende jî dibe sedem ku bikeve nava xeyal û hizrên berê, li ser vê yekê jî bi xem dikeve û li dûriya welat pirr dilteng dibe. Hemû kesek wexta ku derdikeve ji cihê ku tê de mezin bûye, nikare bi hêsanî ew dîmenên berê ji hişê xwe bavêje der û heta zemenekê dirêj xeyala wan dera ji nav hişê wî

⁸ Stephen Cheek, *Byron and place, Bristol_UK*, 2003, r 42.

⁹ Barbara Cassin, *Nostalgia*, New York_U.S.A, 2016, r 30.

¹⁰ David J. Davies, *Memory and Nostalgia for the cultural Revolution*, Washington, 2002, r 20.

dimîne, dibe ku çaxeke pirr dirêj jî bi ser çûyîna wî ji wî warî derbaz bibe, lêbelê digel dîmenekî an jî alavek û xeyalek dikare careka din hizir û hişê wî/wê dagîr bikin û careka din bavêjin nava rojên zaroktî û bi xeyalên xwe biçê nav malbata xwe.

Mihemed Ferîq Hesên dibêje: "Mirovê xerîb kesekê nenas û bê nav e, bê navnîşan e, dilê wî/wê ji cihê xwe nîye û asayîşa Derûnîya xwe ji dest daye, li wir tu kesek xerîbekî bi navê xwe gazî nake, ew ji xizim û kesên xwe veqedyaye, ew eleqeyên civakî ku bi dirêjahîya temenê xwe çê kirine hemû jî diqedin"¹¹. Xuyaye ew kesê li nava civaka xwe derdikeve û ber bi civakeka din diçe, dikeve nava tengasîyan, ji ber ku êdî kesek wî/wê nas nake, kesek nîne ku bi navê xwe gazî lê bike, bi wê wateyê êdî ew dibe kesek ku ji her tiştê xwe veqedyaye, bê nav û bê navnîşan ji nava wî civakî dimîne, rewşa derûnîya xwe jî wê ji dest bide, êdî hertim wê sîmayê wî/wê bi xemgînî xuya bike, hertim hizrên xwe davêje ser wan rojan ku digel dostên xwe û ji nav civaka xwe û neteweya xwe bi aramî dijiya. Wê hertim hesretan ji bo wan roja bixwe û xwezîyên xwe li ser vegeryana wan rojan ava bike.

Bextiyar Elî¹² ji bo rengvedana wan xem û hesretan anku êş û azarên di derencamê guhartina cihê çê dibin weha dibêje: "Ezmûna mirov digel cihê de ezmûneka nû ye, lêbelê ew pirsgirêkên di guhertina cihê çê dibin kêmîr nîne ji wan pirsgirêkan ku di demê guhertinên dîrokî çê dibin".¹³ Li gorî vê gotinê ew yek dihêt zanîn ku guhertina cihê rolekê pirr mezin heye ji bo derketina Nostalojîyê li ser saykolojiya mirovan.

Awirên kur yê li dor jiyane tên dayîn, ew jiyana ku tijîye ji qurbanîdanê û derbider bûnê, pîr bûn û îxtiyar bûna mirovan, hemû jî Nostalojîyê berhem tîne, Şêzad Hesên¹⁴ li ser Nostalojîyê weha di peyve; "Nostalojî vegeryane li dor hemû ew tiştên ku mirov di jiyana xwe de dorandine an jî hemû ew tiştên ku di jiyane de hatîne ji destdan, jiyaneka ji dest çûyî ye, erdnîgarîyeka ji bîr kirîye ya wan pîremêr û îxtiyarên ku bûyîn qurbanîyên ceng û şeran, ku bi dest pirsgirêkên temen û merg û tenêtîyê û çaverê bûnê di nalin".¹⁵ Li vir jî sedemeka din a çê bûna Nostalojîyê xwe

¹¹ Mihemed Ferîq Hesên, *Hêmin û Bonî Xerîbî*, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2008, r 49.

¹² Bextiyar Elî Romannivîs, Helbestvan û rewşenbîrê navdarê Kurd e, di sala 1960ê li bajêrê silêmanîyê ji dayîk bûye, nihajî akencîyê welatê almanyayê ye.

¹³ Bextiyar Elî, *Naşiwên*, Weşanxaneya Karox, Çapa Yekem, 2019, r 122.

¹⁴ Şêzad Hesên Nivîskar, helbestvan û wergerê Kurd e, li sala 1951ê li bajarê hewlêrê hatîye dinyayê.

¹⁵ Şêzad Hesên, (*Nazîla û Namoyî û Nostalojîy nexus*) Govarî Raman, Hejmara 210, Hewlêr, 2014, r 67.

dixe hole, ew jî çê bûna Nostalojîyê ye di derencamê şer û pevçûnan de, xuyaye di hemû çaxan de û ji nava hemû neteweyan de şer û pevçûn çê bûne, gelek mirov di wan şeran de canê xwe ji dest daye, herweha gelek mirovan jî xizim û dostên xwe bi sedma şeran ji destdane, hejmareka zêde jî bi sedema wan şeran ji cih û warên xwe veqedyane, ev yek jî dibin sedemên derketina Nostalojîyê, ew bîranînên bi sedema şer û pevçûna ji mirov re dimînin, dikarî bibêjî pirranîya wan yadgarîyan bîranînên nexweş in, an jî ji derencamê wan şeran de ewa ku ji mirov re vedmîne, êş, xem, diltengî, barekê Derûnîyê nexweş, hizir kirina ew kesên ku mirovî ji destdane ..htd, ev hemû êş û azare bi bandora şeran dihête serê mirovan.

"Nostalojî ax û nalîne ji bo ji destdana ciwanîyê, weke hemû ew wêneyên ku eleqeya wan bi rabirdûyê ve heye hûnerîn, her ji ber wê çendê ku ew ciwanîyên me ji destdayîn careka din dihêne hizra me..xem xwarine ji bo nebûna derfetên evro di rewşa doh de..Nostalojî hest kirine bi hazir û bîranînên rabirdûyê".¹⁶ Temenê lawî û ciwanîya mirovan yek ji wan tiştane ku mirov gelek pê dil xweş dibe, ji ber vê çendê jî wexta ku mirov ev lawî û ciwanîya xwe ji dest dide wê bikeve nav xeyalên wan rojan ku tê de ciwan û bi hêz bûye, herweha bi hizrên xwe rojên xwe yên berê wê di demê niha de bi cih bike, digel wan xeyalan rojên xwe yên berê wê vejîne, lê digel derketina wan xeyalan û dîtina rastîya xwe ku ji destdana ciwanî û temenê lawîyê ye, wê çaxê ew mirov wê pirr perêşan bibe û ewrên xeman serê wî dagîr bikin û wî/wê têxin nava kul û derdan. Nostalojîya temenê lawî û ciwanîyê yek ji wan cureyane ku pirr xwe xuya diket ji alîyê mirovan ve û bandoreka zêde jî li ser helbestkaran çê kirîye.

Herweha di nerîneka din a li gorî Nostalojîyê ku ji alîyê Rêbwar Sîweylî¹⁷ hatîye dan, weha li ser Nostalojîyê dihête ziman, ku "Nostalojî hestekê xemgînîye di astê cih de û di heman demê jî de dilxweşbûneka derdemendane ye bi wan tişt û kes û cihên rabirdûyê, ku mirov eleqeyeka kur digel hebûye û di niha de ji wan dûre".¹⁸ Nostalojî ne tenê xemgînî û êş e, belkî dibe ew derd û kulên dibin sedema derketina Nostalojîyê ew yadgarî û xweşîyên berê bin, wexta ku ew xweşî dihêne hizra mirov û dilê mirov pê re xweş dibe, lê dilxweşbûneka derdemend e, dilxweşbûnek ku digel de

¹⁶ Mihemed Ehmedî, (*Le Mer Nostalojîyawe*), Govarî Raman, Hejmara 196, Hewlêr, 2013, r 92-93.

¹⁷ Rêbwar Heme Emîn axayê gundê Barî Biçûk, zanîngeh li beşa felsefeyê li welatê danîmarkê temam kirîye, heta sala 2000 li welatê danîmarkê jiyaye, piştî vegeryaye Kurdistanê û li zanîngeha selahedîne bûye mamoste, herweha berhemên wî di mijarên felsefe, rexne û Edebî dene.

¹⁸ Rêbwar Sîweylî, *Kitêbî Hacî Qadirî Koyî*, Weşanxaneya Rojhelat, Çapa Yekem, Hewlêr, 2016, r 175.

agir di dil de hel dibe û dil pê dişewite, êş dikeve canê mirov, sîmayê mirov xweş dibe lê dilê mirov disoje, digel kenê de hêsîr ji çavan mîna baran û xunavê bi ser suretê mirov dihêne xar. Jiyana mirov hertim weha nabe weke mirov dihîne pêş çavên xwe û hizrên xwe lê dike, pîrr caran mirov hinek tiştan li jiyana xwe ji dest dide ku tu carekî wî/wê hizra ji desdana wî tiştî nekirîye, di van halet û rwîdana de mirov rastî êşeke zêde dihêt bi sedema ji desdana ew tiştê ku tu cara hizir nekirîye ji dest bidet anku hizir nekirîye bê wî tiştî bijî. Ev rewş mirov davêje nav dû dilyeke nexweş ku nizanibe wê çawa li hemberî wan bûyer û rwîdana tevbigere, nizanibe serederîye digel wê rewşa ecîb bike di encamê de xwe li nav êş û kulan de dibîne di rewşeka jiyane ya nexweş.

"Soza xerîbîyê diyardeyeka giştî ya mirovatîyê ye, mirov nikare desta jê berde, heger di her pileyeka rohî û şaristaniyetê jî be, soza xerîbîyê û hîlakiyeta mirov her didome û girêdayî ya wê her dimîne".¹⁹ Xuyaye hemû mirovahî xudanê soz û hestên xerîbîyê ne, ferq nake ew mirov paşa be an jî feqîr û geda be mirovekê misulman be an jî mesîhî tevahîya wan xudan soz û hest in, ew sozên ku xwe di dilê mirov diden û xwe dixene nav mejîyê mirov û xeyala mirov bixwe re mijul dikin. Bi wê wateyê tu kesek nikare xwe li ber hest û sozan veşêre heta heger ew kes di astekê bilind ê jiyane jî be, ji bajarekê hevçerx û pêşketî jî be her nikare piştî xwe ji wan hez û xwezîyên vegeryanê bike, ew jî dixwaze vegere rojên berê, dixwaze jiyana xwe ji nû ve bi dost û hevalên xwe li ser zêdê bab û kalên xwe ava bike. Wexta ku mirov dikeve welatê xerîbîyê ew hest û xerîbîyên ku dikevîne nav dilê mirov, hizra mirov tevlihev dikin, mirov pîrr di wastîyêt û hîlak dibe, Saykolojî û Derûnîya mirov dibe barekê giran li ser mirov û jiyana mirov, hemû bîranînên berê di nav xwede heldigire jiyana nû ya ku di walatekê dine û li ser axeke xerîbe, pîrr zehmet dibe û jê re astengîyan dihîne, ew astengî ne di warê xwarin û jiyana madî de ye, belkî di warê Saykolojî û Derûnîyê de ye, hizrên mirovî li ser yadgarî û jiyana welatî, astengîyan ber bi mirovî re dikêşe, bi awayekî weha ku mirov dikeve barekê nexweş yê Derûnî û jiyane, bi rengekê weha ku hemû mirovahîyê vedigire û ev barê hanê tu kesek nikare xwe jê derbaz bike. "Mirov afirandîyeke ku dikeve jêr bandora jiyana rabirdûyê",²⁰ Rabirdûya mirovan didome û

¹⁹ Fethîye Dexmûş, *Tecrûbet L-Xerbîyetî Wel-Henîn Fî Şi'r İbin Xefacet El-Endelûsî*, (Teza Lîsansa Bilind), Zanîngeha Mentûrî, Cezaîr, 2005, r 15.

²⁰ Helmet Bayîz Resul, *Rehendî Nostalojî le Çiyayekanî Minî Hendirên*, *Govara Zanîngeha Soran*, 2018, r 24.

bi ser diçe, lê bandora rabirdûyê tucarî bi ser naçe hertim ew rwîdanên ku di salên berê de bi ser mirovan de hatîye bandora xwe li ser jiyana dahatûya mirovan çê dikin û dibin çendek li jiyana niha û dahatûyê, heger ew rwîdan xweş bin an jî nexweş, baş bin an jî xerab, çawa bin û bi çi şiklekî ew rwîdan û serhatî çê bûbin bandora wan her li ser mirov dimîne heta mirov di jyanê de be wê ew bandor jî bimîne, dibe ku wexta mirov jî di jyanê de nemîne ew bandor her bimîne, bi wê wateyê ku bandora wan rwîdana bikeve ser zarokên mirov an jî bikeve ser xelkê neteweyekê ku ew rwîdan bi ser de hatîne, mîna karesata mirovahîya "Helebce"yê û "Japonya"yê û ..htd, ku ew hejmara zor a mirovên bûyîn qûrbanî, bandor kirîye ser xelkê "Kurd" û "Japonî" heta niha jî digel bîranînên wan karesatan xelk pê bi jan dikeve û rewşa Derûnîya wan xerab dibe, ji ber ku hejmareke zêde di van rwîdan û karesatên mirovahîyê bûne qûrbanî, dîsa jî dibe ku hinek rwîdanên xwezayî wê bandorê li ser mîlet û neteweyan çê bikin mîna erdhejî û tisonamî û .. htd, ku di van rwîdan û karesatên xwezayî jî de hejmareka zêde ya mirovan dibine qurbanî, ku ev rwîdan dibine sedema bi xem ketina mirovan û êşeka zêde dikeve canê mirovên wan neteweyan ku ev bûyer dihêne serê wan bi sedema ji dest dana hejmareka zêde ji hemwelatî û xizman. Di vîre de bandora rwîdanên rabirdûyê li ser mirovan weha dike, ku xem û keseran ji bo rojên berê bixwe, ew rojên ku hemû bi hev re bûne, lê dibe mixabinî û dikevîne nava derdê xerîbîyê û hestên Nostalojîyê.

"Nostalojî hesreta ji destdan û şikayet kirin ji demê niha li hemberî rabirdûyê ye, serpehatî û bîranînên şêrîn yên rojên bi serde çûyî û êdî careka din venager in."²¹ gilî û gazine mirovan ji demê niha de pirr zêde bûye bi taybetî jî ji ber ew pêşketinên zêde ya şaristanîyeta mirovahîyê, herweha pêşketina mirovahîyê di mijara teknolojîyê de, ew jî sedemeke din a Nostalojîyê ye, ji ber ku ev pêşketinên li jor hatine destnîşan kirin bûyîn sedema hindê ku peywendîyên civakî kêmbûn û berev ji navçûnê biçin, xuyaye digel van pêşketinan de jiyana mirovan hinekî tevlihev bûye û bandoreka weha kirîye ku ji nav civakên xwe biqedin û berê xwe bidin wan bajarên mezin û pêşketî, ev bandor jî bi rêjeyeka bilindtir li ser wan xelk û mirovan hatîye kirin ku jiyana wan xweruye û li gund û zozanan dijîn, mirovên xweru û gundî zêde hînî wê yekê nînin ka çawa serederîyê digel jiyana nûjen bikin, herweha digel rewşa

²¹ Mehmed 'Ebasî û Yequb Fuladî, Beresê Nostalojî Der Şîrê Menuçehrê Ateşî, *Edebyata Farisî Mi'asir*, Sala 3, Hejmara Dûyem, Îran, 1392, r 45.

qerebalixî jî nikarin xwe li hev bînin. Di derheqê vê yekê jî rewşa Saykolojya wan hinekî xerab dibe û bêrya mala xwe û jyana berê dikin, dixwazin vegerin nav jiyana xwe ya xweru û ji gund û zozanên xwe vegerin. Di jiyana xerîbîyê de hertim ew bîranînen şêrîn ên rojên berê dihêne hizra mirov, ka çawa ew jiyana xweş û şêrîn ji destdaye, çawa ji wan xweşîyan veqediyane, hertim weha hizra xwe bi wan rojan mijul dikin û xwe davêjin nav rewşeka kelecana ya ne baş.

"Pirr caran mirov weha hizir dike ku ew tiştê wî/wê wenda kirîye dikare bi hêsanî careka din bi dest xwe bixe bi rêka nivîsandinê, lêbelê ku dikeve nav rastiyê de, ezmûna mirineke dijwar bersîngê wî/wê digire, dibe diya zarokê ku cîhaneke cudaye û bi dînitî û bi peyvan di îne jiyane"²². Rabirdûya mirov bi xwesteka mirov be an jî bê hemdê mirov be, dikeve nav nivîsên nivîskaran, sedem jî ewe nivîskar weha hizir dikin ku ew tiştên wan di jiyana xwe de û di rabirdûyê ji destdane dikarin bi nivîsandina wan careka din ji xwe re vegezin, mîna zarokê xwe serederîyê digel jiyana û rabirdûya xwe dikin, dixwazin wan yadgarîyan li nûve bi rêka nivîsandinê bi dest bixin, lê wexta dikevin nav wê heqîqetê û ew tiştê çûyî careka din nahê bi destxistin pirr bi jan dikevin, ji dûriya wan gelek jar û feqîr dibin. Hejêkirina mirov ji bo zarokên xwe nahê hesab kirin, serederî kirina mirovan jî digel dem û satên berê weke zarokê mirî yê mirovî ye, dixwaze ji nû ve zarokê xwe vejîne an jî jiyaneka din bidet zarokê xwe, ji bo yadgarîyan jî wisa dixwaze û divê derfeteka din û jiyaneka din ji wan bîranînan re çê bike, ji bo dana vê jiyane jî bi bîranînen xwe, berê xwe dide nivîsan û tomarkirina wan bîranînan, mereqeke wisa digire mîna dînekê serederîyê digel peyvan dike û bîranînen xwe li ser rupelan dinvîse, lê digel tomarkirina wê jiyana ji dest çûyî dibîne ku careka din û bi awayekî zêdetir xem û keserên wî/wê pirrtir dibin, zêdetir xerîb dibe û zêdetir rabirdû hişê wî/wê ber bixwe ra dikişîne li hemberî wê yekê jî rabirdû tu tiştê nade wî/wê ji bilî wan derd û kul û xemên di nav dil û hişê wî/wê de parve dike.

Nostalojî hestekê xwezayî û giştîye, heta di nava hemû nejadana jî bi şikleke cuda cuda heye û bi temamî hemû mirovan vedigire, bi gotineke rûn, ev heste wê çaxê dest pê dike, ku mirovî valahîyek hebe digel rabirdûya xwe. "rabirdûyek ku te'bîr ji ezmûna bîranînan dike, hemû hizrên me, jiyana, eleqe û reftarên me bingeha wan di

²² Edîb Qadir, *Geranewe Bo Malî Yekem*, Weşanxaneya Hacı Haşim, Hewlêr, 2014, r 11.

rabirdûye de heye".²³ Jiyana me û reftarên me rengvedana jiyana me ya berê ye, ew kiryar û ezmûna ku me heye û di hişê me de tevdigere li ser wê yekê bi cih bûye ka me di rabirdûya xwe de çi kirîye û çawa me jiyana xwe didomand û bi kê re me domandîye, ev tişt hemû jî bandora xwe li ser me dikin, bandoreka weha ku ew çax û dem dibine sedemê hindê ji bo serederî kirina me digel jiyana niha, ew karê em dikîn û ew reftarên em dikîn rengvedana jiyana berêye û eleqeya niha û çaxa berê bi hev re pirr e. mirovek di rabirdûya xwe de rastî nexweşîyeke zêde bû be û bi her sedemekê jî bûbe, heger niha rastî rwîdaneke weha were an jî rastî tişteke weha were ku ew tişt lê bûye sedem ku nexweş bikeve, bi awayekî xwezayî tirseke zêde wê xwe ji canê wî bide, herweha wê demê ew nexweşîyên berê wê werin bîra wî û xem û diltengî ji wî re bihên. Li ber vê yekê jî rabirdûya mirovan bandor li ser jiyana niha ya mirovan heye ka çawa tevbigere û çi karî bike û çawa bi kuve here, hemû tevger jî li gorî jiyana û ezmuna rabirdûyê ye.

"Temenê mirov çiqasî ber bi jor helkişe, xwezîya mirov vegeryana serdemê zarokîniyê ye. Herweha mirov heger li welatê xwe jî biqede, bajêr û gund heger wêrane û kawlistan jî bin, dibine qesrên hez û xeyalên mirov"²⁴. Dibe di wext û demên zaroktî û ciwanîyê de mirov zêde qedrê gund, bajêr û welatê xwe negire, herweha dibe ku ji wan deran jî aciz be û kêfa wî/wê jê re nehê, lêbelê digel ber bi jor çûyîna temenê mirov, wê demê bi temamî ji xwe vedigere û xerîbîya gund, bajêr û welatê xwe dike, heta xerîbîya her tiştî dike ku di zemanê berê de hebûye û pê re jiyaye, heger cudatî jî di navbera jiyana rabirdûyê û niha di astê abûrîyê de hebe û rewşa wê demê pirr baş jî nebe, heta ji wan malên ku wêrane jî bûne û tê de jiyaye hez diket û pirr dixwaze li wê jiyane vegere, ew qesir û mala niha wî/wê hey jê re dibine wêrane û nexweşî li hemberî wê de ew mal û jiyana sade û xweru ya berê ji xwe re dike qesir û koşkên xeyalan, jiyana û karên berê çiqasî zor û zehmet jî be lê dibine şêrînahîyên xeyalan li demê niha de, ew zor û zehmetî jî dibine xweşî û mirov her dixwaze ji wan rojan vegere, dixwaze vegere nava xwezayê û bi xwezayê re eleqedar bibe, sîya hênika bin daran di havînê de xweştir dihê ji hênîkîya ber amêreyan, herweha agirê sopê dara ji sermafîya zivistanê jî pirr xweştir dibe di dîwexana malan de, ev hemû bîranînên şêrîn û xweş niha dibin mêvanê xeyalên mirov, piştî ku temenê mirov helkişa jor wê demê

²³ Mihemed Ce'fer Mistefa, *Rabêtê*, Weşanxaneyê Nêgah, Çapa Dûyem, Tehran, 1384, r 14.

²⁴ Rehîm Luqmanî, (*Nalî û Nostalijî*), Govarî Zirêbar, Hejmara 79, Îran, Merîwan, 1391, r 161.

mirov qedir û qîmetê didete jiyana berê û xweşîyên berê. Ev hestê Nostalojî bi pirranî û zêde di nava teva mirovan parve bûye û ji alîyê her mirovekî bi şiklekê cuda cuda cih girtîye.

Li gorî wan pêname û nerînên li ser Nostalojîyê û hev wateyên wê ku ji alîyê nivîskar û ferhengên neteweyan ve hatibûn kirin, hate diyar kirin, her yek ji wan nerîneke cuda heye û her yek ji wan jî bi awayekî cuda pênameya Nostalojîyê dikin. Ew pêname û nerîn jî li ba her yek ji wan kesan li gorî rewşeke taybet hatîye kirin, hinek ji wan jî li gorî rewşa derûnî û hinek jî ji alîyê dîrokî ve, herweha hinek ji wan jî li gorî nerîna dîrketina ji welat û hinek jî di astê xeyalên bilind û xewnên mirovan Nostalojî daye naskirin. Lê digel wê yekê jî, her yek ji wan bi şiklekê cuda pênameya Nostalojîyê kirîye, lê nerîn û pênameyên wan li hev nêzik in, dikarîn wê yekê bidîna aşkera kirin ku bingeha hemû pênameyan vedigere ser cihekî ew jî bingeha Nostalojîyê ye. Bi wê wateyê ku koka hemû nerînên van nivîskaran yek mijare, ew jî mijara Nostalojî ye, ku ji alîyê hemû netewe û mirovekî bi awayekî cuda û bi renekê cuda çê dibe.

Herweha wateya Nostalojîyê di nava neteweyan de ne tenê peyveke, wate peyvek bi tena serê xwe nikare kuratîya wateya Nostalojîyê bixwe re helgire, belkî ji nava hemû neteweyan hinek hemwate li hemberî Nostalojîyê yên hatîne danan, anku ji nava hemû neteweyan komek ji peyv û hevokan li hemberî Nostalojîyê hatîne danan û bi wan peyv û malikan Nostalojîyê pêname dikin û didin nas kirin, weke: xerîbî, xem, hesret, vegeryan ji bo rabirdûyê, dîrketin ji welat, dîrketin ji malbatê, mirina hezkirîyan, soz ji bo welat û ..htd. Bi kurtasî Nostalojî pêk dihêt ji hestekê derûnî yê tal û şêrîn di haletekî de ku hatîye ji destdan, herweha çê kirina bajarên xeyalî û jiyaneke xeyalî, digel vegeirîyan ji bo ew jiyana berê ya li gund zozanên xweru û sade, tirs û hizir kirin ji mirinê digel tirs ji destdana hezkirîyên mirov, xeyal kirin û xem xwarin ji bo xweza û siruştê welat, zinar û dar, kanî û çîyayên welat, dibin xeyalên kur ên mirov, jiyana niha dibe dogeh û ya berê jî dibe buheştê ku xweşî û şêrînahîya wê hatîye ji destdan.

1.3. Cûreyên Nostalojîyê

Li gorî nerînên cuda ve Nostalojî ji bo çend cureyên curbicur hatîye dabeş kirin. "Nostalojî li gorî hinek nivîskaran ji bo dû beşên serekî xwedî (takekesî) û giştî

(civakî) dabeş dibe ku Qesîde an jî her cureyekê din ên helbestan dixê jêr bandora xwe".²⁵ Lêbelê ji bilî vê dabeş kirinê jî dibe ku bihête gotin ji bilî van cureyên Nostalojîyê hinek cûreyên din jî hene weke berdewam, zemenê dîyarî kirî, rabirdûyî û dahatî ku Nostalojîyê bixwe re digire. Herweha van cureyan eleqeyeke wek hev bi hev re heye, wate tenê yek bandor dikare hem Nostalojîya berdewam an jî zemenê dîyarî kirî an jî rabirdû û dahatî an jî bi awayekî giştî xwedî û civakî hebe. Li vir de emê li ser dû curên serekî bisekinîn û şiroveya wan hestên Nostalojî bikî ku dikevîne jêr çetra van dû cureyan, ew jî Nostalojîya (giştî û takekesî) ye.

1.3.1. Nostalojîya Takekesî (Xwedî)

Di vê dabeş kirinê de Nostalojîya takekesî wate şirovekirina hestên takekesî û xwedî yê nivîskar an jî helbestvan, helbestvan ji bo guncandina vê mijarê, ev mijar di axiftin û nivîsandinên din yê taybetî bikar ne anîye, ku helbestvan di xema wan dem û alavên xwe deye, ku di rabirdûyê de hebûye û bi nexweşî behsa wan dike û yada kesekê din dike ku dibe ew kes evîndara wî/wê be. "yadgarî û bîranîn bi awayekî giştî di jiyana helbestvanan de hebûye û bi şiklekê bilind di nava alavên wan de hatîye berceste kirin, çendek ji wan bûyeran bi awayekî ye ku helbestvan hertim di wê rewşê de demên xwe dibe ser".²⁶ 'Eşîq û jiyaneke evînî û sefer kirin, ku bi cureyekî li nav jiyana rabirdû ya kesekî bandor heye hemî bîranînên wê takekesîne, ku dûbare bûna wan bi sedema nerazî bûnê ye di rewşa niha tê de dijî û bi neçarî rastî kêşana êş û azar û diltengîyê dihêt. Divê cureyê de Helbestvan û nivîskar ji wan bîranînên girîng ên jiyana xwe dinêrin, ku tenê bandor li ser wan bixwe heye û bi vî cureyî hestên xwe yê diltengîyê li hemberî rabirdûyê didin nîşan kirin.

Ji bo ku zêdetir Nostalojîya xwedî li ber çavên me ronî be emê li vir wan cureyên hest û bûyerên ku dikevîne jêr beşa Nostalojîya xwedî bi kurtasî bidî berçav:

1.3.1.1. Nostalojîya Zemenê Zaroktîyê û Ciwanîyê

Di nav zaroktîya her mirovekî de dikarî bilindtirîn xewnên serdemê zaroktîyê bizanibî, lêbelê digel demê rabirdûyê tenê bîranînên wê çaxê ji mirov re dimînin û mirov hertim digel hesret û xeyalên wê çaxê jiyana xwe didomîne. "vegeryan ji bo

²⁵ Kuruşê Sefewî, *Ez Zibanê Şinasê Bê Edebyat*, Berga Yekem, Tehran, 1380, r 124.

²⁶ Mehdî Şerîfîyan, *Beresê Ferayendê Nostalojîyê Xem Xurbet der Eş'arê Sohrab Sêpherî*, *Govara Edebyata Farsî Zanîngeha Sîstan û bilûcistan*, Îran, 1386, r 56.

zaroktiyê û ji nû ve avakirina jîngeheke weke wê demê di xeyala xwe de wekhev dihêt hesibandin li ba mirovan"²⁷. hejî gotinêye ku sazandina hizir û zimanê her kesekî û bi taybetî jî helbestvan ku hestên bi hêz li hemberî zemenê zarokîniyê û ciwaniyê wêne digire û ji wî re çê dibe.

1.3.1.2. Nostalojîya Dûrî Li Bajar û Gund

Dûrketin ji welat yek ji wan rewşane ku bandoreke zêde dike ser helbestvanan, "ya ku di derketina hestê vegeryanê di nav mirovan de rolekê serekî heye Saykolojî ye, ku hestê mirov weha lê diket ku mirov hewceyî bi mal û welat heye"²⁸. Di demê helbestvan an jî mirov bi sedemên curbicur ji bajar û gundên xwe vediqetin û dûrî wan cihan dijîn, êdî ew jî yada wan cihan dikin û di helbestên xwe de bajar û gundên xwe bi cih dikin.

1.3.1.3. Nostalojîya Dûrî Li Malbat û Hevalan

Jiyana di nav welatê xerîbîyê, dûrî xizim û hevalan, dibe sedema hindê ku mirov bi awayekî zêde ji bo rabirdûya xwe vegere, ku bikare bandora wê valahîya ruhî û fikrî ji xwe re nehêle û hinekî rehet be. Xema xerîbîyê û diltengîya ji bo mal û nîştîmana dayîkê ku li ba mirovê ji welatê xwe dûrketî bandoreke gelek zêde li ser çê diket.

1.3.1.4. Nostalojîya Dûrî Li Me'suq

Nostalojîya dûrî ji me'suqê an jî dûrî ji evîndara xwe, yek ji wan cureyê nostalojîyê ye ku dikeve nav Nostalojîya xwedî an jî takekesî, herweha ev cureye yek ji wan cureyane ku bi awayekî zêde û bi pirranî jî ji alîyê helbestvanan ve rengvedaye, bi sedema negehiştina hev û 'Eşqa tak layenî, "'Eşiq dikare hestekê kûr û nenas be ji bo mirovî, ku xwed vê yekê weke eleqeyeke dû alî digel yekê din dihesibîne"²⁹ ji ber vê çendê jî helbestvan dikeve nav xeyalên berê û bi rêka nivîsandina helbestan bîranînên xwe dihîne ziman.

²⁷ 'Elî Ebasabad, Yusif, *Xem û Xurbet Der Şî'rê Me'asir*, Danişgahê Peyamê Nûrê Semnan, Îran, 1387, r 162.

²⁸ Mehdî Şerîfîyan, Beresê Ferayendê Nostalojîyê Xem Xurbet der Eş'arê Sohrab Sêpherî, *Govara Edebyata Farsî Zanîngeha Sîstan û bilûcistan*, Îran, 1386, r 60.

²⁹ Mercan Kamiyat û Mihemedî, Semîyê Beresê Ferayendê Nostalojî Der Eş'arê Mihemedemîn Şêx I-Salim(Hêmin), *Govari Edebyata Kurdî*, Sala Dûyem, Hejmar 3, Sine, 1395, r 130.

1.3.1.5. Nostalojîya Dûrî Li Beheşt û Jiyana Ebedî

Dûrî li beheşt û jiyana ebedî yek ji wan hest û hizrane ku pîrr caran hişê mirov ber bixwe dikêşe, ku hez û xwesteka mirov ji bo jiyaneke ebedî û bê dawî weha dike ku mirov ji vê jiyane aciz û xemgîn bibe.

1.3.1.6. Nostalojîya Pîrî û Hizir Kirin Li Mirinê û Tirsê Mirinê

Yad kirina pîrîyê û rojên dijwarên pîrîyê, cureyekê din e ji bo çê bûna hest û rewşên Nostalojî, ku pîrr caran helbestvan an jî mirovên din dikevîne hizra pîrîyê, berî ew dem bihêt û bikeve nav dijwarîyên wan roja ew xema lê dixwe û naxwaze van rojên dijwar bibîne. Herweha mirin jî yek ji wan hizrane ku gelek caran mirov hizir lê dike û bi sedema wan hizran xembar û bar giranê dinê dibe, ji bo vê yekê jî helbestvan xemên xwe li ser rupelan parve diken.

1.3.1.7. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Nav Xwezayê

Ev jî cureyekê dine ji Nostalojîya xwedî ku pîrr caran helbestvan ji jiyana teknelocî û qerebalixîyê aciz dibe û dixwaze êdî vegere nav xwezayê û dûr be ji wan alavên ku serê mirov pê di êşe, ev cureyê Nostalojîyê jî di nav helbestên gelek helbestvanan rengvedan heye û xwesteka helbestvan dide nîşan kirin ji bo ku vegere nav xwezayê û xwe bi xwezayê re eleqedar bike.

1.3.2. Nostalojîya Giştî (Cem'î)

Ev cureyê Nostalojîyê vegeryane ji bo komek ji bûyer û mijarên giştî, ku peywandî bi vegeryanê ji bo rabirdûyeka dûr ya jiyana neteweyî ve heye û vegeryan û Nostalojîyên giştî, "Di Nostalojîya giştî de ew bûyerên ku helbestvan an jî nivîskar bas lê diket ew nexweşî û êş û derdin, ku eleqeya wan bi mirovên herêmekê an jî neteweyekê bi giştî heye, ku ji wan re bi giştî bîranînên nexweş çê dike"³⁰ Bi wê wateyê ku Nostalojîya bîrhatinê dîrokî, Nostalojîya neteweyî û vegeryan ji bo efsaneyan, Nostalojîya dînî û kesayetiyên dînî, hekayet û mijarên folklorî, bas kirin û vegeryan ji bo şunwarên dîrokî ..htd. Di vêrê de helbestvan behsa zemen û cihekê dîrokî diket an jî behsa bûyereka dîrokî diket, ku hatîye ser netewe û welatê wî/wê. Herweha dibe ku helbestvan behsa bûyereka dîrokî biket, mîna baskirina şer,

³⁰ Hesên Anûşê, *Ferheng Nameyê Edebîyê Farisî*, Berga Dûyem, Çapa Yekem, Tehran, 1376,

peymanname û bûyerên sîyasî, ku hatîne ser neteweya wî/wê. Herweha bas kirina şunwarên dîrokî mîna qesir, kelhe, gosik, xencer, dasik û kincên mirovan û bi awayeke giştî alavên dîrokî yên neteweyî, ku di demên berê ji aliyê bab û bapîran ve hatîne bikaranîn û niha bi piranî nahên bikar anîn.

Ew hest û reşwên mirovan ku dikevî nav Nostalojîya giştî an jî ew hestên ku ne takekesî ne wê li vir de bi kurtasî şirove bikîn:

1.3.2.1. Nostalojîya Dûrî Li Welat

Wexta mirov ji welat û axa nîştîmana xwe dûr dibe bi sedemên curbicur, hestên neteweyî li ba wî/wê zêdetir dibin, hesreka zêde ji bo welatê xwe dixwe, heger sedema dûrketina wî/wê ji welat bi sedemên neçarî jî bin an jî ji welat hatibe derêxistin, lêbelê digel wê çendê jî ew ji welatê xwe xerîb dibe û xeman ji bo dixwe, "yek ji mijarên hestiyarî yên girîng ên curbicure ku di serdemên me de, me bixwe re mijûl kirîye welat e. komek jî li ser têgeha malê û welat weha di fikirin û nerîna wan cudaye, herweha di heman demê de dibêjin ku welat û mal tu rastîyek nîne, hemû dever û cih li ser cîhanê bi mala mirov tê hesabandin, lê ev li ba hemû kesan weha nayê hesabandin û cudatî heye"³¹ ev cureyê hestê Nostalojî jî hestekê giştîye û ji aliyê hemû mirovan bi awayekî pirranî çê dibe.

1.3.2.2. Nostalojîya Bîranînên Dîrokî û Neteweyî

Ev cureyê Nostalojîya giştî, nivîskar an jî helbestvan di nava helbest û nivîsên xwe de behsa bûyereke dîrokî diket mîna şer, rwîdanên sîyasî û guhartinên erdnîgarî û ..htd, ku bi ser neteweya wî/wê de hatibe û ev cureyê Nostalojîyê jî cureyê giştî ye û eleqeya wî bi herêmekê û neteweyekê ve an jî zêdetir heye.

1.3.2.3. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Dastan, Efsaneyan û Mijarên Folklorî

Hemû neteweyên cîhanê dastan û efsaneyên taybet bixwe hene, ew dastan û efsane jî dibe ku hatibine nivîsan û dibe jî ku tenê bi awayekî devkî hatibe parastin, ev cure jî gelek caran helbestvan weke şanzîyêke neteweyî bas dike, weke, Memê Alan, Leyl û Mecnûn, Xec û Sîyabend, Efsaneya Qelay Dimdim û Dastana Gilgamêş û ..htd. Herweha di nav dîroka gelek neteweyan de bi awayekî zêde gotinên pêşya

³¹ Tel'et Tahîr Hemed 'Elî, Ferayendê Nostalojî û Muefahayê an der Eş'arê Fenaî, *Govarî twêjer*, Bergê Yekê, Hejmara Yekê, Soran, 2018, r 668.

hene ku hinek şîret in û hinek jî pend in li ser mirovan, helbestvan jî gelek caran ji bo dewlemend kirina wateya helbest û nivîsa xwe gotineke pêşîyan digel parve dike.

1.3.2.4. Nostalojîya Kesayetîyên Neteweyî

Bi pirranî helbestvan di nav helbestên xwe de yada hinek kesayetîyên neteweyî dikin û xwezîya dixwazin ku di jiyane de mabane, ew xwezî jî ji bo mirovên wê neteweyê û wê herêma ne û dibe jî tenê yad kirinek bît ji bo van kesayetîyan, bo nimûne; Şêx Se'îdê Pîran, Mela Mistefayê Barzanî, Melayê Cizîrî, Nalî, ..htd.

1.4. Nostalojî û Rehendên Cuda Cuda Yên Wê

Nostalojî û hestên Nostalojî yek ji wan mijarane ku xwe di nav pirranîya rêbaz û zanistan de xwe li hev dihîne, digel vê yekê jî di nav hinek zanistan de zêdetir xwe xuya diket, di vêrê de emê pêkolê bikîn ku Nostalojîyê di nav wan zanistên ku eleqeyê mikum bi hev re heye bînîn berçav û hinek ji xebata xwe terxan bikîn ji wê peywendî û eleqeya di navbera wan de heye.

1.4.1. Nostalojî û Derûnzani (Saykolojî)

Nostalojî bi eslê xwe zarawayêke Derûnzaniye, pişt re ev zarawayê yê hatiye nav Edebê de û bi awayekî giştî reftareka na agahîye, ku ji alyê mirovan ve çê dibe, wate û bingeha Nostalojîyê û destpêka serheldana Nostalojîyê di nav zanistên Pizîşkî bûye û bi taybetî jî serheldana ev zarawayê di nav zanista Derûnzani (Saykolojî)yê de serheldaye, ku beşeke ji zanistên Pizîşkî. bi wê wateyê ku destpêka Nostalojîyê û serheldana ev zarawayê cudaye digel naskirina me ji bo ev zarawayê, bi awayekî din me bi rêka Edebê zarawayê Nostalojîyê nas kirîye, lêbelê serheldana Nostalojîyê û destpêka Nostalojîyê di nav Edebê de nîya, belkî di nav zanisteka dine ew jî zanista Pizîşkî ye û ji aliyê Pizîşkên Derûnzaniyê ve ev zarawayê serheldaye.

Ji bo ku em zêdetir hînî zarawayê Nostalojîyê bibîn û bi awayekî berfirehtir zarawayê Nostalojîyê nas bikîn, bi pêdivî dizanîn li vir de şiroveya peywendîya Nostalojî û Derûnzaniyê bikîn, şiroveya wê yekê bikîn û bersiva wan pîrsa bidîn ka çawa û ji bo çî Nostalojî zarawayêke Derûnzaniyê an jî zarawayêke Pizîşkî bûye.

Sedemeka girîng a mijarên Derûnzaniyê û bandora wê ya kur, ew rexneyên Edebî ne ku di setsala bîstan de hebûne. Bi taybetî jî ji ber wê çendê an jî ji ber

sedema hindê ku Nostalojî reftareka na agahî ya mirovan e. wate ew kiryar û reftarên ku mirov diket û haya wê jê tune ye, dabeş dibe ji bo ser dû tîyorîyên Derûnzani yên mezin ew jî tîyorîya Firoyîd û Yong e, ku nerînên ev dû zanayên Derûnzaniyê girîng û bi bandor in. li vir de emê li ser ev dû zanayên Derûnzaniyê bisekinîn da ku bi awayekî hûr nerînên wan li ser reftar û hizrên mirovan bizanbîn û eleqeya wan bi Nostalojîyê bidîn girêdan. Armanca Firoyîd³² di vekolînên xwe yên Derûnzaniyê de vedîtîna bûye, Firoyîd pêkol kirîye bi bikaranîna tîyorên xwe di derbareyê mijarên aloz yên mîna: na agahî, çê kirina derûnê û xeyalan. bi nerîna wî derûnê mirovan ji sê beşan pêk dihêt: (agahî, berî agahîyê, na agahî). Merem li agahîyê ewe "beşa runahîya mejîyê mirovî ye, ku mirov ji hemû çalakîyên wê bi agaye"³³ Wate ev beşe ji mejîyê mirovan agahî ji hemû wan çalakî û kiryarên mirov heye û hertim ji bîra mirovan in, tu carî ji mejîyê mirov dernakevin û hertim hazirîya wan heye. Herweha merem ji beşa berî agahîyê ewe ku "beşek ji ew tiştê ku di mejîyê mirovan daye digel burîna demî ji bîra mirovî an jî ji hizra mirovî diçe"³⁴ Wate hinek tişt di hizra mirovî dene digel burîna demî ew tişt ji hizra mirovî namînin û dihêne ji bîr kirin. Herweha Firoyîd pêkol kirîye, ku ew beşa ku eleqe bi ji bîr kirinê ve heye û hatîne ji bîr kirin, careka din welê dike ku bihêne hizra mirovî û ev beşe jî nav naye beşa berî agahîyê. Herweha merem ji beşa sêyê û beşa dawîyê ku beşa na agahîyê ye, Firoyîd di derbareyê wê beşê de dibêje: "ji bo min ew yek hatîye aşkera kirin ku ew bîranînên hatîne ji bîr kirin ji nav naçin, lêbelê hêzek heye ku weha lê diket ku tişt nehête rwîdan heta ew bîranîn di nav beşa na agahîyê zêde dibin û diçine nav beşa agahîyê û yên din di nav beşa na agahîyê dihêlê"³⁵ Ew beşa ku eleqe bi mejîyê mirovan re heye û agahîya mirovan jê tune ye û ew hizra ku di mejîyê Firoyîd de pirr girînge û hizir lê dike ewe ku beşeka mezin ji pêkhatiya zakîreya mirovan ji na agahîyê pêk hatîye her çend jî ku nahêt dîtîna û veşartîye, herweha beşa na agahîyê tu carî ji nav naçe û bi awayekî aloz û tevlîhev di kiryarên mirovan de wê bandora xwe hebe. heger mînakekê ji bo vê çendê bidîn pêşçav, zakîreya mirovan an jî mejîyê mirovan weke çiyayekê berfê ye ku di nava deryayekî be û beşeka mezin ji vî çiyayê berfê di nav beşa na agahîyê deye wate

³² Sîgmond Firoyîd zanayekê Nemsayîye ku di sala 1856an de li malbateka culekeyan ji dayîk bûye, herweha qutabxaneyê derûnşikarî li ser destê Firoyîd hatîye damezrandin. Firoyîd di sala 1939 li bajarê Londenê koça dawî kirîye.

³³ Nesrullah Îmamî, *Mebanî û Rewanşinasîyê Neqdê Edebî*, Tehran, 1378, r 137.

³⁴ Mehmed 'Ebasî û Yequb Fuladî, Beresê Nostalojî Der Şî'rê Menuçehrê Ateşî, *Edebyata Farisî Mi'asir*, Sala 3, Hejmeta Dûyem, Îran, 1392, r 47.

³⁵ Zîgmond Firyîd, *Rewanşinasî, Tercemeyê Mehdî Efsar*, Tehran, Kawyan, 1363, r 83.

dikeve jêr avê û berzeye û ew beşa ku xuyaye an jî diyare beşeka piçuke ji wî çiyayê mezin.

Herweha derûnzaneke din ku bi tîyorên xwe bandoreka mezin li ser zanista Derûnzaniyê çê kirîye ew jî Karil Gostaf Yong³⁶ e û xudanê Derûnzaniya Şirove kirinê ye. Her çend ku Firoyîd tenê na agahîya xwedî weke alavekê hûnerî û Edebî dida zanîn, lêbelê Yong aliyê xwedî weke sedemeke girîng ji bo serheldana alavên hûnerî dida zanîn û ji bilî wê jî na agahîya xwedî digel na agahîya mirovên din ku bi navê na agahîya giştî ye di nava dilên mirovan de dida zanîn û bawerîya wê pê re hebû. Na agahîya giştî di rastîyê de mîrase, ku ji jiyana rabirdûya mirovên din de weke mîrasek ji me re maye. "Bi nerîna Yong ku cismê mirov bi cismê bab û bapîran re bi bandore û karîgerîya wan li ser heye û rih û derûna bab û bapîran ji me re bûye mîras û ji mere maye. Saykolojî û derûnê mirovan aloze û bi zehmetîtir dihête destxistin ji destxistina cismê mirovan, herweha dikarin bibêjin ku derûn nîveya cîhanê ye û di heman demê de jî agahî ji wî pêk dihêt"³⁷ Herweha Yong di derbareyê pêk hateyên na agahîya giştî dibêje: "di na agahîyê de hinek sîfet dihên vedîtin ku di astê xwedî de bi dest nehatîne, belkî xwezayî ne an jî siruştî ne, bo nimûne hêz dibe sedema çêbûna çalakîyan û bêy ku livîneka agahîyê hebe û ji ber vê çendê jî kurtirîn nimûne ewe ku siruşt takekesekê nimûneyî bi awayekî giştî ji na agahîyê çê diket"³⁸ Xwedîyê nimûneyî mîraseke ku ji rabirdûyeka pirr dûr di navbera xud û neteweyên cuda de hebûne û havpişik bûne, herweha Yong ev yek bi na agahîya giştî nasandîye û bi nerîna Yong hûner û Edebyat girîngtirîn mînakî ji bo agahîya giştî. Helbestvan wergerê na agahîya giştîye ji bo mirovan.

Herweha na agahîya giştî di Derûnzaniya Yong de, pêk dihêt ji "ezmûna bab û bapîrên me di demê milyon salên rabirdûyê de, ku beşeka zêde nahête gotin, an jî pêk dihêt ji rengvedana bûyerên cîhanî yên pêşî dîrokê, ku digel bûrîna her set salekê tenê çendeka kêr jê zêde dibe"³⁹ Na agahîya giştî di navbera hemû mirovan de havpişike û bi awayekî hertimî bi xwe re heldigire. Wate Derûnzaniya giştî lêkolînên xwe ji reftar û hestên mirovan ji aliyê guhartinên dîrokî ve diket di herêmeke diyarî kirî an jî

³⁶ Karil Gostaf Yong Derûn şirovekar û derûn pizîşkekê Siwîsrî bûye, ku di sala 1875ê hatîye dine, herweha qutabxaneya Derûn şirovekarî li ser destê wî hatîye ava kirin. Yong di sala 1961an de koça dawîyê diket.

³⁷ Karil Gostaf Yong, *Royaha û Endêşeha*, Tercemeyê Perwîn Feramerzî, Meşhed, Îran, 1370, r 141.

³⁸ Karil Gostaf Yong, *Royaha û Endêşeha*, Tercemeyê Perwîn Feramerzî, Meşhed, Îran, 1370, 416.

³⁹ Alin Aras, *Rewanşnasîyê Şexsiyat*, tercemê: Siyawş Cemal Fer, Çapa Dûyem, Tehran, 1375, r 98.

mirovên neteweyeke diyarî kirî, reftar u hizrên netewyan bi awayekî giştî mîna hizir û reftarên bab û bapîrên wan in, ev jî wê yekê dide zanîn ku Nostalojiyê peywandî û eleqedarîyeka zêde û hertimî bi Derûnzaniyê ve heye, ji ber ku mijara Nostalojiyê karkirin û vekolîna ji hest û sozên Derûnî yê mirovan û bandorên Derûnî, ev jî dibe sedema hindê ku Nostaloji û Derûnzani weha bi hev re bihên girêdan ku ji hev qediyana wan zehmet be û bi awayekî hemîşeyî û hertimî bi hev re bihên girêdan. Herweha digel serheldan û derketina qutabxaneyên Derûnzaniyê ji aliyê Firoyîd û Yong ve zêdetir mijarên Edebî bi giştî û Nostaloji bi taybetî rola wan bi derket û rêkeke nû hate vekirin ji bo vekoleran ku vekolîn û rexneyên xwe li ser van mijarên Derûnî saz bikin, astê vekolîna ber bi çaxeka din û ber bi pêşketinên zêdetir biben.

Edebê ji bo şirovekirina naverok û ziman û wêneyên helbestvanên xwe pêwîstiya wê bi Derûnzaniyê ye û Derûnzaniyê jî pêwîstî bi huner û Edebê heye, wate di setsala niha de Edebîyatê mifayeke pirr girîng û bi bandor ji şirovekirina Saykolojî û qutabxaneyên Derûnzaniyê dîtîye, çimkî bi sedema xwendina nav dilê helbestvan û nivîskaran ji bo me didet xuya kirin û mijara vekolînên Edebî ji aliyê rûxsarê ve di êxe aliyê naverokên têkistan û neverok û eleqeya têkist û nivîskarî ji me re didet aşkera kirin.

Ev şiroveya li jor hatîye kirin li ser Derûnzaniyê an jî bibêjîn Saykolojîyê, wê yekê dide zanîn ku eleqeyeka zêde di navbera Nostaloji û Derûnzaniyê de heye ku bi tu awayekî ji hev venaqedin û girêdayî hev in, gelek pîrensîpên havpişik di navbera Derûnzani û Nostalojiyê de hene, ku ew nîşaneyên li ser mirovan û Saykolojya mirovan derdikevin nîşaneyên Nostalojiyê ne û ji aliyê Nostalojiyê ve dihên şirove kirin, herweha ew nîşane û kiryarên mirovan ku di astê Nostaloji dene û Nostaloji li ser dihêt xwendin dikarîn ji aliyê qutabxanên Derûnzaniyê ve şirove bikîn û di nav Derûnzaniyê de parve bikîn.

Li dawîyê de em dikarîn li ser eleqeya Nostaloji û Derûnzaniyê weha bibêjîn, ku alîkarîyeka zêde di navbera Edebê û Derûnzaniyê de heye bi taybetî jî di setsala niha de, ku ev herdûk zanist (Edeb û Derûnzani) ji aliyekî ve bûye sedema pêşveçûna Derûnzaniyê, çimkî Edeb û nivîskarên Edebî rengvedana xwe û civaka ku tê de dijîn li nav berhemên xwe de parve dikin û weke alaveke berdest didine destê zanayên Saykolojî û ew jî li gorî wan nivîs û helbestan şiroveyeke Derûnî ji bo çaxên bare û

jiyana berê dikin. Herweha ji alîyekî din jî bûye sedema pêşveçûna vekolînên rexnesazî û şiroveyên têkistên Edebî, ji ber derketina van qutabxeyên Derûnî û curbicur bûna mijarên Derûnî û eleqeya wan bi derûna mirovan ve ev yeke jî rê li ber şirovekar û rexnesazan xweş kirîye ji bo ku pêşve biçin di mijarên Edebî û şiroveyên Edebî de.

1.4.2. Nostalojî Di Dîrokê De

Bi kêfxweşî ve, ku di demê niha de Nostalojî bi awayekê berfireh yê bûye kiryareke asayî û ezmûneke her roje ji bo pirranîya mirovan, lêbelê ev yek ji destpêkê de weha nebû, belkî "weha dihat zanîn ku Nostalojî nexweşîyeke xeternak û aloz e".⁴⁰ Vê nerîne neçarîyek da vekoleran ji bo pêkol kirinê û encamdana xebatên hûrtir ji bo vedîtina çareserîyekê ji Nostalojîyê re. Ji bo vê çendê emê li vir de li gorî wan nerînen dîrokî xebata xwe bidomînîn ka çawa û bi çi şiklekî astê Nostalojîyê pêşveçon bi xwe vedîtiye û çawa vekoler gehîştine wê derencamê ku Nostalojî haletekê asayî û tebîî ye.

Nostalojî di setsala 19an de weke haletek di nav wan zarokan hate tomar kirin, ku ji dayîkên xwe dihatin cuda kirin û digel dêşîran de jiyana xwe didomand, ku ev yek bi awayekî zêde "bibû 'îrf û 'edet di nav civakên ku di astekê abûrîya nawendî dene. Tomarên Pizîşkî wesfa wan zarokan dikirin ku tê de ew zarokên cara yekemîn ji dayîkên xwe veqedyane di temenekê zûde bûye û pişt re ji wê dêşîra xwe jî hatîye cuda kirin ku digel jiyaye û 'edet digel kirbû".⁴¹ Pizîşkên Ferensî di salên 1800an de weha Nostalojî şirove kir, ku "Nostalojî mirineka veşartîye û dihête veguhaztin ji mirovekî ve ji bo mirovekê din".⁴² Ev nerîn rewşeke nexweş û hestekê nexweş li pey xwe dihîne, ji ber ku vekoleran Nostalojî bi cureyekê petayê dida naskirin, wate dibe ku Nostalojî bihête veguhaztin û di nav civakan de bi awayekî zêde xwe belav bike.

Herweha "Pizîşkên Îngilîzî wesfa vî haletî dikin weke derencamê veguhaztinê ji bo jîngeheke cuda ji wê jîngeha ku bandor li ser kirîye û rojên xwe yên rabirdûyê tê

⁴⁰ Hilary Dickinson and Michael Erben, *Nostalgia and Autobiography: The Past in the Present*. University of Southampton, UK, 2006, r 227.

⁴¹ Michael S. Roth, *Dying of the Past: Medical Studies of Nostalgia in Nineteenth Century France*. History and Memory, France, 1991, r 6.

⁴² Michael S. Roth, *Dying of the Past: Medical Studies of Nostalgia in Nineteenth*, r 7.

de bi ser birîne".⁴³ Herweha bê hêzîya kesekî ji bo vê rewşê dibe sedema bandor kirinê bi regez û perwerde û xweza û rewşa avûhewayê. Digel de mirovên bê hêz zêdetir egera hindê heye ku ev halete bi serde bihêtin bi berawird digel kesên ku bi hêzin û rewşa derûnya wan bi hêz e, bê hêzî alîgirîyeke ji bo diltengîyê bêy tu sedemeke berçav hebe, herweha çî pê nevêrê li ber wî/wê xweş dike ku rastî Nostalojîyê bibe. Hertim ew kesên xudan hêz û şîyan in, dikarin bi erênî nexweşiyên xwe bidomînin û hingavtinên xwe ji serkeftinê re bidin rêyên cuda cuda û hêvîyên xwe ji nû ve ava bikin.

Dihêt gotin ku "perwerde bergirîyeke din çê dike ji bo vî haletî, di demekî de nezanîna zêdetir ya mirovan dîsa rê li ber derketina Nostalojîyê xweş dike. Hatîye gotin ku Angilosaksonî û Sêltîkî kêmtir tûşî vî haletî dibin bi berawerd bi nejadên din, li demên dijwar de Nostalojî hatîye wesf kirin weke rexneyek ji bo jîyanê."⁴⁴ Perwerdeyeke baş mirovên saxlem û xudan derûnekê saxlem di civakan de belav dike, herweha perwerdeyeke baş jî li jîngeheke baş û saxlem çê dibe, xuyaye ew jîngehên hertim şer û pevçûn di nav de hene tu carî nabe wargehek ji bo perwerdeyeka baş, hertim mirovên wan deran ew mirov in ku tu hêvîyek ji bo jîyaneka rehet ji alîyê wan nahête dîtin, li hemberî wan ew welat û jîngehên ku rewşa wan rehetê, kêmtir bi berawird digel jîngehên rewşa wan ne baş e rastî Nostalojîyê dihên. Di rastîyê de çemka cihî girêdayî jîngehî ye û guhertina cihî ku bîngeha hizra Nostalojîyê bû di pertukên Pizîşkî yên setsala 19an de û herweha di destpêka setsala 20an de rêbazên Derûnzaniyê dest kir bi rêzgirtinê ji wan kesên ku rastî Nostalojîyê bûne. Ev yek jî piştî li hev hatina vekoleran bû ku gehîştine wê biryarê ku Nostalojî haletekê Derûnî ye û tebîî ye ku bi gelemperî ji alîyê hejmareke zêde ya mirovan derdikeve, wate vekoler gehîştine wê derencamê ku rê li ber Nostalojîyê nahê girtin, ji bilî wê yekê pêkolê bikin rê li hemberî Nostalojîyê bigirin, wan ev yek belav kir ku Nostalojî reftar û haletekê normal e û bi awayên cuda cuda li ba hemû mirovan çê dibe.

Herçend di salên 1880yan de û piştî ku bikaranîna zaraweya Nostalojîyê ji dervey mijarên Pizîşkî ve ber bi zêde bûnê ve diçû, Bi rêjeyeka zêde di nav Edebyata wê demê de dihat bikaranîn ji dervey wê wateya taybet û Pizîşkî ku di wê demê de

⁴³ Sandra Garrido and Jane W. Davidson, *Music, Nostalgia and Memory*, Western Sydney University, Australia, 2019, r 30.

⁴⁴ Sandra Garrido and Jane W. Davidson, *Music, Nostalgia and Memory*, r 30.

edet bû, di destpêka setsala 19an de Nostalojî bi zarawayeke Pizîşkî dihat nas kirin, lêbelê di dawîya wê serdemê de êdî Nostalojî weke zarawayeke taybet bi warê Pizîşkî nahête dîtin, belkî bi pirranî dikeve nava zanstên din û bi taybetî jî dikeve nava Edebê de, ji wê demê ve Nostalojî bi Edebê ve dihête girêdan. "Di dawîya setsala 19an de pêwîstîyeke aloz û hestiyar bû, navendek bû ji bo helbestvan û feylesufan."⁴⁵ Wateya vê zarawayê pêşve diçû di demekî kêmtir de, di nav rêbazên Pizîşkî de hate guhertin ji bo vekolînên çareser kirinê bi sedema zêde bûna hejmara kesên ku rastî Nostalojîyê dihatn. Her ku diçû Nostalojî kêmtir weke haletekê Pizîşkî dihat dîtin. Herwaha li gorî axiftina Sulîvan, "Nostalojî weha lê hatiye ku kêmtir derbareyê cihan be bi berawird digel demî an jî wext."⁴⁶ Ji ber ku bîranîn zêdetir girêdayî demî ye û hestên Nostalojî li ser vê çendê ava dibin, lê ev yek jî nahê veşartin ku bi tu awayekî em nikarin peywendîya cih û demî ji hev cuda bikin, herweha herdûk jî dû bingehên serekî ne ku Nostalojî li ser ava dibe.

Pirsgirêka herî mezin di Nostalojîyê de ewe ku mirov bi tu awayekî nikare jiyana xwe û rabirdûya xwe bide pişt xwe, nikare weha fikir bike ku êdî rabirdû borî û careka din venagere, herweha nikare xwe digel jiyana nû li hev bîne, weke "Hinek vekoleran weha Nostalojî wesif dikir ku kelecaniyeke ji bo wêneyekê nimûneyî di rabirdûyê de, bi awayekî weha ku ew rastîya niha hey tu carî nikare xwe digel li hev bîne."⁴⁷ Ev kelecaniya ji bo rabirdûya nimûneyî dikare bibe hezek ji bo vegeryana rabirdûyê, herweha rewşeka kêfxweştir a jiyana kesekî bi Nostalojîya xwedî dihêt nas kirin. Tenanet ji bo wan serdemên dîrokî û têkistan jî ku wan kesan ezmûn lê nekirîye jê re dibêjin Nostalojîya dîrokî, ku ew hizir girêdayî jiyana berê ne û taybetin bi wan demên biserde çoyî, ku dikevîne qalbê dîrokê, dîrok jî li ser wan bûyerên giştî û takekesî ava dibe ku li cîhanê hatîne qewimandin, digel bûyerên xwezayî jî yek digire çimkî ew jî li dûmahîkê de bandora xwe li ser mirovan cih dihêle.

Digel borîna demî gav bi gav nerîn û vekolîn li ser Nostalojîyê hingavtinên baş bixwe ve dibirin, Bi vî awayî li gorî fehm kirina moderin, Nostalojî êdî haletekê nexweşîyê nîye, belkî ezmûneke ku bi normalî dihête dîtin di nava xelkî de di hemû

⁴⁵ Sullivan L. G. O, *Dying for Home: The Medicine and Politics of Nostalgia in Nineteenth-Century France*, Queen Mary University, London, 2006, r 22.

⁴⁶ Sullivan L. G. O, *Dying for Home: The Medicine and Politics of Nostalgia in Nineteenth-Century France*, Queen Mary University, London, r 104.

⁴⁷ Hirsch A. R, *Nostalgia: A Neuropsychiatric Understanding*. *Advances in Consumer Research*, North American, 1992, r 390.

temenan de, "zêdetirî 80ê ji sedî xwendekarên zanîngehên Birîtanî dibêjin ku yên ketîne nav haletê Nostalojîyê an jî bi kêmî ve di heftîyê de carekê rastî Nostalojîyê dihên."⁴⁸ Wate vê nerîne wateyeke din da ber Nostalojîyê, ku êdî ev reftarên Nostalojî reftarekê namo û serinc kêş nîye, belkî reftareke ku ji alîyê hemû mirovan ve dihête ezmûn kirin, ezmûna Nostalojîyê xwe bi hemû mirovan da nas kirin, ji ber vê çendê jî êdî mirovan ev haletê hanê nas kir û xwe hîn kirin ku Nostalojî reftarekê Normale. Piştî ku di rewşa moderin de Nostalojî hate adet kirin û di nav hemû kesan de dihête naskirin bi acizî û bêçareyîyê di niha de, "dijberîyeke li hemberî rewş û hizra nû ya demî ye, dema dîrokî û dema pêşketinê, xema guhertina cihî û dijberîya demî"⁴⁹. Ev jî tê wê wateyê ku di jêr bandora nexweşîyên Nostalojîyê yên setsala 20 û 21an bûye ku hejmareke zêde ya xelkî xwe di cihekî din dîtîye ku ne welatê bab û bapîrên wane, belkî cihekê dine û dûr ji warê wane, tabî ev çende jî piştî koça xelkî bû ji gund û warên bab û bapîran ji bo nav jiyana şaristanîyetê, ku ev pêşveçon bûne sedem daku xelik li hemû cihên cîhanê ber bi wan bajêr û welatên pêşketî biçin, daku bikarin kar bikin û jiyana xwe çêtir bikin, lêbelê piştî çendekê hişê wan dihête ser wê rastîyê ku wan jiyana xwe li dor xwe hişt û xweşî ew xweşî bûn ku di nav gund û bajêrên wan de hebûn, lê ev yek direng hate zanîn, wan nikarîbû xwe ji hest û sozên Nostalojîyê bidin alîyekî.

Guhertina cihê erdnîgarî tenê bandor nîye ji bo tuşbûna Nostalojîyê. Sivêtla Boyim dibêje: ku "Nostalojî derdikeve di derencamê givaşta Siyasî, wek piştî şorişa Ferensayê di sala 1789ê an jî demê serbazên rusyayê, wexta ku serkêşî kirî ji bo nav welatê Elmanyayê di sala 1733an".⁵⁰ Hejmara wan kesan jî pîrr e yên ku dikevîne jêr bandora siyasîyê, hejmareka zêde jî digel bûyerên Siyasî û biryarên Siyasî dikevîne nav van reftarên Nostalojî, herweha hingavtînen bi ecele di pîşesazî û pêşkeftinê di setsala 19an de bû ku pêşveçoneke zêde di warê pîşesazîyê de hat bi destxistin, herweha di setsala 20an jî ku pêşveçon gehiştê bilindtirîn astê xwe û rêberatîya serdema pêş xwe kir ji bo zêde bûna kelecîyê û ji bo jiyaneke tengav û tevîlhevîtir a mirovan li rabirdûyê de û bîranînen rêwîtiyan weke rêyek ji bo parastina wê li qut bûnê. Bi vî şêweyî di naverasta setsala 19an de û ji wê demê ku şorişa pîşesazîyê armanca xwe bi

⁴⁸ Wildschut, Sedikides and Arndt, *Nostalgia: Content, Triggers, Functions*. Journal of Personality and Social Psychology, Southampton, 2006, r (975-993).

⁴⁹ Boym Svetlana, *Nostalgia and Its Discontents*. *The Hedgehog Review*, 2007, r 9.

⁵⁰ Boym Svetlana, *Nostalgia and Its Discontents*, r 12.

dest anî, "rêjeya Nostalojîyê zêdetir û bilindtir bû piştî ku hejmareke zêde ji navendan hatine vekirin weke bîranînên Nostalojîyê, ew jî bi sedema damezrandina mozexane û alavên din ên rabirdûyê".⁵¹ Vekirina wargeh û mozexaneyan ji bo helgirtina tiştên kevnar û dîrokî cureyekê din li ser Nostalojîyê hate zêde kirin ew jî bîranîna alavên kevin yên netewe û mirovên pêşîn, zêdebarî wê çendê jî li gelek cihan û mozeyan de gelek alavên şeran jî dihatin parastin ku tê de dibûne egerê bîranînên nexweş ji bo mirovan.

Bi heman şikil jî serinc hate dan ku guhertina bi lez di nav civakan û herweha rol û girîngîya regezan rêveberîya komekê dikir ji bo eleqeyên rojên niha û ji bo wêne kirneka nû ji bo ew bûyerên ku niha hene, sedem jî ew dûman û toza ku li pêşberî Nostalojîyê belav bibû, ku zêdetir eleqeyeke nimûneyî bû bi berawird digel fehm kirneka rasterast ji bo rabirdûyê. "Liber vê jî pirr caran Nostalojî dihête wêne kirin weke bersivê ji bo dijberî û dû dilîyan li ser guhartinên bi lez ku derdikevin di cîhana moderin de".⁵² Heta ku mirov bikare zêdetir xwe digel guhertina li hev bîne wê bandora wan guhertina kêmtir li ser mirovan derkeve, astê Nostalojîyê li ser wê yekê dihête girêdan ka mirov û hêza mirovan heta çî astekî dikare xwe digel guhertinan li hev bîne, ew mirovên zû bi zû dikarin xwe digel jîngeheke din an jî civakeke din li hev bîne wê kêmtir bikeve astê perêşanîyê û kêmtir hest bi bûyerên rabirdûyê bike.

Edebyat sedemeka dine ku Nostalojî zêdetir bihête nas kirin, herweha nerînên nivîskar û helbestvanan di şiroveya Nostalojîyê bi girîngî ve hatine qebûl kirin, "Edebyata Derûnzaniyê jî raya wê digel hindêye ku Nostalojî dikare belav bibe bi sedema hestên tenêti û xemgîniyê, bêzarî û ne domandina jiyane ji aliyê kesekî di demê niha de".⁵³ Bo nimûne, ev yeke hate aşkera kirin ku bejdarî kirin di qutabxaneyan de zêdetir ber bi Nostalojîyê dihêt rakêşan, di demekî de ku di rewşeke Derûniya nerênî dene an jî di rewşeke ne baş dene bi berawird bi wan kesên ku di gundan dijîn û rewşa Derûniya wan erênî û normale. ev nerîne jî wê yekê piştrast dike ku ew mirovên ji xweza û jiyana xweru dûrin zêdetir Nostalojî bi ser de zal dibe, alavên pirr û jiyaneke qerebalix dibe sedem ku mejîyê mirovan zêdetir hizir li

⁵¹ Nora P, *Between Memory and History: Les Lieux de Memoire*. Representations, University of California, America, 1989, r 7–24.

⁵² Pickering M. and E. Keightley, *The Modalities of Nostalgia*. Current, Sociology, London, 2006, r 919–941.

⁵³ Wildschut, *Sedikides and Arndt, Nostalgia: Content, Triggers, Functions*, Southampton, 2006, r (975-993).

çawatîya jiyane bike, li hemberî wan ew kesên ku li nav gundan û jiyaneke rehet bi ser diben, kêmtir hizir û xeyalên wan ber bi çawatîya jiyane diçe û zêde zehmetiyê naden ber xwe ka divêt çawa bijîn tenê jiyaneke sade û xweru dijîn, ev jî bandora hestên Nostalojî li ba wan bi awayekî zêde kêmtir diket.

Herweha Tûşbûna Nostalojîyê weha hate danan, ku beşek ji wan kesan digel qebareya xem û xefetên wan bandor li ser pêwera kesayetîya wan û demarên esebî bûnê dike, ku ji pênc hestên mirovan in, tûşbûna Nostalojîyê pirr caran dibe sedema pevçûn û alozîyên mirovan digel ew kesên ku di derdora wan in, ev jî tê wê wateyê ku Nostalojî hemû caran tenê nabe sedem ji bo perêşanî bûnê, belkî dibe wexta ku ew kesê rastî Nostalojîyê hatî bikeve haletekê weha ku rewşa derdora xwe nexweş bike. Hinek vekolînên din jî ev yek aşkera kir, ku ezmûn kirina hestê xwe kêmtir dîtinê û bê bihayî, dibe sedema bilind bûna hestê Nostalojîyê, herweha hebûna tirsê ji mirinê dikare bibe peqînek ji bo bîrhatina Nostalojîyê, herweha pêwîstîya hevpişkekî ji bo jiyane dibe sedema derketina Nostalojîyê, lêbelê xaleke herî girîng li vir ewe ku hest kirina mirovan bi kêmtir û bê bihayîyê rewşa wan mirovan zêdetir xerab dike û astê Nostalojîya wan zêdetir dike, çimkî xwe dîtin bi kêmtir li hemberê mirovên din halê kesê Nostalojî xerabtir dike û dikeve halekê weha ku naxwaze digel tu kesî eleqeyan çê bike, hertim xwe dûrî wan dike, bi tena serê xwe digel jiyana rabirdûya xwe dijî, hizra mirovên berê û hizra rewşa xwe di zemanê berê de dike, ev hestê Nostalojî di derencamê xwe dûr kirin ji mirovan çê dibe, herweha yên ku dixwazin kesek hebe ku hevpişik be di jiyana wan de, ew jî rastî cureyekê Nostalojîyê dihên ku hest kirine bi pêwîstîya mirovekî ji bo jiyane, pirranîya caran jî dixwazin evîndarek rastî jiyana wan were daku bi hev re wê jiyana qerebalixî bidomînin.

1.4.3. Nostalojî û Edebyat

Di destpêkê û Di mijara Nostalojî û Derûnzaniyê de me ev yek da aşkera kirin ku bingeha serheldana Nostalojîyê di nav Derûnzaniyê deye, wate destpêkê Nostalojî weke zarawe di nav Derûnzaniyê de serheldaye û pişt re baz dide nav Edebê û weke zaraweyeke Edebî der dikeve nav têkistan û dibe mijareke balkêş, ku vekolerên Edebî vekolînên xwe li ser bikin.

Nostalojî di nav Edebê "bi cureyekê nivîsandinê dihête gotin, ku li gorî van pîrensîpan helbestvan an jî nivîskar di helbest û nivîsên xwe de hizir ji rabirdûyê

biserde çûyî diket, an jî welatek ku di hizra wî de maye û nikare ji hizra xwe bavêje der, bi hesret û jan ve wêneya wan dikişîne û di berhemên xwe dixwe pêşçav"⁵⁴ Wate Nostalojî di nav Edebê de bi şeweyekê nivîsandinê dihête gotin ku rengvedana wan hest û reftarên Nostalojî ne ku helbestvan an jî nivîskar di nav berhemên xwe de tomar kiribin, ew hest û êş jî ji aliyê nivîskaran ve hatibe kişandin an jî nivîskar behsa hestekê Nostalojî li ba kesekî an jî behsa êşên neteweyekî bike, ya girîng ewe ku ew mijar Nostalojî be û wan pîrensîpên Nostalojî bi xwe re bigire. Nostalojî di warên din jî derketibû weke zanistên mirovahîyê û hunerî, wate di nav wan zanistan jî xwe dabû xuya kirin, ji ber vê çendê jî "rexnegiran jî di berhemên helbestavan û hunermendan de ji dîv taybetmendîyên vê mijarê û çawatiya derketina vê reftara na agahî digerîyan"⁵⁵ Ev ji dîv geryana vekoleran û encamdana vekolînan di berhemên nivîskaran bû sedema hindê ku gelek berhemên cihanî bikevine qalbê Nostalojîyê û bibin beşek ji vê mijara nû derketî.

Geryana vekoleran di nav berhemên cihanî berdewamî hebû, ev berdewamî û tîna vekoleran li ser vê mijarê bû egerê hindê ku gelek şa berhemên nivîskaran bi mijara Nostalojîyê ve girê bidin. hinek ji wan berhemên ku vekoleran destnîşan kirî evin; "şanonameya Odîb Paşayê Sofoklîs".⁵⁶ Herweha "*Komar* a Eflaton, *Sîyaset* a Ersto, *Totopya* ya Tomas Mor, (Bajêrê Xuday) ya Ogotînos, *Elmedîne Elfazilet* ya Farabî, *Romana Elmexluqat* ya Fazil El'zawî, ..htd"⁵⁷. Çendek ji wan berhemên li jor berî derketin an jî naskirina Nostalojîyê hebûne, lêbelê nîşaneyên Nostalojîyê digel demê ku Nostalojî tê de hatîye nas kirin cudaye, dîroka nas kirina Nostalojîyê pîrr dirêj nîye, lêbelê weke diyarde û Nîşane dîrokeke gelek kevin heye û di nav hemû çaxên dîrokê de hebûye, mînak jî bo vê çenda hanê, çîroka nevbera Yaqub Pêxember û kurê wî Yusif Pêxemberîye⁵⁸ silavê xudey li ser bin dema birayên Yusif, Yusif davêjin nava bîrekê û ji babê wî vediqedînin, ev veqedyane jî dibe sedema xem û diltengîyeke zêde ji bo Pêxember Yaqub û ji dûrîya kurê xwe gelek perêşan dibe, ev

⁵⁴ Hesên Anûşê, *Ferheng Nameyê Edebîyê Farisî*, Berga Dûyem, Çapa Yekem, Tehran, 1376, r 60.

⁵⁵ 'Elî Ebasabad, Yusif, *Xem û Xurbet Der Şî'rê Me'asir*, Danişgahê Peyamê Nûrê Semnan, Îran, 1387, r 90.

⁵⁶ Serkewt Se'dî Qadir, *Namoyl Le Romanî Selah Omer Da*, Weşanxaneyê Hacî Haşim, Hewlêr, 2011, r 75.

⁵⁷ Sebah Îsma'îl, *Çemk û Êstatîkay Şwên Le Edeb Da*, çapa yekem, dezgay Aras, Hewlêr, 2009, r 11.

⁵⁸ Ev Çîroke di qur'ana pîroz de hatîye bas kirin, ku serhatîyeke di navbera dû Pêxemberan, ku ev dû Pêxembere jî kur û bab in.

nîşane û çîroke pirre ji Nostalojîyê. Herweha dîroka vê riwîdanê jî pirr dirêj e û ji bo serdemeke gelek kevin vedigere.

Li vir jî ev yek tê wê wateyê ku "Nostalojî di Edebê de nexweşîyek nebûye mîna derketina Nostalojîyê di Derûnzaniyê de, belkî nîşaneyek bûye ji bo hestekê Romansî û xem û êşeke direng ji dayîk bûyî, bo nimûne berhemên Nostalojî di Edebyata ferensî di berhemên Hogo, Balzak, Bodlêr, Lamartîn, Romana Namoyî ya Albêrt kamoy û ..htd".⁵⁹ rengvedan kirîye. Hebûna diyardeya Nostalojîyê di nav berhemên wan nivîskarên mezin ên Ferensî, zêdetir ev eleqeye di navbera Edebyat û Nostalojîyê berev pêşve bir, çimkî berhem û nivîsên nivîskaran rengvedana derûnê wan e, wate ew bûyerên di cîhanê de hene digel ew bûyerên ji aliyê nivîskar ve dihên qewmîn, hemû jî bi cureyekî ji cureyan bandorê li ser nivîskaran diket, nivîskar jî pêkolê diket li gorî hizir û ramanên xwe serederîyê digel wan bûyeran bike û di nava berhemên xwe parve bike.

Peywendîya navbera Nostalojî û Edebyatê peywendîyeke bi hêz e, bi tu awayî ji hev nahên cuda kirin, çimkî digel serheldana têkistên Edebî Nostalojî jî weke diyarde di nav wan têkistan de hazirî hebûye, raste Nostalojî weke zarawe û çemk nûye, lêbelê weke diyarde pirr kevin e û digel serheldana têkistan ev diyardeye hebûye, bi vî awayî peywandî û eleqeya Nostalojîyê weha dihête wesif kirin ku peywandîyeke bi hêze û di nav pirranîya berhem û têkistên Edebî hestên Nostalojîyê xwe didin nîşan û xuya kirin.

1.4.4. Nostalojî û Klasîzim

Klasîzma Ewropayê di set salên berê zayînê dest pê dike û heta setsala hejdan didome, wate di Edebyata Girîk û Yonan de dest pê dike, pişt re di Ewropayê de bi çavlêkerîya Edebyata Yonanî û Romanî Klasîzma nû di setsala 15 û 16an careka din ava dibe, di setsala 18an jî bi dûmahîk dihêt. Herweha girîngtirîn nimûne yên wan berheman ev in, Eristo, Horas, biwalo, ..htd.

Li ser Klasîzmê Horas dibêje: "şerta têgehiştina Klasîzmê û şerta hebûna wê digel şertên vegeryanê ji bo berê hatîye girêdan"⁶⁰. Wate li vir ev yek dihête aşkera

⁵⁹ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'ri Hawçerxi Kurdî Da*, Weşanxaneya Taran, Çapa Yekem, 2016, r 148.

⁶⁰ Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, Weşanxaneya Dezgay Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2004, r 19.

kirin ku Klasîzm li ser berhemên kevnar hatîye ava kirin û berhemên berê zayînê yê Yonan û Roman nimûneyên herî bilind bûn ji bo serheldana Klasîzmê. Bingeha Klasîzmê li ser vegeryan ji bo şaristanîyeta Ewropaya kevin hatibû ava kirin, "sax vekirina rêwîtiyên kevin û Edebyata kevin bi şêweyeke nû û afirînerê"⁶¹. Ev yek jî dibû sedema afirînera berhemên kevin bi awayekî nûjîn di nav cîhana Edebyatê de, bingeha vê rêbazê ku vegeryan bû ji bo berhemên kevin, weha kir ku dîsa qedrê van berhemên bilind bibe û di nava xelkî de bibe nimûneyên afirînerên bilind yê mirovahîyê.

Hinek bingeh û pîrensîpên girîng ku Klasîzmê kirîye şert ji bo ava bûna berhemên xwe, wate ji bo ku berhemek an jî têkistek bibe berhemeke Klasîzmê çend şertek hene, ku divêt di nav wan berhemên de hebin. ew şert jî evin:

1. Zarve kirina xwezayê:

"Xweza ji aliyê klasîzman, divêt tenê ew tiştên baş û exlaqî lê bihêt wergirtin, Klasîzman xweza bi awayeka weha di berhemên xwe bas dikir, ku digel rastîyê li hev bihata û xizmeta mejî û exlaqê civakî bikra"⁶². Wate divêt tenê ew tişt bin ku ji bo mirov û civakan bibe sedema qezenc kirinê, herweha bi awayekî be ku mirov bi hêsanî lê hîn bibe.

2. Zarve kirina berhemên kevnar:

Yek ji bingehên Klasîzmê ew bû ku wan digot divêt ji bo ku em berhemên xwe bi afirînîna divêt di nav berhemên kevin bigerîn û hêza xwe ji wan berhemên wergirîn, nimûneyên berhemên wan jî berhemên Yonan û Romanîyan bûn, wek Homîros, Orpîr, Vêrjîl, Sofoklîs, Horas, ..htd.

3. Vebêjanên kevin:

Di nava tiyatroya Klasîzmê de girîngîyeke pirr bi dîrok û çîrokên dîrokî hatîye dan û weke alaveke serekî di şanoyan de hatîye bikaranîn.

⁶¹ Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, r 23.

⁶² Soaran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Da*, r 160.

4. 'Eqlanî:

"Li Klasîzmê de her tişt li jêr kontirola 'eqil an jî mejî deye û dibû 'eqil şêwermendî jê re bikra, çimkî wan digot: eqil xeyala mirovan ber bi rêyeke rast dibe û tixûbekî jê re didane"⁶³. Herçend ku tu berhemek an jî têkisteke Edebî tune ye ku hest û soz tê de nebe, belkî hemû berhemên Edebî bi rêya hest û xeyalan dihê afirandin, ew jî tê wê wateyê ku berhemên Klasîzmê jî xwedîyê xeyalên bilind û hest û sozan in, ku girêdayê derûnê mirovan in.

5. Mijarî bûn (Babetî bûn):

Herweha bingehêka din di nav Klasîzmê de ew bû ku mijarên wan li çarçoveyeka dîyarî kirî bûn, wate dibû ku mijarên wan giştî bin û behsa êş û pîrsgirêkên civakî biket.

Yek ji wan bingehên serekî ku bi klasîzmê ve hatibû girêdan vegeryan bû ji bo berhemên berê, wate nimûneya berhemên Klasîk berhemên berê bûn, ev jî tê wê wateyê ku eleqeyê xurt di navbera Nostalojî û Klasîzmê de heye, çimkî bingeha herî girîng di Nostalojîyê de vegeryane ji bo rabirdûyê û demên berê ku tê de xweşî û jiyaneke bedew hebûye. Herweha di Edebyata Klasîzm de xem û hesreta vegeryanê heye ji bo rabirdûyê û şerteke herî girîng jî bû di nav vê rêbazê de. Nostalojî yek ji wan mijarane ku ne tenê girêdayî rêbazekê ye, belkî di nav pîrranîya rêbazan de heye, herweha Nostalojî tenê girêdayî çaxekê an jî demekê dîrokîyê dîyarî kirî nîye, belkî Nostalojî diyardeyê ku di nav derûna hemû mirovan de heye û di nav hemû netewe û serdeman de hebûye, li ber vê çendê jî û li gorî wan bingehên ku ji bo Klasîzmê hatîne destnîşan kirin, Nostalojî xwe di nav pîrensîpên Klasîzmê dibîne ku Klasîzm rêbazê Edebîyê û li ser binemaya vegeryan ji bo serdemên berê û wan berhemên ku di nav Edebyata Yonanî û Romanî de hebûne hatîye ava kirin, vegeryan ji bo wan berhemên jî bi rêya hest û xwesteka ava kirina wan berhemên bi awayekî nûjîn taybetîyê mirovên wê demê bûye û herweha xewin û xeyaleke xwezayîya hemû mirovane ji bo vegeryanê ji bo şêwe jiyana berê û eleqeyên berê.

Herweha eger em li wan berhemên Klasîka Kurdî jî binêrin wê ev bikeve ber çavên me ku di Edebyata Klasîka Kurdî de berhemên Nostalojî yên gelek ciwan û bi buha hene, ku bi awayekî teknîkî yê bilind helbestvanan ew hest û sozên xwe li nav berhemên xwe saz kirine, ku niha jî bêhin û xwendina wan berhemên xweşîyê

⁶³ Soaran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Da*, r 161.

taybet didine mirov, wate di Edebyata klasîzma Kurdî jî de di pirranîya berhemên helbestvanan de diyardeya Nostalojîyê heye û Nostalojîyê rengvedana xwe di nav Edebyata klasîka Kurdî de kirîye. Sedema wê çendê jî ku di Edebyata klasîzma Kurdî de mijara Nostalojî bi awayekî zêde heye, ji bo wê yekê vedigere ku mijar û naveroka berhemên klasîzma Kurdî cudahî heye digel mijara berhemên Ewropî, mijara Klasîzma Kurdî bi awayekî zêde pêk dihêt ji soz û hestên Romansî û herweha hizra neteweyî bi awayekî zêde di nav berhemên klasîka Kurdî de heye, ku ev jî bi vî awayî di nav berhemên klasîzma Ewropayê de tune ye û dibe cudahî di navbera klasîzma Kurdî û klasîzma Ewropayê de.

1.4.5. Nostalojî û Romansîzim

Di pîrensîpên qutabxaneyê Romansîzmê de em dikarin hizir û nerînên Nostalojîyê bibînin. Bingehên Romansîzmê, helatin ji rastîyê û geşt kirin e, nexweşî di nav jîngeh û ziman dibe sedema helatinê ji bo rewşeke din an jî zemenekê din, xwe mêvan kirin ji bo seferên dîrokî an jî erdnîgarî, sefer yek ji nîşane û pîrensîpên romantîzmê ne. di demê wan dîtin û seferên erdnîgarî û dîrokî hizra helbestvan ber bi welatên dûr û cihên dûr diçe. Di seferên dîrokî de helbestvan an jî nivîskar riha xwe bi ser temenekê pîr hest û gewreyî û ciwanîya xwezayê difrîne, "dewreya qehremanan û 'Eşîq û efsaneyê perîyan û xeyalan jî bi navê romantîzmê ne"⁶⁴ ji bilî sefera erdnîgarî û dîrokî, helbestvan û nivîskarên Romantîzmê seferên rastî jî li ba wan hebûye û bîranînen xwe yê wan seferan di pîrensîpên xwe didin nîşan kirin. Romansîzman di seferên xeyalî yê xwe de bi hêvîya bi destanîna jîngeheka ciwan û şahane ne. ew Nostalojîya ji bo beheştê berze di pirranîya deman de ji bo vedîtina ew tiştane ku hatîne berze kirin û ji destdan, demên pîr bihayên Romantîzma, ne tenê girêdayê rabirdûyê ye, belkî armanca wanîş heye û erkê her kesekî geştiyê bi wê armancê.

Yek ji bingehên din ên Nostalojîyê ku di nav qutabxaneyê Romantîzmê de ye, Nostalojîya dûrî ji biheştê û jiyana hetayî ye. Di vê rewşê de helbestvan weha hest dike ku ji eslê xwe dûr ketîye û weke kesekê zîndan kirî ji welatê xerîbîyê jiyana xwe didomîne. "Riha mirovî ku cihekê me'newî di mirov de heye, dûr ji mala bab û jiyana madî jiyana xwe didomîne"⁶⁵ Wexta ku mirov di rewşeke Saykolojî a ne baş be bi

⁶⁴ Rabert Seyr û Lûy Mişêl, *Romantîsim û Tefekirê Ictimâî*, Çapa Dûyem, Tehran, 1383, r 132.

⁶⁵ Rabert Seyr û Lûy Mişêl, *Romantîsim û Tefekirê Ictimâî*, Çapa Dûyem, Tehran, 1383, r 131.

sedemên pêşveçûna teknolojîyê û dûrketina civakan ji hev û kêmbûna eleqeyên di navbera mirovan de, wê neçar bimîne berê xwe bide xwezayê û bi rêya vegeryanê ji bo nav xwezayê jiyaneke rehet û dûr li jîngeha niha ji xwe re çê bike û pirranîya caran jî helbestvan jîngeheke weha ya tenêtiyê bi rêya xeyalan ji xwe re çê dibe û bêy ku bi awayekî heqîqî bikeve nav xwezayê de ev jî astê Nostalojîya helbestvan bilindtir dibe.

Herweha di Romantîzmê de pîrensîpeke din an jî xasyeteke din heye ku tev rengvedana Nostalojîyê ye ku weha dibêje: "Romantîzîm retkirina rastîyê û pena birina ber xeyalan e, di nav xeyalan de cîhanên ciwan û xweş ji bo xwe wêne dikin, ku hemkarî û biratî û yeksanî tê de ewle be û lêbûrîn hebe, ev pîrensîp û taybetmendîye jî di nav cîhana rastîyê de xuya naket, ji ber vê çendê jî bi neçarî ve penaya xwe dibene ber xeyalan".⁶⁶ Di jiyana rastîyê de edalet tune ye û jiyaneke pirr zor dihêtişandin ji bo destketina hinek rehetîyê, ji ber vê çendê jî helbestvanên Edeba Romantîzmê ev yek kirîyê pîrensîpeke serekî di rêbaza xwe de, çimkî ew tiştên ku di jiyana rastîyê de nahên destxistin helbestvanên Romantîzmê bi rêya xeyalan wan xwastekên xwe berhev dikin, ew dikarin bi rêya xeyalan cîhaneka ciwan û bi ewle ji xwe re çê bikin û her tiştê ku bi dilê wan be û cîhana wan ciwantir bike ewê weha cîhana xwe di xeyalên xwe de bi nexşînin.

Taybetmendîyeke din a rêbaza Romantîzmê şev e, di Edebyata Romantîzmê de "wênekêşê şevê bi awayekî berfireh dihêtiş hest pê kirin, çimkî şev rihetî û aramîyê bixwe digire û di heman demê de jî pîsî û kirêtiya dorpêç dibe û ji ber çavan berze diket. Helbestvanê Romantîzmê di şevê de goşegîr e û digel dil û derûnê xwe dijî û di fikre. şev reş e û reşîş nîşaneyê şûmî û naşêrinîya waqî'êye".⁶⁷ Şev yek ji taybetîyên helbestvanên rêbaza romantîzmê bû, çimkî helbestvan û pêrewên Romantîzmê jî ku ji wan naşêrinî û talîya jiyaneke û herweha ji wan na edaletîya ku li hemberî mirovan dihêtiş kirin û bê biha bûna mirovan, wan pêkol kir ku şevê bikin beşek ji cîhana xeyalên xwe û di nava şevan de xeyalên xwe ava bikin, çimkî di şevê de her tişt wendaye û li ber çavan berzeye, na edaletî û pîsîyên jiyaneke di şevê de berze dibin, şev her tiştî berze dibe û li ber çavan wenda dibe, ev yeke jî bû sedema hindê ku helbestvanên vê rêbazê şevê helbijêrin û di şevê de bi dilê xwe cîhaneka azad û bê kêmasî ji xwe re bidin ava kirin, di nava şevan de û di tenêtiya şevê de xeyalên

⁶⁶ Hîmîdad Husên, *Rêbaze Edebîyekan*, Weşanxaneyê Rojhilat, Çapa Sêyê, Hewlêr, 2014, r 97.

⁶⁷ Hîmîdad Husên, *Rêbaze Edebîyekan*, r 97.

ciwantir û cîhanên xwezayî û cîhanên evînîyê çêtir dihên ava kirin. Ev pîrensîpa Romansîzman digel reftarên Nostalojîyê bi awayekî zêde hev digirin, ji ber ku yek ji haletên Nostalojîyê xeyal in û çê kirina cîhanêke din e, ku xweşî tê de hebin û bi dilê mirov ew cîhan ava bibe, ji ku ew cîhan jî çê bibe demeke weha lazim e ku mirov tê de tena be û tu na rehetîyek nehêt hemberî mirov ji bo vê yekê jî şev çêtirîn deme ku xeyalên kur çê bibin, herçend ew jiyana tenê bi xeyal jî be, lêbelê mirov dikare ji bo demekê kêr di nav xeyalên wan şevan de cîhanêke azad ji xwe re çê bike û ew alavên ku wî/wê di jiyana de jê hez dike bi rêya xeyalan bi dest xwe bixe.

Weke li jor me da zanîn ku em dikarin di qutabxaneyê Romansîzmê de hest û nerînên Nostalojî bibînin ew jî digel wê yekê dihêt ku di setsala 19an de ji aliyê Romansîzman ve têgeha Nostalojîyê yê hatîye nav Edebê de, di wê demê de Romansîzman ji bo derbaz kirina xwe ji rastîyên tal yên jiyana û bi amêr kirina mirovan û ..htd bikar hatîye. Bo nimûne Elis Çandîler ku yeke ji peyrewkerên Romansîyê, dibêje: "ava kirina rabirdûyê, cîhanêka xeyalî ya serbixwe ji bo jiyana taybetî a mirovan çêkirîye, êdî koça xeyalan ji bo rabirdûyê li nav Roman û Edebê de hate peyrew kirin"⁶⁸. Di vêrê de ev yeke aşkera dibêt, ku Nostalojî li aliyê Romansîzman ve bûye babetekê serekî an jî bi rêya hestê Nostalojîya xwe pêkol kirîye ku têkistên Edebî saz biken. Ev yeke jî ji reng kirina rastîya jiyana bû an jî ji bo dûrketinê bû ji wê rastîya tal ku di setsala 20an de hebûye. Di wê demê de mirov weke amêran dihat bikaranîn û herweha bihayê mirov û ciwanîyên jiyana tune bibûn. Ev çende jî bûye sedemê hindê ku Romansîzim ji bo rizgar bûn û dûrketinê ji wan nexweşîyan penaya xwe bibene ber xeyalan û bi rêya xeyalan ve vegehin ji bo rabirdûyê û ew sat û demên xweş ku ji rabirdûya wan hebûye ji xwere vegehin in, herweha wan pêkol kirîye ku bi rêya xeyalê cîhanêka ciwan ji xwe re bidin çêkirin.

1.4.6. Nostalojî û Riyalîzim

Riyalîzim weke rêbazêke Edebî piştî rêbaza Romansîzmê der dikeve, ji aliyê dîrokê ve Riyalîzim di navenda setsala 19an de li Ferensayê serheldide. Riyalîzim di warê Edebê de bi wê wateyê dihêt ku "divêt hemû mijarên fikrî çareserîyeke babetî ji bo pîrsgirêkên jiyana mirovan biket, divêt ev çareserîye wêneyeke hûr û kur tê de be,

⁶⁸ Kerîm Deştî, *Ebeb û Felsefe*, Weşanxaneyê Şehab, Çapa Yekem, Hewlêr, 2013, r 50.

ku nivîskar xwe ji derveyê mijarê bibîne"⁶⁹. Riyalîzim dixwaze ew pirsgirêkên di nav civakan de hene di nav mijarên xwe bide ber rexneyan û çareserîyekê jê re vebîne, herweha ji nerînên nivîskarên Riyalîzmê hestekê mezin heye ji bo nîşane kirina wan pirsgirêkên nava civak û dîtina çareyekê jê re.

Nostalojî bi sedema wan pirsgirêkan serhel dide, ku di nav civakan de hene. Herweha cureyeka din ji Nostalojîyê, vegeryan bû ji bo nav xwezayê û rakirin ji wê heqîqeta ku niha di jiyane de heye, bi heman awayî jî Riyalîzima xwezayî vedigere ji bo xwezayê û pêkhatyên nav xwezayê, çimkî "wexta ku Riyalîzim vedigeryan ji bo nav xwezayê û behsa xwezayê dikir ji ber ciwanîya wê nebû, belkî ev wêney dikşîne ku hest pê dike, lê ji ber ciwanîya wê ne, belkî ji ber heqîqeta wê, çî ciwan be an jî ciwan nebe"⁷⁰. Nivîskarên Riyalîzmê pêkol kirîye ku hqîqeteka din di nav vê heqîqetê ava bikin, lêbelê bi fayde kirin ji heqîqetê, nek veguhaztina pêkhatyên nav waqîê weke xwe, ji ber vê çendê jî dihête gotin: "nivîskarên rastbêj, heqîqetê mîna xwe nîşan naden, belkî dihêt bi hişyarî vê cîhanê wêney dikşîne, ku xewin pêve dîtîye"⁷¹. Riyalîzmê eleqeyeke kur bi civakî ve heye û herweha nivîskar jî beşeke ji civakî û xem û êşên nivîskar heger xwedî jî bin, lêbelê beşekin ji xem û êşên giştî û civak, çimkî helbestvan jî miroveke di nav vî civakî de.

Ji bo ku bêhtir Riyalîzmê bidîn naskirin û nîşaneyên Nostalojîyê di nav vê Rêbazê de bidîn berçav, li vir de wê wan taybetmendîyên Rêbaza Riyalîzmê binvîsîn ku ji van xalên li jêr pêk dihên:

1. "Bi nêrîneka giştî ji jiyana mirovan dinêrin, wate herdû alîyên xwedî û giştî dixwe berçav bi baş û xirap ve.
2. Bi nerîna Rêbaza Riyalîzmê mirovan weke bûnewerekê xwedî yê ecêb lê nanere, belkî weke bûnewerekê dagîrker yê jiyana û civakî lê dinêre.
3. Jîngeh û rewşa civakî û derdora mirovan bandorê ji rewşa diyardeyên jiyana her roj a takekesan diket û cureyên wan eleqeyan digel derdora mirov dide nîşane kirin.

⁶⁹ Hîmdad Husên, *Rêbaze Edebîyekan*, r 125.

⁷⁰ Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, r 101.

⁷¹ Heme Se'îd Hesên, *Şî'r û Şîmşêr*, Çapa Yekem, Weşnxaneya Aras, Hewlêr, 2004, r 119.

4. Rêbaza Riyalîzim lehengan weha derdixe, ku di destpêkê ve heta dûmahîkê hêdî hêdî pêşve diçe, nek weke Rêbazên Kîlasîzm û Romansîzmê lehengên wan hazir bin.
5. Ew cîhana nivîskarê Riyalîzimê bas lê dike hebûneka heqîqî heye û ji wê heqîqetê vedikole û karîgeriya wê li ser derdorê derdixe, ne bi awayekî xeyalî û dûr li rastîyê.
6. Riyalîzma rexnegirane mijarên xwe di nav çînên civakî werdigre, herweha wan dixwest ku ji hemû çîn û regezên civakî şareza bibin û li ser bi peyvin, ji ber vê çendê jî lehengên wan ji hemû regezan pêk dihatin"⁷².

Li gorî binemayên Riyalîzmê xuyaye ku peywendîyeke zêde di navbera Riyalîzim û Nostalojîyê de heye, ev peywendî û eleqeye jî ji bo wê yekê vedigere ku herdûk mijar jiyana rastî û waqî'î ret dikin û didin ber rexneyan, dixwazin jiyaneke din ava bikin ku bêhtir û xweştir be, bi taybetî jî berhemên van nivîskaran "(Yefgînî Ongînî) Poşkîn, (Giyanî Mirdûwekan)î Gogol, (Palewanî Serdem)î Lêrmentov, (Zîndûbûnewe)ya Tolstoy, ..htd, û di Edebyata Kurdî de jî ev berhem in, (Le Xewmay) Cemîl Saîb, (Pêkenînî Geda) Hesên Qizilçî, (Hemîşe Behar)î 'Elaedîn Secadî, ..htd"⁷³. Ev berhemên ku li vir hatin nîşan dan piranîya wan dikevin nav mijara Nostalojîyê an jî nostalojî ne, bi awayeka giştî Nostalojîyê eleqeyeke bi hêz bi Riyalîzmê re heye bi taybetî jî Riyalîzma Sîhrî û Fentazî, ku ji Emrîkaya Latîn serheldaye, "eleqeyeke xurt û hev pişik di navbera Riyalîzma Sîhrî û Nostalojîya xwedî û giştî heye, ji ber ku Riyalîzma Sîhrî çavkanîyên xwe ji rastîyê werdigire, lêbelê ji bo zarve kirin û pêşkêş kirinê xwe bi fentazîya û regezên efsaneyî girê didin"⁷⁴. Wate Riyalîzma Sîhrî peywendî bi herdûk cureyên Nostalojîyê ve heye, Nostalojîya xwedî ji şeweyê paşerojeka nimûneyî bi rêya xeyalan, herweha Nostalojîya giştî bi rêya pena birinê ji bo efsaneyan û kesayetî û bûyerên efsaneyî, an jî hêvî xwestin ji bo cîhaneka nimûneyî, ku ev yek jî hemû xwe di nav mijara Riyalîzmê de dibînin, herweha çawa di nav hemû berhemên Edebî de Nostalojî û hestên Nostalojî hene, weha jî tê gotin ku di nav hemû berhemên de Riyalîzim heye, "niha hemû berhemên Edebî û hunerî bi her awayekî û teknîkekê be her diçe ser

⁷² Hîmîdad Husên, *Rêbaze Edebîyekan*, r 117-118.

⁷³ Hîmîdad Husên, *Rêbaze Edebîyekan*, r 144-85.

⁷⁴ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'ri Hawçerxî Kurdî da*, r 196.

Riyalîzmê"⁷⁵. Çimkî weha dibêjin: waqî'ê tu sînorek nîne û ava kirin û dahênana her berhemekê jî rengvedana waqî'ê ye.

Nimûne ji bo berhemên Riyalîzmê di Edebyata Kurdî de pirr in, lê li vir emê tenê nimûneyekê bidîn pêşçav ew jî helbestvanê setsala 20an Goran e, ku berhemên wî Riyalîzm in, dibe haya wî ji vê rêbazê jî nebe an jî hebe, lêbelê ew bixwe weha dibêje: "piştî vê heyamê karîgerîya Siyasî û Civakî dikeve nav me de û ez li jêr bandora Edebyata Înglîzî û 'Erebîyê dikevim nav hewayê waqî'ê"⁷⁶. Herweha Ferhad Pîrbal li ser Riyalîzim bûna Goran weha dibêje; "Riyalîzim bûna Goran ji wê yekê der dikeve, ku Goran ji bo cara yekemîn behsa cîhana xwedî û azadîyên wê diket, bi rêya takekesî xwe avête nav pirsgerêkên giştî, herweha Goran mijar û pirsgerêkên Civakî û Siyasî û mirovahîyan avêtne ber şirove û nerînên xwe, herweha Goran ber bi çavkanîyên nîştimanî û folklorê resen a neteweyî vedigere û saman û helbestên folklorî li hembêza xwe dike"⁷⁷. Wate em dikarin weha bibêjin, ku Nostalojî û Riyalîzmê eleqeyê xurt û kur bi hev re heye bi awayekî giştî, çimkî Nostalojî helgirê xem û êş û nexweşî û hest û soz û saykolojîya xwedî ye li hemberî pirsgerêkên rojane û zordarî û cîyawazîya çinan û na edaletîya civakî, ku ev jî mijara berhemên Riyalîzmê ne.

1.4.7. Nostalojî û Sîmbûlîzim

Yek ji wan rêbazên Edebî ku cihekê berfireh di nav pirranîya Edebyata neteweyan cih digire Rêbaza Sîmbûlîzim e, herweha Edebyata Kurdî jî bê par nîye ji bikaranîna vê rêbazê, çimkî Rêbaza Sîmbûlîzim peywendîyeke zêde bi sansorên civakî û Siyasî ve heye, bi dirêjahîya çaxên dîrokîyê jî neteweya Kurdan dibin zorê û zordarîyê de bûne, loma helbestvan û nivîskarên Kurd bi rêya vê rêbazê û bi rêya nîşaneyên taybet pêkol kirîye armanj û mebestên xwe di nav naveroka helbestên xwe de parve bikin, ew jî tê wê wateyê ku Rêbaza Sîmbûlîzim cihekê gelek berfireh di nav Edebyata Kurdî de bixwe digire, ji ber ku eleqeyê zêde di navbera Sîmbûlîzim û sansorên civakî û Siyasî de heye, ku ev sansor zehemetîyê ji bo mirovan dihîne û Saykolojîya wan xerab dibe, di dawîyê de Nostalojî li ba wan çê dibe, tê wê wateyê ku Nostalojî û Sîmbûlîzim bi hev re eleqedar in, lêbelê "merceke hetmî nîne ku Nostalojîyê

⁷⁵ Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, r 109.

⁷⁶ Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, r 110.

⁷⁷ Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, r 110.

eleqeyeka ji setî set bi binema û pîrensîpên Sîmbûlîzmê ve hebe, lê beşeke zêde ji vê Rêbazê eleqeyeka kur bi Nostalojiyê ve heye"⁷⁸. Wate heger eleqeyeka ji setî set jî di navbera Nostaloji û Sîmbûlîzimê de nebe, lê bi awayekî giştî eleqeyeka kur di navbera wan de heye. Li vir de ji bo ku zêdetir Sîmbûlîzmê nas bikî bi awayekî giştî wê girîngtirîn pîrensîpên Sîmbûlîzmê bidî nîşan kirin:

1. "Rewşa xembarîyê û hembêza xwezayê û ew dîmenên bûyer û rwîdanan ku sedema bê hîvî bûn û êş û azar û nîgeranî û tirs û kelecaniya mirovan in didin nîşane kirin.
2. Girîngîyê bi wan şeweyê û remiz û nîşaneyan didin, ku hest û sozên mirovan digelin û dijî eqil û lojîkê ne.
3. Dûrketin ji waqî'a babetî û nêzî bûn ji waqî'a zeynî.
4. Mirov nehêl û bin destê hinek hêzên ne diyar in, ji ber wê çendê halet û tirsinakiya wan hêzan bi şeweyekî an jî bo şiklekî mîna xewin û xeyal û efsaneyekî nîşan didin an jî bi lêv dikn.
5. Bi alîkarîya hest û xeyalan, rewşên rohî di navbera azadîya temamî de bi Mûzîka peyv û rîtim û reng û hêrsê wêneya wan dikişînin"⁷⁹.
6. "Helbest bi awayekî giştî û hunerî nabe helgirê tu armanceke exlaqî an jî civakî be"⁸⁰.

Yek ji wan rêbazên ku eleqeyeka zêde bi Nostalojiyê ve heye rêbaza Romansîzmê ye, ku Nostaloji bi navka romansîzmê dihête zanîn, çimkî di pîrranîya taybetmendîyan de wek hev in, lê dihête gotin: "rêbaza Sîmbûlîzmê bi Romansîzmê dest pê kirîye, ji aliyê naverokê ve wek hev bûn, lêbelê di şewazê derbirînê de ji Romansîzmê cuda bû, bi awayekî di balxistine ser takekes de tenê bi sedema helbestvanan bixwe û ezmûnên xwedî nebe, ji ber vê çendê zehmetîyeke zêde bû, ku bi awayekî rasterast bibêjin, belkî helbestvanê Sîmbûlîzmê tenê dikare penaya xwe bibe ber wan remzan ku destnîşan diket"⁸¹. Di şiroveyên helbest û mijarên Sîmbûlîzmê nabe tenê bala xwe bidî helbestvanan, belkî divêt ji derveyê xwedî jî ew helbest û mijar bihên şirovekirin, çimkî ew Sîmbûlên di helbestan de dihêne bikaranîn pîrr caran divêt di

⁷⁸ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Da*, r 200.

⁷⁹ Reza Seyd Husênî, *Qutabxane Edebîyekan*, Wergêr: Heme Kerîm Arif, Çapa Yekem, Weşanxaneyê Wezareta Perwrdeyê, Hewlêr, 2006, r 169.

⁸⁰ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Da*, r 202.

⁸¹ Pexşan Sabîr Hemed, *Remiz Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Kirmancî Xwarû Kurdistan Da*, (1970-1991), r 39.

nav mijarên din li pey wateya wan bigerîn, bi taybetî jî mijarên Sofîgerî û 'Îrfanî, çimkî di helbestan de bi awayekî zêde Sîmbûl û remzên ayînî û sirên jiyana û mirinê dihêne bikaranîn, ev yek jî digel Nostalofîya dûrî ji buheştê û tîrsa mirinê yek digire, ku tê de behsa wan Sîmbûl û Remzan dihête kirin, ku di warê mijarên ayînî de hene.

Herweha cureyêke din ji Nostalofîyê gera nav xwezayê û vegeryan ji bo nav xwezayê bû, ku ji aliyê Sîmbûlîzma ve girîngîyêke zêde bi xwezayê hatîye dan û di nav mijara xwe de behsa xwezayê kirîye, çimkî nerîna wan di derbareyê xwezayê wehaye, "pêk dihêt li jiyana me ya rohî, em ku hest dikîn û ev nexşa roha me ye ku ji tiştên derdora me rengvedanê diket, wexta ku mirov ew dîmenên ku dîtîne bi nazîkî hest pê diket, bi kurtasî hemû xweza remiz û Sîmbûla hebûn û jiyana xwedî ya mirovî ye"⁸². Ji ber ku Sîmbûlîzma xwe bi beşek ji xwezayê dizanî û bi tiştêkê nemir û zîndî dida zanîn, wate xweza ji aliyê Sîmbûlîzma ve weke alaveke zîndî dihate serederî digel kirinê, ji bo wan xweza remzek an jî nîşaneyêke ji bo hebûna wan, Sîmbûlên xwezayê dikare remiz û nîşaneyên hebûnê weke remzeke nediyar a jiyana lê binêrin, ev çende jî wê wateyê didet her vegeryanek ji bo xwezayê dikeve nav Nostalofîyê di her rêbazekê de be, ji ber ku xweza Sîmbûl û nîşaneyê nihênîyêke veşartî a jiyana ye. Herweha her vegeryaneka Nostalofîyê ji bo paşerojê çendek ji remiz û nîşaneyan ji xwe digire, herweha tu helbestek nîne ku xwe ji remzan bide paş an jî tu helbestek nîne ku remiz û nîşane di nav de nebin. herweha peyv bi xwe jî remzin wate ew wateya ji peyv çê dibe ji çend remzekan pêk dihêt. Li vir de jî tê wê wateyê ku Sîmbûlîzmê girîngîyêke zêde bi rewşên Derûnî yên mirovan daye, pêkol kirîye bi rêya remiz û nîşaneyan hest bi êş û azarên Derûnî yên mirovan bikin û di nav têkistên xwe bidin berçav, lê bi awayekê ne rasterast û bi şeweyê remiz û Sîmbûlan, Nostalofî jî eleqê bi Saykolojîya mirovan ve heye û diyardeyêke Derûnî ye ku xem û êşên mirov dide zanîn.

Nostalofî eleqeyêke xurt bi rêbaza Sîmbûlîzmê ve heye, çimkî Nostalofî bi awayekê giştî bi rêya remiz û Sîmbûlan dihête derbirîn, bi taybetî jî di wan cureyên Nostalofîyê ku behsa efsane, dîrok, folklor, siyasî û kesayetîyên neteweyî û ayînî diket, ku ev mijare pîrr in ji hestên Nostalofî, herweha ev cureyên Nostalofîyê bi awayekî zêde bi rêya remiz û nîşaneyan dihête derbirîn, wate helbestvan ji bo têkista xwe an jî ji bo helbesta xwe xêrê ji wan dû mijaran dibîne. Xuyaye her serdemek li

⁸² Reza Seyd Husênî, *Qutabxane Edebîyekan*, Werger; Heme Kerîm Arif, r 164.

serdemên dîrokî bi rêya çend nîşane û remzan dihête nas kirîn, herweha mirovên her cihêkî jî bi çend nîşaneyên taybetî dihêne cuda kirin ku ji nîşaneyên mirovên neteweyêke din cuda ye, helbestvan jî ji bo mijara xwe û helbesta xwe bala xwe dide ser wan nîşane û remzan ku wan serdeman li hev cuda diket.

1.5. Nostalojî Di Edebyatê De

1.5.1. Nostalojî Di Edebyata Ewropayê De

Di dirêjahîya dîrokê de Ewropa di nav gelek serdem û çaxên curbicur û ciyawaz derbaz bûye, her serdemek ji wan serdeman jî guhartinên mezin û dîrokî di nav de serheldaye, herweha pirranîya ew bizavtin û rêbazên Edebî ku di cîhanê de hene, destpêka wan di Ewropayê bûye bûye, Nostalojî jî ji bo cara yekemîn di Ewropayê weke zaraweyêke Pizîşkî serheldaye, pişt re digel borîna demi Nostalojî derbaz dibe nav cîhana Edebyatê û girîngîyeke zêde ji xwe re peyda dike û di nav nivîskar û vekolerên Ewropayê de dibe mijareke serekî û bi awayekî zêde di nav vekolînên xwe bal didine ser Nostalojîyê, bi vî rengî Nostalojî di Ewropayê dibe cihê girîngîyê, ji ber ku nîşaneyên wê di nav hemû berhemên nivîskar û helbestvanan de derdikevin, lêbelê li vir emê li ser wê yekê bisekinîn ka çawa Nostalojî di Ewropayê weha bûye mijareke girîng û cihê bayexê, ka ew rêya Nostalojî tê de derbaz bûye di Ewropayê çawa bûye û sedemên wê zêde bûnê çi bûye.

Ewropayê dîrokeke pirr dirêj digel şer û pevçûnan de heye, lêbelê şerê cîhanîyê yekem û şerê cîhanîyê duyem di setsala 20an de wêranîyeke pirr dijwar di Ewropayê de çê kir û ew şer bûne sedem ji bo mirina hejmareka pirr zêde ji mirovan û herweha gelek bajêrên mezin jî wêran bûn. herweha şorişa pîşesazîyê jî di welatê Ferensayê bi yek ji mezntrîn û karîgertirîn bûyerên cîhanê dihête zanîn, ku piştî wê şorişê Ewropa ber bi serdemeke din ve ji bo jiyana û pêşketinê çû, bi awayekî weha ku mirovan gund û bajêrên biçûk vala dikirin û berê xwe didane wan bajarên mezin û pîşesazîyê daku ew jî têkeli jiyana sermayedarî bibin û digel wan kar bikin. Herweha piştî şerê cîhanîyê duyem, Ewropayê berê xwe da jiyaneke xweştir, ev çende jî bû sedemê hindê ku li hemû welatên derveyê Ewropayê berê xwe bidin jiyana Ewropayê, wate ew mirovên ku di welatê xwe de jiyaneke ne baş û dijwar didomand berê xwe dane Ewropayê û bûne koçber li ser welatên Ewropayê. "digel vê yekê jî bi awayekî berfireh koçberî ber bi Ewropayê ve çon di salên 1960an de, Ewropayê xwe ber bi

guhartinên mezin ve kişand ji alîyê akincî bûnê ve, di cihekê weha ku digel guhertinên wan welatan cudahî hebû, herweha bû sedema têkel bûna gelek kulturên li hev cuda"⁸³. Ev bûyerên bi lez li Ewropayê weha dikir ku jiyana ber bi hizreka din ve biçê, ew jî hizra poşmanîyê û hizra vegeryanê ji bo serdemên berê bû.

Nostalojî digel van guhartinên di dîroka Ewropayê de, ku bi awayekî lezûbez çê dibûn, bû sedemê hindê ku hestên Xerîbî, diltengî, hesret, xwezîyên zaroktîyê, hizra xizim û dostan, ..htd, bi awayekî berfireh di nav hemû civakên Ewropayê de derkeve holê, ev hest û sozên Nostalojî jî ne tenê ji alîyê mirovên civakê an jî çîneka taybet bû, belkî di nav hemû çîn û civakan de derket, bi taybetî jî di nav çîna rewşenbîran de ku nivîskar û helbestvan û vekoleran vedigire. Nimûne jî bo wan nivîskarên berniyas ku berhemên wan Nostalojî tê de hebûye di nav Ewropayê de evin, di Ferensayê "Hogo, Balzak, Bodlêr, Lamartîn, Romana Namoyî ya Elbêrt Kamo û herweha di nav Edebyata Îngilîzî jî berhemên Koldirîc, Şillî, Bob Ray û Bayrun"⁸⁴. Ev nivîskarên ku li jor hatine destnîşan kirin, pirranîya wan bi sedema wan guhartinan ku di serdemên cuda yê Ewropayê qewimî bûn rastî hestên Nostalojîyê hatibûn, bi taybetî jî nivîskarên welatê Ferensayê, çimkî digel serheldana şorişa Ferensayê ew jî bi şêweyekê rasterast rastî bandora wan guhertinan hatin, ku ew şoriş bi yek ji mezntirîn guhertinên dîroka Ewropa û cîhanê dihêt ji alîyê hizir û dîroka pêşveçona pîşesazîyê, herweha şerê cîhanîyê yekê û didûyan jî bû sedema hindê ku rewşa Saykolojîya mirovên Ewropayê xerab bibe, çimkî gelek bajêr û gund wêran bûn, herweha bi milyonan mirov jî bûne qurbanîyên wan şeran, ku dijwarîyeke pîr zor ji mirovên Ewropayê re anî, herweha êşa ji destdana xizim û bira û hevalan zêdetir rewşa Saykolojîyê li ba mirovên Ewropayê zêde kir, ku hesretên kur û xemeke zêde dida mirovên wan, ji bilî wan jî ku mirovên wan bûyn qurbanî yê din jî rastî hestên nexweş hatibûn bi sedema wêran bûna ew bajêr û gundên ku berê jiyanê xweş tê de hebûye, lêbelê piştî wan şer û wêrankarîyan tu ciwanîyek di wan bajêr û gundan nemabûn ji bilî wan alavên ku di şeran de ji wan deran re bi cih mabûn, ku ew jî careka din hestekê Nostalojî dida wan mirovan û şer û ji destdana mirovan bi wan alavan di anî hizra mirovan.

⁸³ Jan Willem Duyvendak, *The politics of Home*, University of Amsterdam, Netherland, 2011, r 23.

⁸⁴ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'ri Hawçerxi Kurdî Da*, r 148.

Li vir de yek ji wan berheman emê bidin berçav ku di setsala 20an de di Ewropayê de berhem hatîye, ku naveroka wê girêdayî Nostalojîyê ye an jî bûyerên nav vê berhemê bi pirranî yadgarî û hesretin ji bo demekê bi serde çoyî û hemû bîranînên wê hestên Nostalojîyê çê dikin. Nimûneyek ku helgirê nîşaneyên Nostalojîyê ye, Romanek e bi navê *Lêgerîyan ji dîv demê ji dest çoyî* ku ji aliyê nivîskarê Ferensî Marcel Proust⁸⁵ ve hatîye nivîsandin li sala 1908-1909, ev Romana nivîskarê Ferensî ku ji heft bergan pêk hatîye û her yek li wan bergan jî navekê taybet bi xwe hebûye.

Beşek ji mijar û naveroka vê Romanê li ser wê yekê diçe ku karakterê serekî yê Romanê çawa ji dîv xwarina kêkekê ye, ku ew kêk xwarineke taybete ji bo karakterê serekî, çimkî di demê ku ev leheng wê kêkê dixwe bîranînên wî yên demê zarokîniyê dihêne bîra wî ku ew yadgarî yên demên berê ne û digel xaleta xwe de jiyaye û rabirdûyeke pirr şêrîn hebûye di wî demî, ku di wan rojên berê de pirr bextewer bûye, ne mîna niha ku mêrekê bêzar û mandîye ji vê jiyane, ji ber vê çendê xeman ji bo wê rabirdûyê û wî demê şêrîn dixwe, ku di niha de ew dilxweşî û bextewerî li ba wî nemane.

Ev Roman ku beşek ji mijara wê, bîranînên rabirdûyê ne bi awayekî zêde bûyerên wê girêdayî mijara Nostalojîyê ye, herweha vegeryan ji bo zemenê berê bi sedema xwarina kêkekê an jî bêhin kirina kêkekê ye ku di zarokîniyê de derbazî nav ezmûna jiyana vî lehengî bûye û beşek ji wan guhertina dide berçav ku digel borîna temenê mirovan dihêne ji destdan.

1.5.2. Nostalojî Di Edebyata Kurdî De

Zaraweya Nostalojîyê di Edebyata Kurdî de zaraweyeke nû ye, ev zaraweye heta niha jî weke mijareke diyar û berçav ji aliyê vekoleran ve vekolîn li ser nehatîne encamdan. Herçend ku Nostalojî di nav berhemên Edebî yên helbestvanên Kurd pirr in û bi awayekî piranî û giştî Nostalojî di nav berhemên helbestvanên Kurd yên Klasîk û Modern de hene, "nivîskar û helbestvanên Kurd jî çendek ji berhem û dîwanên puxt û hûr yên pirr buha hene, tenanet hinek helbestvan û nivîskar xema xerîbîyê û

⁸⁵ Marcel Proust nivîskarekê Ferensîye li sala 1871 li welatê Ferensyê ji dayk bûye, di sala 1922 li bajêrê Praîsa paytexta Ferensayê koça dawîyê dike, berhema wî bi nave lêgerîn li dîv demê ji dest çoyî, ku berhemeke navdar ye vî nivîskarîye û navê vê berhemê bi inglîzî (In Search of Lost Time) e ku li şeş bergan pêk hatîye û her bergêk jî behsa mijarekê dike.

vegeryan ji bo rabirdûyê û rakirin ji rastîya jiyane û aciz bûn ji jiyana Moderin û berhemên şaristanyetên nû, yê bûyn xasyet û pîrensîpên diyar û taybetî di nav têkistên wan de"⁸⁶. Wate ev hestê Nostalojî bi awayekî zêde li ba helbestvanên Kurd rengvedan kirîye, di hemû serdeman de û bi sedemên cuda cuda ev hestê Nostalojî derketîye. Weke nimûne jî ji bo hinek li wan helbestvanên Kurd, evin: *Qesîdey Şarî Siwarey Îlxañî Zade, Çepkêk Gul bo Sit Fatîme* yê Ehmed Herdî, *Qurbanî Tozî Rêgetimî Nalî, Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ..htd. Herweha gelek ji wan berhemên di welatên xerîbîyê û di nava jiyaneke pîrr dijwar hatîne nivîsandin û çendek ji wan berhemên jî di nav welatî ve hatîne nivîsandin, di nav hemû berhemên de jî nîşaneyên Nostalojîyê hene û berçav in, lêbelê bi mixabinî ve li alîyê vekoleran ve vekolîn li ser nehatîne kirin.

Ji bo ku zêdetir Nostalojîyê di nav Edeba Kurdî de nas bikî û bidî berçav, li vir de emê Nostalojîyê bi çar nimûne yê çar helbestvanyên Kurd bi kurtasî şirove bikî, herweha li gorî çar serdem û çar herêm ên cuda yê Kurda emê van helbestvanan wergirî û bi mînakê wê şiroveya helbestên wan bikî, ew çar helbestvanên navdarên Kurd ev in, Melayê Cizîrî, Nalî, Siwarey Îlxañî Zade û Ceger Xwîn in.

Melayê Cizîrî⁸⁷ bi navdartirîn helbestvanê Kurd dihête nas kirin, ku yekemîn Dîwana helbestan bi navê xwe kirîye an jî dikarî weha bibêjî, ku yekemîn dîwan bi awayekî pîrr û têr hatibe nivîsandin dîwana Melayê Cizîrî ye.

Herçend Cizîrî bi helbestên xwe yê 'Eşqa xwedayî û Sofîgerîyê dihête nas kirin, lêbelê ew jî mîna pîrranîya helbestvanên din yê Kurda dîr nabûye ji xem û êşan, xem û êşên veqetyanê ji hezkirîyên xwe, veqetyan ji war û cihê ku tê de mezin bûye. Ku ev bûyerên weha dibin sedemê çêbûna hestên Nostalojîyê, ji bo hestên Nostalojî li ba Melayê Cizîrî nîşan bidî wê helbesteka wî bi navê *Senema Sorr ji Semed* bidî şirove kirin, "ew diyar diket kanê çawa cemala mehbûbê ew xerqa deryaya 'Eşqê kir, herweha behsa wan karan diket yê vê Eşqê li wî kirî"⁸⁸, ku Cizîrî di

⁸⁶ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Da*, r 156.

⁸⁷ Melayê Cizîrî navdartirîn helbestvanê Kurd e di dîroka Edebyata Kurdî de, Melayê Cizîrî naznavê wî ye û navê wî yê dirstî, Şêx Ehmed e, di sala 1567ê hatîye dinyayê, herweha melayê Cizîrî hinek naznav hebûne, wek; Cizîrî, Mela, Melê û Nîşanî ku pitirya wan naznavan bixwe di nav helbestên xwe de amaje pê kirîye. Herweha Melayê Cizîrî di sala 1640ê de li bajarê Cizîra Botan koça dawîyê kirîye.

⁸⁸ Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Bergê Çare, Weşana Ehmedê Xanî, Çapa Yekem, Soran, 2018, r 207.

vê helbestê de wan sirr û nihênfyan dibêje ku di navbera wî û dulbera wî qewmî ne û wan êş û nexweşyan bi vê helbestê di nav dilê xwe davêje derê, dema dibêje:

Bê hesab şox û şepalê li melê qehr û xeder kir

Ne em anîne xeyalê ne li halê me nezer kir

Qet nekir şefqe libasê xezebê zêde di ber kir

'Illeta cewr û cefa û elemê cih li ceger kir

'Elandîn di firaqê sitemê sine biker kir

Ah hetta mirinê ev ji me ra dax û keser kir

Sefera Şam û 'Iraqê li me xweş lazim û fer kir

Bi me da jehr û reqîban di devî şehd û şeker kir

Em bûyîn pêt û pereng lew ji wisalê me hezer kir

Nazik û ney şeker û xûb û şîrîn qedd û hudûdê⁸⁹

Herçend Melayê Cizîrî bi helbestên xwe yên Sofîgerî û 'Eşqa xwedayî dihête nas kirin, lêbelê Cizîrî jî mîna her mirovekê din xwediyê hestên taybetî yên xwe bûye li hemberî mirovekê din, wate evîna keçekê di dilê wî de heye. "bextê min reşe û ez nahêmin hizra wê. Awirekê jî ji min venade û digel vê yekê jî libasê xezebê yê li xwe kirî û derdê min girantir dike. Derd û kovanên pîrr bi jan in û ji nav kuratîya cergê min cihê xwe xweş dikin"⁹⁰, Cizîrî gilî û gazenda ji bextê xwe dike, çimkî weha hizir diket ku mirovê jê hez dike û evîna wê di dilê xwe helgirtîye, ew êhmal kirîye û ji halê wî napirse, ev girngî nedane jî bi halê Cizîrî bûye sedem ku Cizîrî bi xem bikeve û hesreta ji evîna xwe re bixwe.

Herweha li gorî vê helbesta Melayê Cizîrî bi sedema wê evîne ku di dilê wî de heye aware bûye û ji warê xwe dûr ketîye, "ji bo dîtina xwe min di xapîne û her dibêje evro ne sibê. Ev hînan û birina ku ew bi min dike, daxa dilê mine heta mirinê. Li ber ew derdê derûnî yê ku min heye, aware bûm, heta Şam û Îraqê çûm"⁹¹. Wate bi sedema vê 'Eşqê ku di dilê melayê Cizîrî de çêbûye, Cizîrî li bajar û warê xwe dûr ketîye, wate merema Cizîrî ewe ku dibêje ji ber ew rewşa Derûnî û Saykolojî ku li nav dilê wî de çêbûye neçar maye biçe ji welatê xwe û sefera şam û 'iraqê bike. Dibe ew

⁸⁹ Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, r 222.

⁹⁰ Hejarî Mukiryani, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Tehran, Çapa Yekem, 2014, r 634.

⁹¹ Hejarî Mukiryani, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, r 634.

halet û barê nexweş ku rastî dil û derûnê melayê Cizîrî hatîye nîkarî bûye xwe li ber bigire û di derheqê hindê xwe dûr êxistîye. Herweha dihête gotin mîrê Cizîrê digel Melayê Cizîrî hinek pîrsgirêk digel yek hebûne, ew pîrsgiryek jî ewe ku hatîye zanîn ew keça melayê Cizîrî jê hez dike keça mîrê Cizîrê bûye, ew "Eşqa Melayê Cizîrî jî ji bo keça Mîrî bûye sedemê hindê ku nexweşî di navbera Mîrê Cizîrê û Melayê Cizîrî çê bibe, ku dibe sedema hindê mîr Melayê Cizîrî ji Cizîra Botan derbêxe.

Nostalojî di helbestên Melayê Cizîrî rengvedan kirîye, çimkî Nostalojî bi sedema 'Eşiq û mirin û aware bûn û dûrketin ji bajar û gundên xwe çê dibe. Cizîrî jî helbestvanekê ku evînî kirîye, lêbelê evîna wî ne gehiştîye cihê xwe û bi armanca xwe negehiştîye, herweha Cizîrî ji bajarê xwe jî dûr dikeve û rewşa awareyî û dûrketinê ji warê xwe dîtîye, 'Eşqa xwedayî û jiyana Sofîgerî jî ku dibe sedema çê bûna hestên Nostalojî li ba mirovan di rewş û haletên taybet de. Wate em dikarî bibêjîn diyardeya Nostalojî li ba kevintirîn helbestvanê Kurd heye, ku xwedîyê yekemîn dîwanêye di dîroka Edebyata Kurdan de, ew jî Melayê Cizîrî ye.

Nalî⁹² helbestvanekê navdarê nav dîroka Edebyata Kurdî ye, Nalî helbestvanekê kilasîk e, bi astê xwe yê bilind di vehandîna helbestan û di warê rewanbêjîyê û tesewifê berniyase.

Herçend ku temenê mirov ber bi jor helkişe, mirov zêdetir dixwaze vegere jiyana zaroktîya xwe. herweha li ba hemû mirov û neteweyan cihekê taybet heye ku ji bo wan pîroz e, dibe ew cih çiyayek, newalek, deştek, rûbarek, gund û bajêrek be ku ji wan re pîroz be. Li ba Nalî ew cih pîroze ku tê de mezin bûye û xeyal û helbestên xwe li ser ava kirîne, ew jî bajêrê Silêmanîyê ye. Xuyaye li ba her mirovekî cihekê pîroz heye ku tu carî nikare di dilê xwe de bavêje derê, ew cihê pîroz jî li ba Nalî bajarê Silêmanîyê ye.

Nalî di helbesta xwe de bi navê *Qurbanî tozî rêgetim* dixwaze bi rêya xeyalê vegere zemanê azadîya welat û zemenê kû ew tê de kêfxweş bûye. Ew demê ku Nalî ev helbeste nivîsandîye di welatê xerîbîyê de bûye. Dema Nalî sefera Hecê dike û diçe mala xwedêyê û ferîzeyê heca xwe dike û vedigere, di rê de xeber digêje wî ku Mîrektîya Baban ji nav çûye, bajarê Silêmanîyê jî ku Paytextê mîrektîya Baban bûye

⁹² Nalî helbestvanekê navdarê nav Edebyata kilasîka Kurdan e, navê wî yê dirstî Xidir e kurê Ehmedê Şaweyî Alî begî Mikayelîye. Li gundê (Xak û xol) li deşta Şarezûr hetîye dinyayê di sala 1800ê de, herweha di sala 1873ê de li bajarê Istenbolê diçe ber rehma xwedêyê.

hatîye dagîr kirin. Nalî jî ji ber 'Eşqa xwe ji bo welat û axa pîroz dikeve vehandina xema dilê xwe û dikeve wesfa rûbar û kanî û xwezaya welat, ku bi hesret û sozeka pîrr weha dibêje:

Qurbanî tozî rêgetim ey badî xoş mirûr

Ey peykî şareza be hemû şari şarezûr

Ey lutfeket xefiy û hewa xwah û hemdeme

Wey sirweket beşarefî sergoşeyî hizûr⁹³

Di destpêka helbestê de Nalî xemên xwe dispêre Bayê, çimkî Ba diçe nav hemû cihan û tu astengek li hemberî Bayê nîne, mebesta Nalî jî dibe tenê Silêmanî be weke cihekê taybet di dilê wî de an jî merem jê hemû welat be ku xemeka giştîye. Nostalojîya Nalî li vir de bo ji navçûna deshelatdarîya Kurdane ku Kurdan bixwe welat bi rêve birîye, dema hatîye ji nav çûn Nalî jî rastî êşeke derûnî û xemeke kur hatîye. "zemenê nivîsandina vê qesîdeyê vedigere ji bo naverasta setsala 19an, ku Nalî ji sefera Hecê vedigere welatê Şamê. Di wê demê ev bûyer bi ser Kurdan dihêt eskerên Osmanîyan êrîşî ser deshelatdarîya Baban diken û dihête jinavbirin"⁹⁴.

Herweha Nalî li ser vê qesîdeya xwe didome û dihête ser baskirina wan cihên Silêmanîyê ku bîranînên xweş digel hene û wesfa cihên seyranîyên silêmanîyê û derdora wê dike, ku cihên xweş in û mirov qesta wan cihan dike ji bo borandina demekê xweş ku dibêje:

Wek ahekem rewan be heta xakî koyî yar

Wek eşkekem rewan be heta awî Şîwesûr

Bew awe xot bişo le kudûratî serzemîn

Şad bin be weslî yekdî ke toy tahîr ew tehûr

Emca meweste ta degeyye 'eynî serçinar

Awêke pîrr le nar û çinar û gull û çinûr

Çeşmêke mîslî xor ke le sed cê be roşinê

Fewranî nûrî safe le ser berdî wek bilûr

Ya 'eksî asmane le awêneda kewa

⁹³ Mela Ebdulkerîmî Muderîs û Fatîh Mela Kerîm, *Dîwanî Nalî*, Çapa Dûyê, Tehran, 2010, r 140.

⁹⁴ Rehîm Luqmanî, (*Nalî û Nostalijî*), Govarî Zirêbar, Hejmara 79, Îran, Merîwan, r 162.

*Estêrekanî rabikişên wek şehabî nûr*⁹⁵

Nalî yada xwezaya Silêmanîyê û derdora wê dike ew jî bi nav hînana wan cihan ku navên seyrangehan dihîne wek: (Şîwesûr, Serçinar) ev dû nave, dû seyrangehên silêmanîyê ne, herweha navê (Nar, Çinar, Gull, Çinûr) ku ev jî navên giya û darên wê derêne, ku dîmenkê balkêş didin wan seyrangehan. Nostalojîya Nalî pirr kûr e, ku bi axîneka kûr û bi hesretekê zêde wesfa wan cihan dike.

Dema Nalî dizane mîrektya Baban ji nav çûye, êdî hîs dike ew bajêrê cara û ew xweşîyên cara di nav wî bajêrî nahêne bi destanîn, lewma wê qerarê dide ku venegere û berê xwe dide jiyana xerîbîyê. Ev çende jî hestên Nostalojî li ba Nalî zêde diken, Nostalojîya neteweyî û hest û nexweşîyên xwedî hemû li ba wî çê dibin, ku ew hestên Nostalojî hemû di vê qesîdeyê rengvedan kirîye û hestên xwe bi awayekî aşkera di nav vê qesîdeyê vehandine.

Siwarey Îlxañî Zadeh⁹⁶ helbestvanekê girîngê Rojhilata Kurdistanê ye, ku di jiyana xwe de pirr nexweşî dîtîne û rastî dijwarîyên zêde bi sedemên curbicur hatîye. Herweha ew nexweşîyên ku wî dîtine bi cureyekî li curan di nav helbestên wî rengvedan kirîye.

Siwarey Îlxañî Zadeh, di helbesteka xwe de bi navê *Şar* bala xwe dide ser jiyana dû cihan û dû jîngehên ji hev cuda, herweha cudahîya navbera ev dû cihane jî di nav helbesta xwe dide bas kirin ku astê jiyana bajêr û gund e, herweha jiyana mirovan û ciwanîyên gund û xwezaya gund dide berçav. Siwarey Îlxañî Zadeh ji bo xwendina zanîngehê berê xwe dide bajarê Tehranê û li wir bi cih dibe, têkelî jiyana bajêr û dijwarîyên wê dibe, ev dijwarî û nexweşîyên ku li wir de rastî wî dihên, di helbesteka xwe de hinek ji wan dijwarîyan bas dike, ew helbest jî qesîdeya *Şar* e ku di sala 1973ê de nivîsandîye. Dibêje:

⁹⁵ Mela Ebdulkerîmî Muderîs û Fatîh Mela Kerîm, *Dîwanî Nalî*, r 143.

⁹⁶ Siwarey Îlxañî zade kurê Ehmed axayê kurê Hacî Bayîz axay Îlxañî Zade ye, di sala 1937ê li gundê Turcan ku dikeve derdora bajarê Bokan li Rojhilata Kurdistanê hatîye dinyayê. Siware di jiyana xwe de nexweşîyên pirr dibîne, ku hêj zaroke diya wî diçe ber dilovanya xwedêyê û herweha di sala 1954ê de rastî nexweşîyeke giran dibe û ji bo 3 salan dikeve nav nivînan, herweha di sala 1964ê de ji alîyê hukmeta îranê dihête zîndanî kirin piştî eşkencedaneka zêde dihête azad kirin. Di sala 1976ê de dema di rêya vegeryana mala xwe de hevaleyê wî bi otombêla xwe dide ser wî û piştî çendekê di wê sale de li nexweşxaneyekê li bajarê Tehranê diçe ber dilovaniya xwedêyê û li bajarê bokanê dihête veşardin.

(Şar)

Gullim

Dillim pirre le derd û kul

Elêm birom le şareket

Elêm be camî awî kanyawî dêyekem

'Îlacî kem kulî dillî pîrr im, le derdî întîzareket

Werez bû giyanî min le şar û hare harî ew

Le rojî çillkinî nexoş û taw û yawî şew

Elêm birom le şareket

Le Şari çaw leber çiray nêwan şewareket

Birome dê, ke mangêşew bizête naw bizem

Çilon bijîm le şareket

Ke pîrr be dill dijî kizem

Le şareket, ke remzî asin û minareye

Melî ewîn xewareye

Elêy le dewrî dest û pêm

Ewey ke têl û tan û rayele, kelepçeye

Ewey ke peykere mîsalî dawelle

Ewey ke dare têle, mezherî qenareye

Le şareket kemendî dûkele

Ke dête der le malî dewlemend

We tîşkî bê gunahî xoretaw exate bend

Le her şeqam û kuçeyek şeporrî şine dê berew dilim

Destî germî aşna nîye ke eyguşim

Destî çewî ye

Le şareket zelîle Şêr

Bawî rêwî ye

Be her nîgayek û petayeka

Elêm birom le şareket

Gullim herêmî zong û zel

Çilon ebête carregull

Le şarî to, le banî 'erşe qonderey diraw

*Şareket aske ciwanekem teske bo ewîn*⁹⁷

Ev helbest weha dest pê dike, ku helbestvan digel evîndara xwe di peyve an jî ji bo evîndara xwe dipeyve û dixwaze peyama xwe bide destê Evîndara xwe, lewma dibêje; *Gula min, dilê min pîrr kul û derd in, dixwazim ji bajarê te herim*. Helbestvan di nav jiyana bajêr û dilreqîya mirovên bajêr hîlak bûye, êdî dixwaze ji vî bajêrî here û berê xwe bide jiyana gund, ku tê de mezin bûye, dixwaze derd û kulên xwe ji nav xwezaya ciwan û ciwanîyên gund çareser bike, herweha di forma helbestê de weha xuya dike ku helbestvan ji evîndara xwe bêzar be û ew sedemê wan nexweşîyan be, lêbelê mebesta helbestvanî ew kes nîye, belkî "mebest lê ew jîngehe ku tê de dijît û helbestvan bi eslê xwe di nav jîngeha din mezin bûye û ji jîngeha bajêr û pîşesazî û amêran bêzare"⁹⁸. Herweha helbestvan di helbesta xwe de hinek peyvên dibêje, ku remzên dilreqî û dijwarîya jiyana bajêrî ye, weke peyvên Asin, minare ku remze ji bo bîna û malên beriz, têt, kelepçe, dûkel û doman, ..htd ku tê wateya jiyaneke dijwar û nexweş, tê wateya bê buha bîna mirovan, ji ber ku dibêje dûkel û toz berê rojê digirin ku merem pê ew kargeh û alavên pîşesazîyê ne, ku dibin sedemê çê bîna toz û domanê, herweha çê bîna wan tiştan jî mirov sedeme jê re, lewma ew jî ji jiyana jîngeha bajêr bêzare û dixwaze ji vî jîngeha dijwar derkeve. Herweh bi xemeke kur dibêje evîndara xwe, bajêrê te ji bo evîniyê nabe, tenê cihê xem û xefetane. Xuyaye evîndara wî xelkê bajêrîye û di nav mirov û jîngehekê nexweş mezin bûye, lewma weha li ser di peyve ku ew jî beşeke ji jîngeha bajêr û nexweşîyên wê.

Ev helbest pîrr e ji hestên Nostalojîyê, her tiştê derdora helbestvan wê yekê didin nîşan kirin ku helbestvan di nav nexweşîyeke zêde deye, Saykolojiya helbestvan xerab bûye, helbestvan hemû rûyên bajêr bi nexweşî bas dike, dixwaze ji nav jîngeha bajêr xwe derbaz bike û vegere nav jîngeha gund, dixwaze êdî ji ava kanîyan û jiyana xweru xweşîyan bibe. Sedemên Nostalojîyê di vî helbestê de pîrr in, dûrketina

⁹⁷ Siwarey Îlxañî Zade, *Xewe Berdînekan*, Çapa Yekem, Weşanxaneyê Selahedînî Eyubî, 1372, r 27-28.

⁹⁸ Eta Qeredaxî, *Govarî Raman*, Hejmara 262, Hewlêr, 2019, r 71.

helbestvan ji gund û warê xwe, li hev nehatina jiyana berê ku di gund de bûye digel jiyana niha ku di bajêr de ye, nebûna rehmê di bajêr û nebûna eleqeyên civakî di nav jîngeha bajêr de, cudahiya jiyana dewlemend û dilreqîya dewlemndan li hemberî mirovên hejar û xweru, xerîbî kirina jiyana gund û ..htd. Wate di nav tenê helbestekê de gelek cureyên Nostalojîyê dihêne pêşçav ku ev hemû hestên Nostalojî wê yekê dide piştrast kirin ku helbestvan di nav jiyaneke pirr dijwar de jiyaye, jiyana bajêr pirr zorî ji bo helbestvan anîye û hertim di nav nexweşîyan de bûye.

Ji alîyê Rojavaya Kurdistanê jî hestên Nostalojî bi awayekî zêde rengvedan krîye, ku ji wê parçeya Kurdistanê jî li ber zordarî û bindestîyê, hestên Nostalojî li ba Kurdan û bi awayekî zêdetir li ba helbestvanan rengvedan kirîye, ku emê niha bi nimûneyekê ji helbesteka helbestvanê navdarê Kurd Cegerxwîn⁹⁹ bidîn şirove kirin.

Cegerxwîn bi helbestvanekê neteweyî dihête hejmartin, ji ber ku pirranîya helbestên wî naverokeke neteweyî û nîştimanî heye, eve jî ji bo hestê wî yê bilind vedigere li hemberî welatê xwe û hertim hestên xemgînî û dilşewatî li ba wî hebûye, hestê Nostalojîyê jî weke diyardeyeke Edebî û bi cureyên xwe ve di nav helbestên wî xuyane, lê li vir emê bi nimûneyekê nerîn û mebesta xwe li ser hestên Nostalojî li ba Cegerxwîn bidîn pêşçav.

Kurdistanê Kurdistan

Baxçê gula, derdê dila

Îro maye bin destan

Kurdistana bilind î

Hemî bajar û gund î

Herçî kesê te bixwazî divê xwe bi te dî

Kurdistanê Kurdistan

Baxçê gula derdê dila

Îro maye bin destan

Kurdistana pirr xweş î

Xweş dicle û Nêrdoş î

⁹⁹ Cegerxwîn: Helbestvanê Kurd î herî navdar ê sedsala bîstan e. di sala 1903an de li gundê Hesarê yê li ser Kerçosê Hatîye dinyayê. Nave wî yê eslî Şêxmûs e. 22yê Cotmeha 1984an wefat kir. Gora wî di hewşa mala wî ya li Qamişlo de ye.

Namûs di serê wî nîn e

Ê te arzan bifroşî..¹⁰⁰

Cegerxwîn di vê helbesta xwe ya bi navê (Kurdistan) digel wê yekê ku wesfa Kurdistanê dike û bi Baxçê gula û Kurdistanê bi hebûna xwezayeka xweş û pîrr ciwan dide zanîn, lêbelê ew wesif û ciwanî nebûne sedem ku Cegerxwîn ji hestên Nostalojî bê par bibe, sedem jî ewe dema dibêje: Îro Kurdistan maye bin destan. Wate xema bin destîya Kurdan û Kurdistanê xwarîye û hestekê kurê Nostalojîyê li ba Cegerxwînî daye çê kirin.

Bi van Nimûneyên helbestvan, ku li jor me şirove kirin ev yeke aşkera dibe ku hestên Nostalojî di çaxên cuda cuda û di nav hemû parçeyên Kurdistanê rengvadan kirîye û li gorî wan mijar û pîrsgirêkên giştî û xwedî hestên Nostalojî jî hatîne guhartin li ba helbestvanan, lê ya girîng ewe ku hestê Nostalojî di hemû serdeman de li ba helbestvanan çê bûye û di helbestên wan de rengvedan kirîye.

¹⁰⁰ Cegerxwîn, *Kî Me Ez*, Wşanxaneyê Avesta, Çapa Şeşan, Îstanbul, 2014, r 41.

2. Nostalojî Di Helbestên Hacî Qadirê Koyî De

2.1. Jiyana Hacî Qadirê Koyî

Hacî Qadirê Koyî bi yek ji navdartirîn helbestvanên Kilasîzma Kurdî dihête naskirin ji alîyê hestê neteweyî ve, herweha gelek vekoler û nivîskar Hacî Qadirê Koyî bi Ehmedê Xanî yê dûyem didin naskirin, ev jî vedigere ji bo wê yekê ku Hacî xwedîyê hestekê kur ê neteweyî ye û ketîye jêr bandora Ehmedê Xanî jî.

Navê rastî yê helbestvanê neteweyî yê me: Hacî Qadirê kurê Mela Ehmedê kurê Mela Salihê kurê Mela Ehmedê mezine û diya wî bi navê Fatê (Fatim) bûye her weke bixwe di mînaekeke helbesta xwe vê rastîyê ji me re aşkera dike û dibêje:

Bawkim Ehmed bû nawî fikrim dê

Xelqî ladê bû, daykî min Fatê

Sal û cihê ji dayîk bûna Hacî Qadirê Koyî cihê anîn û birineke zêdeye, di hinek çavkanîyan de weke namîlkeya Mela Ebdurrehmanê kurê Muhemmedê kurê Mela Ehmedê mezin de hatîye ku Hacî Qadir di gundê Gorqerecê ser bi bajêrê Koyê di sala 1231ê Koçî de hatîye dinê, ev sale jî li hemberî sala (1815-1816) Zayînî ye.

Dema ku di çavkanîyên din jî li dor sal û cihê li dayîk bûna wî digerin dibînin ji alîyê wan sala 1232ê Koçî bi sala ji dayîk bûna wî dihête destnîşan kirin û ev sale jî li gorî guhertina sala Koçî ji bo Zayînîyê dibîte sala (1816-1817).

Li hinek çavkanîyên rexneyên Edeba Kurdî jî ev yeke hatîye ku Hacî Qadir di sala 1815ê de di gundê Gorqerec û hinek jî dibêjin di sala 1232yê di eynî gund hatîye dinê. Hinek nivîskarên din jî dibêjin: Hacî Qadir di sala 1815ê di Koyê ji dayîk bûye û ji cihê xwe de Gorqerec ve hatîye vî bajarî. Lêbelê ji van dûmahîkan de pirranîya vekolerên Kurd dibêjin di sala 1232ê Koçî = 1817ê Zayînî ji dayîk bûye û hinek jî digel van salan dibêjin ji nêzî Kwêsıncaq û bêy nav anîna cihê ji dayîk bûye.

Hinek vekolerên din jî li gorî temenê hevbajêrên wî dibêjin: dibe di sala 1240ê Koçî ji dayîk bûbe û ev sale jî li hemberî salên (1824-1825)ê Zayînî diraweste.

Li gorî wê yekê ku Hacî Qadir digel Hacî Mela Ebdullayê Celîlzadeh bi hev re ji bo gera xwendinê çû bûn Balekatîyê û Hacî Mela Ebdulla jî aşkeraye ku di sala 1250ê Koçî ji dayîk bûye û ev sale jî li gorî sala Zayînî dibe sala (1834-1835) û ji ber

ku herdû jî hvalên xwendinê bûne, nabe cudahîyeke weha zêde di navbera temenê wan de hebe, yek ji wan di navbera salên (1815 heta 1817)ê Zayînî ji dayîk bûbe û yê din jî di navbera (1834-1835)ê Zayînî ji dayîk bûbe, ku nêzî hejde – nozde salan cudahî di navbera temenê wan heye û ev cudahîya zêde jî wan nake hevalên xwendin û feqêtîyê ji bo navçeya Balekatîyê, ku wan bi hev re ev geryan kirîye, herwekî Hacî Qadir di dawîya jiyana xwe de di Istanbulê nameyeka helbestî ji bo Hacî Mela Ebdullayê hevalê xwe yê xwendinê nivîsandîye û gotîye:

Be fikrit dê zemanê çûyne balek

Be pê xawsî, ne kewşim bû ne kalek

Naveroka vê helbesta Hacî û hevaltîya gera xwendinê digel Hacî Mela Ebdulla de, nerîna wan vekoleran bihêz dike ku dibêjin: dibe ku Hacî Qadir di sala 1240ê Koçî ji dayîk bûbe, çimkî bi vê çendê temenê wî digel Hacî Mela Ebdullayê hevalê xwe de Noh salan ji bo deh salan cudahî dibe. Ev nêzî hev bûne jî di temenê wan de hevaltîya gera xwendina wan bihêztir diket, li hemberî cudahîya hejde ji bo nozdeh salan de.

2.2. Hacî Qadir û Xwendina Melatîyê

Hacî Qadir di temenê zaroktîyê dibe dema babê wî koça dawîya xwe dike, lêbelê divêt wê rastîyê jî bibêjin ku Hacî Qadir di zaroktîyeka weha bûye ku babê wî mirîye, navê wî ji bîra wî bimîne, weke di helbesteka xwe ya pêşî gotîye:

Bawkim Ehmed bû nawî fikrim dê

Xelqî ladê bû, daykî min Fatê

Ku temenê wî bûye heft salî diya wî di mizgefta Muftî di Koyê de li ba Mela Ehmedê Omergunbet danîye ber xwendinê, ew Mela Ehmed xwarzîyê Hacî bûye. Piştî dû salan jî diya wî diçe ber rehma Xwedêy û êdî Mela Ehmed hemû xercîyên xwendina wî dide mile xwe.

Hacî ku destpêka xwendina Feqêtîyê û perwerdeya xwe di Koyê standîye, di havîna sala 1270ê Koçî li hember salên (1853-1854)ê Zayînî de digel Hacî Mela Ebdullayê Celîzade de gera geşteke xwendinê ji bo navçeya Balekatîyê diket û di gundê Şêx Wetman li ba Mela Muhammed Kak Ebdullah dixwîn in û piştî çendekê Hacî Qadir ji Hacî Mela Ebdullayê hevalê xwe vediqete û bi tena serê xwe diçe ji bo Kurdistana Îranê ji bo bajarên Serdeşt û Sablax û Şinoyê.

Hacî heta sala 1279ê Koçî li hember salên (1862-1863)ê Zayînî di Kurdistana Îranê vemaye û di wê salê de îcazeyaya Melatîyê standîye û bi deşta Lacan û bi rêya Balekatîyê da nek bi rêya Suleymanîyê da weke di hinek çavkanîyan de hatîye vegeryaye alîyê Kurdistana 'Iraqê û vegeryaye Koyê çendekê li wir digel Hacî Mela Ebdullayê hevalê xwe û Emîn Axayê Exterîyê helbestvan û Hemaxa de di Koyê dibe ser.

Piştî çendekê ku Hacî Qadir serinc dide hindê ku piştî ev hemû xemxorîya wî ji bo xelkê Koyê û dibîne her hemû bala xwe li hinek şêxên weke Şêx Nebî Mawîlî didin û hember bi helbestvan û xemxorên weke xwe bê emekin û ev bê emekiya wan jî ji alîyê hest û sozê helbestvanan ve bi bê rêzî dihêt danîn û ji ber vê çendê jî qerarê dide Koyê bi cih bêle û berê xwe bide bajarê Îstanbulê, ku paytextê Seltenet û Xelîfatîya Osmanîyan e. Hacî Qadir dema dikeve welatê xerîbîyê jî di çend dêrên helbesteka xwe ya pîrr soz de ev hestê xwe anîye ziman û gotîye:

Le xurbet be şahî le bîr nakre

Zemanî ciwanî û yadî wilat

Le Qoşxanewe ta demi Îçqela

Le bayîzaxewe ta mehellet qelat

Hemû xizmî xomin dezanim dellên

Le bê hurmetîman bû Hacî hellat

2.3. Jiyan Hacî Ya Li Istenbulê

Hacî Qadirê Koyî bajêrê biçûkê Koyê hêla û berê xwe da bajarekê mezinê pîrr ji qerebalixî yê weke Istanbulê.

Bajarê Istanbulê di wê rojê de jî paytextê dewleta Osmanîyan bûye, xala bi yek gehandina rojavayeka pêşketî û eristokiratî û rojhilateka paşketîya dîlê kot û zincîrên derebegî û jêr destîya netewatî û fêlên ayîn firoşan bûye, ev ayîn firoşên ku ayîn kiribû desmala destê xwe û ji bo armancên stemkarîyên xwe wan bikar di anî.

Hacî Qadir di vê bajarê mezin û pêşketî de heyameke dûr û dirêj jiyaye, li wir de gehişte malbata Bedirxanîyan û dibe mamosteyê taybetî yên zarokên vê malbatê, li ba wan dastana Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî xwendîye, di wê dastanê û di derencamê xwendina pertûkên rewşenbîrî yên mijarên nû ku hêdî hêdî li Ewropaya pêşketî

dihatin ji bo Istanbulê û dihatin wergerandin ji bo zimanê Turkîyê û bi nava xelkî de parve dibûn û hizir û hestên neteweyî di dilê wî serhelda.

Puxtêya mebesta me ewe bibêjîn: Hacî Qadir li ber şepola rewşenbîrîya Ewropayê Kurdînî di mejîyê wî de digere û di heman demî de jî hevaltîya digel Bedirxanîyan de bê şik palnerek bûye ji bo serheldana vê Kurdînîyê li ba Hacî Qadirê Koyî.

Herçend Hacî Qadir di jiyana Istanbulê razî nebûye û dilê wî bi çareya Osmanîyan nehatîye, lêbelê weke me got ev jiyana nû di wî bajêrî de guhartineke serekî bi ser hizir û bawerya Hacî Qadir anîye, çimkî ji bilî ku rastî wê şepola rewşenbîrîya Ewropaya pêşketî hatibû di heman demê de jî bajarê Istanbulê di wê demê de cihê kombûna hemû azadî xwazanên nav welatê Osmanîyan bûye ji Kurd û Erebb û Ermen û neteweyên Ewropaya jêrîya rojhilat ku di wê serdemê de di têkoşînê bûne ji bo azadîyê an jî wan xwe ji destê Osmanîyan rizgar kiribû.

Hacî Qadir di wê demê, haya wî ji têkoşîna wan neteweyên li jêr destê Osmanîyan hebûye, ku awirekê ji neteweya xwe dide, dibîne ne tenê berev rizgarîyê nediço, belkî ew mîrektîyên ku hebûn jî ji nav diçon weke:

Hukmetên mîrektîya Baban û Soran û Behdînan û navçeyên Kurdistana jorî bi temamî avêtibûne ser dewleta Osmanîyan. Malbata Bedirxanîyan jî têkoşîneka bi hêz dikir ji bo destxistina mafên neteweya gelê Kurdan. Wate Hacî heta sefera Istanbulê nekir, hizir û bawerya Kurdîyê nebûye û helbestên neteweyî û civakî ne afirandine, çimkî tu çavkanîyek li ber destê me nîne ku wê yekê sererast bike ku Hacî berê biçê Istanbulê helbest li ser van mijaran vehandibin û hizra paşeroja neteweya xwe kiribe.

Hacî Qadir temenekê dirêj jiyaye, li gorî wan nivîskar û vekolerên dibêjin, di sala 1815an de ji dayîk bûye û di sala 1897an jî koça dawîya xwe kirîye, wate 82 salan jiyaye. Herweha bi nerîna wan nivîskaran jî yê ku dibêjin di sala 1817an jî dayîk bûye, divêt ku temenê wî 80 sal bûbe demê mirîye. Bi nerîna mamoste Mes'ud jî weke di pêş de me bas kir, dibêje: egereke zêde heye ku di sala 1824an jî dayîk bûbe. Bi vê hisabê jî Hacî Qadir 73ê salan jiyaye û her sê temenên wî jî wan wesfan piştrast dike dema gotîye:

Ser û rîşim serapa bote loke

Şewê hemrazime pişmîn û koke

Herweha gotîye:

Leber pîrî ewende bê hewasim

Dellêy erkanî Îslamî înasim

Herweke ev yek jî hatîye piştrast kirin ku Hacî di sala 1897an de di bajarê Istanbulê, di awareyî û bê kesîyê de Koça dawîyê kirîye û li berê Uskudar li qebristana Qerec Ehmed hatîye veşardin.

2.4. Nostalojîya Takekesî (Xwedî)

Nostalojîya takekesî di helbestên Hacî Qadirê Koyî de bi pirraniya cureyên xwe ve rengvedaneka berçav kirîye, ku li vir emê li ser hemû wan cureyên Nostalojîya takekesî bisekinîn û bi nimûneyên helbestên di Dîwana Hacî Qadirê Koyî de her yek ji wan cureyan bi çend mînahekan bidîn şirove kirin.

2.4.1. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Serdemê Ciwanîyê

Serdemê ciwanîyê serdemek û çaxeke pîr bi buhaye di temenê mirov de, çimkî mirov di serdemê ciwanîyê de dikeve nav biryar û bi cih anîna xwezîyên xwe, ev jî ji ber vê çendê ye, ku mirov di serdemê ciwanîyê de bihêze û taqeta mirov di bilindtirîn astê xwe deye, digel vê yekê jî mirov di serdemê ciwanîyê de ji alîyê hizir kirin û 'eqlê xwe ve kamil dibin. Herweha serdemê ciwanîyê ew serdeme ku tê de mirov hest bi erk û berpirsiyarîyê diket li hemberî welat, 'Eşiq û evînî jî bi pirranî di serdem û temenê ciwanîyê de çê dibe, an jî dikarîn weha wesif bikîn ku mirov pirranîya biryar û qerarên girîng di jiyana xwe de di serdemê ciwanîyê dide, lewma ev serdem li ba her mirovekî pîr girînge, bi awayekî weha girînge ku mirov ber bi pîrî û kal bûnê ve çû, êdî dikeve yad kirina kiryarên xwe yên serdemê ciwanîyê, îcar heger mirov di serdemê ciwanîyê de şaşî û biryarên xelet di jiyana xwe encam dabin, an jî kiryarên ne baş û xerab di serdemê ciwanîya xwe de encam dabin, wê di temenê pîrî û bê hêzîya xwe de bikeve nav poşmanîya wan kiryanan û xem û hesretan ji bo serdemê xwe yê ciwanîyê bixwe ku bi awayekî ne baş domandîye. Herweha serdemê ciwanîyê ew serdeme ku mirov xweşîyên xwe û şanazîyên xwe jî tê de didomîne, her mirovek

ku temenê wî/wê heldikişê xwezî bi rojên ciwanîya xwe dixwaze, ev yeke jî dibe sedemê bi xem ketin û hesret xwarinê ji bo serdemê xwe yê ciwanîyê, ev bîranînên serdemê ciwanîyê hemû jî hestên Nostalojî ne û Nostalojîyê çê dikin, heger ew bîranîn xweş jî bin û ew kiryarên wî/wê kirîne baş bin û xwe wekî lehengekê qehreman hesab bike di serdemê ciwanîya xwe an jî xwe weke mirovekê bi xem û jan û serdemeke nexweş di jiyana xwe de hesab bike her dikeve çarçoveya Nostalojîyê û bi hestekê Nostalojî dihête hesab kirin. Ev çende jî weha li helbestvanan kirîye ku digel helkişana temenê wan û spî bûna porê wan bikevin nav bîranînên serdemê ciwanîya xwe û bi şanazî ve basê serdemê ciwanîya xwe bikin di nav helbestên xwe de ax û nalîna ji bo wan rojên xweş helkêşin.

Hacî Qadir di helbesteke xwe de bi navê *Mematim Heyate* behsa wê yekê dike ku serdemê ciwanîyê bi tu tiştî nahê ji bîr kirin, heger tu bibî şah û di jiyaneke pîr xweş jî bijî serdemê ciwanî û lawîyê nahê ji bîr kirin, xuyaye ku demê ev helbeste vehandîye di temenê pîrîyê de bûye, demê dibêje:

Tema'im bû dunya û 'uqba bixom

Emim çû le dest û ewim bo nehat

Le xurbet be şahî le bîr nakrê

Zemanî ciwanî û yadî willat (Dîwan, r 60)

Li vir de Hacî Qadir behsa temaha xwe diket û dibêje hêvîya min ew bû, ku ez dunya û qiyametê ji xwe re qezenc bikim, lêbelê digêje wê rastîyê ku dunya ji dest xwe daye û hêj jî negehiştîye qiyametê. "heger di jiyana xerîbî û xurbetê de mîna şah û padşahan jî bijî, hêj mirov nikare tê de serdemê ciwanî û yada welat ji bîr bike"¹⁰¹. Serdemê ciwanîyê bi buhatirîn serdeme ji alîyê her mirovekî, çimkî tê de bihêz û ciwane dikare her tiştî bike ku dilê wî/wê bixwaze, ji ber vê çendê jî mirov nikare vî serdemî ji hizir û bîrên xwe bavêje der heger di temenê pîrî û kalîyê de di astekê bilind û xweş jî be lê her nikare ji bîr bike. Herweha Hacî Qadir di helbesteka din jî vedigere ser serdemê ciwanî û lawîyê dema dibêje:

Were ba bêyne ser basî nîhanî

Be yadî 'eyş û eyyamî cewanî

¹⁰¹ Rêbwar Sîweylî, *Hawkatî û Hawşunasî*, Weşanxaneya wezaretê perwerdê, Hewlêr, 2004, r 42.

Be fikrit dê zemanê çûyne Ballek

Be pê xawsî ne kewşim bû ne kallek

Leber pê m dirk û dar û şax û barî

Wekû mexmer bû nermî ya ne qallî (Dîwan, r 244)

Hacî Qadirê Koyî di vê helbestê de ji bo zemenekê pirr kevin vedigere, serdemekî dihîne bîra xwe û xema ji bo serdemekê dixwe, ku digel hevalekê xwe de bûye û gera hinek cihên Kurdistanê kirîye, ew ger jî di temenê ciwanî û lawîyê de bûye, herweha Mes'ud Mihemed li ser vê helbestê û li ser vê gera Hacî û hevalê wî weha di peyve, "Hacî Qadir û Hacî Mela Ebdulla ev hemû cihe pîvane û xwendin û rabwardin û geran tê de kirîye"¹⁰². Hestê Nostalojîya Hacî Qadir di van dû helbestan de hestekê xemgînî ye di ast rojên ciwanîyê ku di welatê xwe de bûye û xwezîyên xwe bi wan rojan dixwaze, lêbelê niha pîr û kal e, ew roj û ew serdem jî ji destdaye, tenê hesret û xem ji wî re mane û bi xem û kovan ve yada ciwanîya xwe diket.

2.4.2. Nostalojîya Dûrî Li Bajar û Gund

Nostalojîya dûrî li bajar û gund, ji wan cureyên Nostalojîyê ye, ku li ba her kesekî çê dibe eger ew kes ji bajar an jî gundê xwe dûr bikeve, dûrketin û wexer kirin ji bajar û gundan dibe sedemê çê bûna xem û diltengîyê, çimkî ew cihê mirov seferê ji bo dike û ji wî/wê re cihekê nûye ji bo jiyanê, wê hinekî zehmetî be û nikare zû xwe digel ew jîngeha ku niha tê de dijî li hev bîne. Bajar û gund ku mirov tê de hatiye dinê û tê de mezin bûye, qîmeteke zêde heye, ku bi tu cih û bajêrên din cihê wan nahê pirrvekirin, ew ax û ew bûyerên ku li ser bajêrê xwe ezmûn kirî hemû dibin bîranînên xweş û şêrîn. Ev cureyê Nostalojîyê li ba Hacî Qadirê koyî di gelek helbestan de rengvedan kirîye, çimkî Hacî Qadir yek ji wan helbestvana ye ku çend carekan ji bajêrê xwe dûr ketîye ku bajêrê Koyê ye, Hacî Qadirê Koyî jiyaneke bi zehmet borandîye, gelek caran ji bajêrê xwe dûr ketîye, herweha ku ji bo cara dawîyê ji bajêrê xwe vediqete êdî venagere bajêrê xwe, heta dawîya jiyana xwe ji dûrî bajêrê xwe jiyana xwe didomîne. Ev çende jî bûye sedemê hindê ku bajarê koyê di gelek helbestên wî de bibe mijareke xemgîn û hestê xwe yê xemgînîyê bi rêya helbestan ji bo bajarê xwe binvîse.

¹⁰² Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, Bergê Dûyê, Weşanxaneyê Aras, Çapa Dûyem, Hewlêr, 2010, r 30.

Hacî Qadirê koyî di helbesteka xwe de bi navê *Ey Muhemmed* yada bajêrê koyê dike û weha li ser dûrketina ji bajêrê koyê di peyve:

Ey Muhemmed wey emînul dewle îmro Koyî to

Cennetêke kewte dozex herçî lêy dûrkewtewe

Muddetêke derbeder gerdî diyarî xurbetim

Bende yadî astanbosî etoy kird hatewe

Çunke tuhfe lazime her kes le xurbet bêtewe

Bem dû ferde min qezay sed gone tuhfe kirdewe (Dîwan, r 126)

Hacî Qadir bi sedema dûrketin ji bajarê xwe êş û xema dûrîyê bi vê helbestê dirêje, weha wesfa koyê dike ku cennete an buheşte ji bo ew kesê tê de dijît, wate dema tu di nav koyê de dijî tu di buheştê de yî, lêbelê dema tu jê dûrketî tu di kevî nav dojhê an jî dikevî nav cejnê de, "nav anîna koyê weke buheşt di rewşa hazirîyê de û nav kirin bi dojhê di demê jê dûrketinê"¹⁰³, Hacî weke cihekê pîroz ji bajêrê koyê dinêre û navê wê dike buheşt an jî di hîne hemberî buheştê, herweha jiyana dûrî ji wî bajêr jî dike dojhê an jî bi jiyaneke nexweş li qelem dide û navê wê dike dojhê. Li gorî vê helbestê ew yek aşkera dibît ku Hacî Qadir di nav jiyaneke pîr nexweş dijî, an jî dikarî weha bibêjîn ku hertim bajêrê wî di hizra wî deye û pîr jê xerîb bûye, ji ber vê xerîb bûnê jî hestekê Nostalojîyê dijwar dide wî, ku rewşa Derûnî û Saykolojîya Hacî Qadir ber bi xirap bûnê û ne başîyê birîye, ev xem û hesrete jî li ba Hacî Qadir ji bo wê yekê vedigere, ku Hacî Qadir di temenekê zû de bajarê xwe ku bajarê koyê ye bi cih di hêle û berê xwe dide bajêrê Istembolê, herweha nebûna jiyaneke xweş jî di vî bajêrî de Nostalojîya Hacî zêdetir dike û wî bajêrî bi dojhê di hîne ziman.

Di çend helbestekên din jî de Hacî Qadir ji dûrîya bajêrê xwe bi hesret ve koyê di hîne astê welatê û bajêrê pîr xweş û weha li ser di peyve:

Le meydanî behara şarekey Ko

Qubey kişmîrî da ber şeq wekû go

Le ma beynî Kekon û Heybesulltan

Nisêy êware û sayey sibeynan

Lelam zîllî humaye çetrî senber

¹⁰³ Rêbwar Sîweylî, *Hacî Qadirê Koyî*, r 101.

Çi cayê sêberî ser û sinewber (Dîwan, r 247)

Her wekû şaranîtir kes aşnay Koyê nebû

Şuhretî ebyatî min xelkî Leser ko kirdewe (Dîwan, r 134)

Le boçî le bexda xurma bê û leymûn

Le bo derman le şar bê ronî zeytûn

Le dewrî kullî baxî şarî Koyê

Dûsed bin darî zeytûnî be coyê (Dîwan, r 254)

Kurdekî Koyî kewtewe yadim

Pêm gut aya çilone ustadim (Dîwan, r 235)

"Di nav pirranîya van helbestan de ku tê de behsa bajarê koyê kirîye, zêdetir xwe ji rewşa Derûnî û kesatîya Hacî Qadir vedibîne. Ew rewşên Derûnî ku palnerê xeyalên wî ji bo helbesta bûye ji aliyê Hacî Qadir ve"¹⁰⁴, ew hestên Nostalojî ku li ba Hacî Qadir ji bo bajarê koyê hebûye, bûye palner û sedem ku di nav helbestên xwe yada bajarê xwe bike, ku di van helbestan de weha wesfa bajarê Koyê yê kirî, ku dixê astê bajar û welatên din ku di cîhanê de bi ciwanî û xweşîyên xwe navdar bûne. Herweha dibêje: min Kurdekê bajarê xwe dît û min ji rewşa bajarê û ustadên xwe ji wî pirs kir, ew pirs kirin jî xuyaye bi xemgînî û bi janeke derûnî bûye, çimkî zemenekê pirr dirêj bi ser koç û dûrketina wî ji bajarê koyê de çûye. Nostalojîya dûrî ji bajarê warê ku mirov tê de mezin bûye bi awayekî zêde di nav helbestên Hacî rengvedan kirîye, herweha Hacî Qadir ji bo ev cureyê Nostalojîyê nimûnekê gelekê berçave di nav Edebyata Kurdî de.

2.4.3. Nostalojîya Dûrî Li Malbat û Hevalan

Nostalojîya dûrî ji malbat û dostan yek ji wan cureyên Nostalojîyê ye, ku cihekê berfireh di nav Nostalojîya takekesî an jî Nostalojîya xwedî girtîye, çimkî ev cureyê Nostalojîyê li ba pirranîya mirovan heye û helbestvan jî beşek in ji wan mirovan ku weke her mirovekê din rastî ev cureyê Nostalojîyê dihên. Sedema herî girîng jî ewe ku her kes di jiyana xwe de rastî bûyereke ji destdanê dihêt, hevalê mirovî be an jî endamekê malbata mirov be, ku eleqeyeke pirr û hestekê bihêz dibe

¹⁰⁴ Rêbwar Sîweylî, *Hacî Qadirê Koyî*, r 257.

egerê girêdana wan kesan bi mirov ve. Herweha dûr bûn an jî dûrketin li heval û endamên malbata xwe sedemeke din e, ji bo serheldana ev hestê Nostalojîyê. helbestvan dema dikevin nav rewşeke weha û dema hestekê weha li ba wan çê dibe, dibe sedemê hindê ku di nav helbestên xwe de parve bikin. Herweha helbestên helbestvanan jî dibe çavkanîyeke bihêz ji bo tomar kirina wan navan ku helbestvan di nav helbestên xwe de bas dike. "bîranîn û hestê xurbetê û yad û bîrewerîyên ezîzên mirovan di nav Edeba Kurdî de beşeke zêde ji naverok û pêkhatiya têkistên helbestvanan dagîr kirîye"¹⁰⁵. Wate rengvedana ev hestê Nostalojî zêdetir dibe diyardeyek di nav hestên Nostalojî ku li ba hejmareke zêde ya helbestvanan heye.

Hacî Qadirê Koyî jî yek ji wan helbestvanaye ku ev cureyê Nostalojîyê di nav helbestên wî de rengvedaneke berçav kirîye, çimkî Hacî Qadirê Koyî di temenekê kêr de diya xwe û babê xwe ji dest dide, herweha piştî çendekê jî ji malbata xwe vediqete, veqetyana wî jî ne tenê li malbat û xizmane, belkî li hemû heval û naskirîyên xwe vediqete, Hacî Qadir dema diçe welatê xerîbîyê û êdî venagere warê xwe, di wê derê de dûrî hemû xizim û mirovên xwe dijî, ev çende jî dibe sedemê hindê ku di gelek helbestên xwe hest û sozên xwe ji bo mirovên xwe bîne ziman û di nav helbestên xwe bas bike. di helbesteka xwe de behsa hevalekê xwe diket û dibêje:

Le cumley maceray dûrî wîlayet

Emeş basêke xoşe wek hîkayet

Şewê danîştibûm bê şem' û mîsbah

Etoy hênawe yadim kake Fetah

Gufî ba kaxezêkî bo binêrîn

Muhîbbî sadîqe û hemrazî dêrîn

Minîş em nameyem nûsî be te'cîl

Şîr û wir wek xerar û kone zenbîl

Be bê teswîd û teshîh û mubalat

Weku beyfî bile herçonê bom hat (Dîwan, r 239)

¹⁰⁵ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Da*, r 275.

Hacî Qadir di vê helbesta xwe, yada hevalemê xwe diket bi navê *kake Fetah*. "aşkeraye ku hevalînîya kake Fetah digel Hacî zemenekê dirêj borandîye"¹⁰⁶. Weke di helbestê de hatîye, Hacî dibêje: şevêkê bê mom û ronahî danîştibûm di wê demê de kêkê Fetah hate bîra min. li gorî axiftina Mes'ud Mihemed kekê Fetah hevalemê Hacî Qadirî ye. Herweha ew rewşa ku Hacî tê de bûye, egerekê girîng bûye ku bikeve nav hizir û bîranîna hevalemê xwe ew jî ew rewşa hejarîyê ye di welatê xerîbîyê, çimkî bixwe dibêje ne momek li ba min hebû ne alavêkê ronahîyê, ev çende jî bûye egerê hindê ku bikeve nav yadewerî û bîranînên hevalên xwe.

Hacî Qadir bixwe di malikeka din de bext reşîya xwe dide zanîn li ser veqetyana xwe ji malbat û xizman, dibêje:

Min kesêkim zemaneyî nakes

Day birîwim le qewm û qîle û kes (Dîwan, r 210)

Herweha Hacî Qadir di helbesteka din dikeve nav hestê Nostalojîyê û navê diya xwe û babê xwe anîye, herweha ev helbest bûye çavkanîyeke herî girîng ku vekoler bizanibin Hacî kurê kê bûye, di vê helbestê de Hacî dibêje:

Bawkim Ehmed bû nawî fikrim dê

Xelqî ladê bû, daykî min fatê (Dîwan, r 195)

Aşkeraye ku Hacî hêj zarok bûye dema diya xwe û babê xwe ji dest dide, ev jî destdane jî dibe astengîyeka mezin li hemberî jiyana Hacî Qadir û dîr bûn ji hestê van dî kesan û nebûna hest û sozên wan weha li Hacî kirîye ku pirr caran xwe bê kes bide nas kirin, ev jî hestekê dijware ku hertim mirov dilteng dike û rewşa derûnîya mirov ber bi xerabîyê ve dibet. Herweha di helbesteka din de Hacî Qadir yada hevalemê din diket ku bi hev re wan xwendîye û gera gelek cihên Kurdistanê wan bi hev re kirîye, dibêje:

Be fikrit dê zemanê çûyne balek

Be pê xawsî ne kewşim bû ne kalek

Leber pêm dirrk û dar û şax û barî

Wekû mexmer bû nermî ya ne qalî (Dîwan, r 244)

¹⁰⁶ Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, Bergê Yekê, Weşanxaneyê Aras, Hewlêr, 2010, r 49.

Ev helbeste, Hacî li ser hevaleyê xwe nivîsandîye ku wan bi hev re xwendîye. Herweha bi hev re jî gelek cihên Kurdistanê kirîne û navçeya balekayetî jî kirîye digel hevalê xwe. "Hacî Qadir digel Hacî Mela Ebdullayê Celîlzade geşteka xwendinê ji bo navçeya balekayetîyê dîkin û di gundê Şêx Wetman ji alîyê Mela Muhemmed Kak Ebdulla dixwîn in"¹⁰⁷. wate di vê helbestê de Hacî Qadir basa Hevaleyê xwe kirîye û yad kirîye ku di demên berê de bi hev re bûne û bi hev re xwendin û geryan ji bo gelek navçeyan kirîne, ev bîranîne jî di demekî deye ku Hacî Qadir ji wî hevalê xwe dûr e, ji ber wê çendê yada wî kirîe, wan dijwarî û xweşîyan yad dike ku digel hevalê xwe di Kurdistanê de borandine. Ev cureyê bîranînan jî hestên Nostalojiyê çê diket bi taybetî jî ji bo Hacî Qadirê Koyî ku ji dûrîya xizim û kesên xwe di bajarê Istenbolê dijît, Hacî dixwaze bi rêya wan helbestan hinekî dilê xwe vede di welatê xerîbîyê de, lêbelê hestê Nostalojiyê her zêde dibe li ba wî, zêdetir dikeve nav rewşeke nexweş û xerîbî kirina dost û hevalên xwe.

2.4.4. Nostalojiya Dûrî Li Me'suq:

Nostalojiya dûrî ji me'suq êk ji wan hestên Nostalojiyê ye ku li ba pirranîya mirovan çê dibe, bi taybetî jî li ba helbestvanan bi awayekî zêde xuya dibe di nav helbestên wan de. Ev hestê Nostalojiyê hestekê evînî ye ku li ba mirovan çê dibe ji bo hev. Hacî Qadirê Koyî jî bê par nîye ji vî hestî û di dilê wî jî de kesek hebûye ku wan hestên evînî li ba wî bi afirîne, ev hestên wî jî di nav helbestan de rengvedan kirîye.

Ewey xoşim dewê mîslim nedîwe

Be xeyrez xoy le jêr em asmane

Le beynî zullf û xal nûnî ebroy

Be elfî qametî canî cîhane (Dîwan, r 134)

Di vêrê de xuyaye ku mebesta Hacî ji wê evînîyê, kesekê taybete ku jê hez dike an jî dixwaze bigihêje wê daku digel wê de jiyaneke tena bibe ser, ya rastî jî ev peyvên ku li vir de Hacî bikaranîne û di helbesta xwe de wesfa kesekî pê kirîye ku jê hez dike, hemû jî tenê wesfên xanimekê ne. herweha di helbesteka din de weha dibêje:

¹⁰⁷ Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mistefa Şareza, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 1390, r 21.

Le dewrî xalekey kullmî ke marî zullfî danawe

Le ser teswîrekey adem melek sed 'urzî hênawe

Şewê mî'racî subhane be qeddî seruy toy zanî

Le sîdre cubr'eîl boyê le nîwey rrêge laydawe

Ke şeytan taqî mîhrabî toy dî wîfî: Yareb

Le secdey hezretî adem serî xom boçî badawe (Dîwan, r 143)

Di vê helbetê de jî Hacî bi awayekî bilind pesna evîndara ku di dilê wî deye diket û dibêje: dema şeytan ciwanî û bedewiya te dîtî gote xudêy, çima min sucde ji bo adem nebir.

Ger neçim lêm zwîr debê weqtê deçim men'im dekat

Seyrî ke bê mirwete çîm lê deka û çîm pê deka (Dîwan, r 268)

Hacî bas diket û dibêje: ku ez neçim li min aciz dibe û wexta ku diçim jî terka miin diket. Herweha dibêje: ew pirr zorê gel min dike û min pirr di êşîne. Hacî Qadirê Koyî pirr xem xwarine ji bo evîndara xwe û xemên wî nahên veşartin çimkî li gorî jiyana wî, Hacî di jiyana xwe de ne zewicîye, ev jî tê wê wateyê ku miraza wî nahatîye cih û ev yeke jî hestekê bi êş û xemgîn li ba wî çê kirîye, ku bi hestê dûrî ji me'şuqê an jî dûrî ji evîndara xwe dihê zanîn û dikeve çarçûveya Nostalojiya xwedî.

2.4.5. Nostalojiya Dûrî Li Beheşt û Jiyana Ebedî:

Di vê cureyê Nostalojiyê de helbestvan bi awayekî pirr zêde weha hîs dike ku ew di nav vê jiyânê xerîbe, herweha weha jî hest dike ku ew dûr e ji rihetiyên jiyânê û ew jiyana niha tê de dijît, jiyaneke kurte û wê rojek were koça jiyaneke din bike, lewma hertim di hizrên xwe de ji dîv jiyaneke ebedî digere û dixwaze cihekê rehet ji bo rih û canê xwe vebîne, "helbestvan wedzane li ser vê dinyayê biyanî ye û li xerîbistana vê dinyayê jiyana xwe didomîne"¹⁰⁸. Hacî Qadirê Koyî jî dûr nebûye ji vî hestê Nostalojiyê û bi awayekî aşkera di helbestên wî de ev hest dihên pêşçav.

Le dinya herkesê meqsûdî 'Eşqe

Bika wek min be kullî terkî dinya

Ke dayhêna û hellî na çawî mestî

¹⁰⁸ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'ri Hawçerxi Kurdî Da*, 2016, r 313.

Rewan fîda dekem dill çakî hêna

Felatûn to dellêy dinya qedîme

Le ximxanet binên wa xot le xim na

Edî boçî zemînîş bote gerdûn

Le seylî eşkî tundî bê muhaba

Musillmanan suxen serbeste takey

Le dest ew kafîrî bê dînî tersa

Le herdû lawe zullfî kewte garden

Ne lemla derdeçê Hacî ne lewla (Dîwan, r 54)

Di vê mînakê de Hacî li ser wê yekê disekine, ku her mirovekî raz û meqsed 'Eşiq be, divêt weke min terka dinyayê biket û dest ji wan raz û hêvîyên dinyayî berde û berê xwe bide evînîyeke ebedî. Hacî di vê helbestê weke ku xuyaye merem ji 'Eşqê ewe ku 'Eşqeka xwedayî be û riha xwe di vê jîyanê û di jîyana din de tena bike. Wate ew peyvên Hacî li vir de bikaranîne bi pîranî dikevin qalbê Tesewif û 'Îrfaniyê, ew jî xem û diltengiya Hacî dide nîşan dan li gor jîyaneka ebedî û bê dawî.

2.4.6. Nostalojîya Pîrî û Hizir Kirin Li Mirinê û Tirsaya Mirinê:

Mirin naverokeke fikrîye di nav hemû ferheng û şaristanîyetan de, mijareke ku bi dirêjahîya dîroka mirovatîyê mirov bixwe re mijûl kirîye, hertim ev mijar bûye cihê nerîn û hizir kirinê û digel borîna demî bi çend cure û şeweyên cuda axiftin li ser hatîne kirin, hizir kirin ji mirinê, sedema serekî ya tirisêye li mirinê, ji ber vê çendê jî pîrî û hizir kirin ji temenê ciwanîyê û zêde bûna temenê mirovan yeke ji sedemên hestên Nostalojîyê, herweha spî bûna porê mirov jî yeke ji wan sedema ku hizra mirov bixwe re mijûl dike û dibe sedemê hizir kirin ji mirinê û hesret xwarin ji wan rojên pîrî dijwar û nexweş di jîyana mirov de. "lêbelê hizir û nerîn û hestên nivîskar û helbestvanan li gorî vê mijarê balkêş û girînge, çimkî ew bi hest û sozên xwe derbareyê mijarên derdora xwe di peyvin, bi vî awayî tîkisteka Nostalojîya takekesî û xem û jan û êşên Derûnî yên xwedî çê diket"¹⁰⁹. Ev çende jî tiris û dûdilîyê li ba helbestvan û nivîskaran çê diket, çimkî dizanin wê demekî ev rojên weha her bihên û wê rojekê di nav êş û xerîbîya pîrîyê de bijîn. Hacî Qadirê koyî ji wan helbestvanaye

¹⁰⁹ Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şî'ri Hawçerxi Kurdî Da*, r 324.

ku ev hestê Nostalojî bi awayekî zêde li ba wî rengvedan kirîye, sedem jî ew jîngeha taybetî ya derdora wî ye ku Hacî Qadir di nav de jiyaye, çimkî Hacî Qadir bê kes di nav welatê xerîbîyê de jiyaye, wate bê kesîya Hacî Qadir yek ji wan sedema bûye ku hertim hizra pîrîyê bike û xema ji bo rojên xwe yên pîrîyê bixwe ka çawa wê jiyane bidomîne bê heval û bê xizim, herweha tiris û hizir kirin li mirinê bi sedema bê kesîyê xemeka din daye Hacî Qadirê Koyî, ew jiyana tenêtiyê ji bo Hacî Qadir hertim cihê xemgînîyê bûye û hertim hizir û xeyalên pîrî û tirsî mirinê li ba wî hebûne, Hacî di helbesteka xwe de li ser derdê pîrîyê weha di peyve:

Leber pîrî emende bê hewasim

Delêy erkanî Îslamî înasim

Ser û rîşim serapa bote loka

Be şew hemrazîme pişmîn û koka

Xerîbî xurbetî kirdim be ewtan

Serapa erzî lê kirdûme zîndan (Dîwan, r 240)

Hacî Qadir di vêrê de bi rêya bikaranîna hinek peyvan îşare bi temenê xwe dike û dide aşkera kirin ku temenê wî gelek helkişaye û êdî tu hêzek li ba wî nemaye dema van peyvan dibêje: pîrim û ser û pore min mîna Lokeyê spî bûye, herweha Nîşaneyeka din jî ji pîrîya xwe dide zanîn û dibê: şevên min bi koka û nalîn in, her cih li min bûye hepis û zîndan. Hacî Qadir bi rêya vê helbestê amaje bi hestekê Nostalojîya kur diket, xuyaye Hacî di nav êş û janeke pîrî de ye, ew êş û janên wî hemû jî di vê helbestê de daye berçavan. Herweha ev helbest nîşaneyeka dine, ku Hacî Qadir weha hîs dike ku ji mirinê nêzîk bûye, ev çende jî xem û hestê Nostalojîya Hacî Qadirê Koyî zêdetir kirîye. Herweha di hinek Helbestên din de Hacî Qadir weha li ser mirin û derdê pîrîyê di peyve:

Êmeş demrîn debîne xakî sererrê

Em roj û şewe tenûrî subhî degrrê

Desga û dûkanî şarekan dadenrê

Emyan defroşet ewîtir dekrê

Em bawkî mirdûwe yexey dadedrrê

Ew bûkî nûy heye keway bo debrrê (Dîwan, r 157)

Ser sipî û dil rreş bû Hacî ta feqê bû êstekeş

Rûrreşêke rrîş sipî xwa 'alîme herwa debê (Dîwan, r 157)

Hesretim her emeye le dinyada

Hacî demrê be dewriyan naga (Dîwan, r 215)

Çawekem toş pîr debî rîşit debête gorewî

Wek bifermûy min filanim pêt delên tuxwa hewî (Dîwan, r 267)

Di van helbestan jî Hacî li ser mirin û pîrîyê peyvîye û hestê xwe û hizrên xwe li ser van dû mijaran anîye ziman. Hacî di helbesta yekemîn de weha li ser mirinê peyvîye, ku ramana wê ev e: cîhan ji bo tu kesî nabe maleke ebedî, ez ê bimirim, tu jî wê bimirî û her kes wê bimire. Hacî li vir de wê yekê piştrast dike, ku li hemberî mirinê hemû kes wek hev in, di vê mijarê de her kes yeksane, dewlemend, feqîr, deshilatdar û bê deshilat, di dawîya dawî de para her kesî dibe mirin, ev peyvên Hacî jî li ser wê çendêne an jî dixwaze bêje ev jiyana tu titşek nîne û nabe mirov bi awayekî xerab li ser vê jiyane tevbigere, çimkî di dawîyê de wê bimire û tu tişekî jî digel xwe nabe jiiyana din tenê bixwe û kiryarên xwe diçe. Herweha Hacî Qadir di helbestên din jî li ser mijara pîrî û mirinê di peyve û xem û hesretên xwe li ser van dû mijara dide berçav ku ew xemû hesretên wî hey di karwana jiyana her kesekî de çê dibe, sedem jî ewe ku mirov pîr dibe gelek bê deshelat dimîne li hemberî jiyane de, herweha hêza wî/wê jî ya zemenê ciwanîyê namîne, loma hesretan dixwe û ji bo vê temenê nexweş xeman dixwe. di astê mirinê jî wisaye dema mirov hizir ji mirinê dike nizane ka ew mirin wê çewa be û di çi demî de wê bimire, herweha wexta ku mirov hizir ji mirinê dike, hizir ji wê yekê jî dike ka piştî ku mirov dimire wê çi bi ser canê mirov de bihêt, dinyayeka din û jiyaneka din heye ji bilî vê jiyane an na. Ev hizrên kur jî dibe sedem ku mirov bi xem bikeve, çimkî ew mijara ku hatîye bas kirin mijareke herî girînge ku bi dirêjahîya dîrokê ji alîyê mirovan ve bûye cihê pîris kirin û têramanê, ku di serdemên zû de mirovan xwestîye bizanibin ku piştî mirov dimire çi bi ser mirov dihêt û pîrî caran jî mirov li dora wê yekê çûne ku hîlacekê an jî dermanekî ji bo mirinê vebînin û rê li ber mirinê bigirin, herweha niha jî di hemû cîhanê de vekolînan li ser wan dermanan diken û dixwazin dermanekê weha çê bikin daku mirov bikare rê li ber pîr bûnê bigire, hemû sedem jî ewe ku mirov naxwaze bimire û naxwaze pîr bibe. Hacî Qadirê Koyî jî weke her mirovekê dinê dîrokê ramana xwe li ser mirinê gotîye û

li ser pîrfîyê peyvîye, ku li hemberî wan rastî hestên Nostalojîyên kur hatîye xem hesret li ser van dû mijaran xiwarîye.

2.4.7. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Nav Xwezayê:

Xweza yek ji wan mijarane ku hertim eleqeyeke bihêz bi mirovan re hebûye, ku mirov di çaxên berê de bi awayekî zêde digel xwezayê têkildar bûye, lêbelê piştî wan pêşveçonên pirr di mijarên teknoloji û şaristanîyetê de, hêdî hêdî û hejmareka zêde ya mirovan bi wan sedemên li jor hatîne bas kirin ji xwezayê veqetyane. Herweha vegeryan ji bo nav xwezayê an jî siruşt yek ji wan pîrensîp û bingehên Romansîzmane ku girîngîyeke zêde li ba nivîskar û helbestvanên Romansîzmê ji bo xwezayê hebû. "vegeryan ji bo hembêza xwezayê naverokeke diyar û girîng a helbest û helbestvanên Romansîzmane, çimkî wan wisa hîs dikir, ku ji bo rizgar kirina xwe û rakirin ji wê jiyana teji pirisgirêk a wî serdemî, bi taybetî jî piştî pêşveçona cîhana teknolojî û amêran û pîs bûna jîngehê, herweha bi amêr kirina mirovan zêdetir reşbînîyê bal bi ser helbestvanan de kişand"¹¹⁰. Ev çende jî bû sedemê hindê ku helbestvanên Romansîzmê berê xwe bidin xwezayê û vegeryan ji bo nav xwezayê bi çaresereke herî girîng bidanin.

Nostalojî û xweza bi hev re eleqedarin, vegeryan ji bo nav xwezayê û jiyana di gundan de û çiya û newal û kanî û rûbar û ..htd. mijareke herî girîng bû ji bo helbestvanan ku bi saya hindê xwe li wan xem û nexweşîyan derbaz bikin ku rastî wan hatine. helbestvanên Edebyata Kurdî jî girîngîyeke zêde bi xwezayê daye, helbestvanên Kurd ên kilasîk jî di gelek helbestên xwe de behsa xwezayê kirîye û ji bo ku xemên xwe hinekî ji bîr bikin û rihetîyê bidin xwe vegeryane ji bo xwezayê, herweha xwezaya Kurdistanê jî gelek balkêşe û ciwanîyên zêde hene, herweha Kurdistan yek ji wan neçeyane ku çar demsalên salê hene, eve jî li ba hemû netewe û herêman nîne, ku bûye rêyeke xweş ji bo helbestvanan ku di demên nexweş û demên xemgîn ji bo xwezayê vegerin. Hacî Qadirê koyî jî weke helbestvanekê Kurd di gelek helbestên xwe behsa ciwanî û xweşîya xwezayê kirîye û bi rêya helbestan ji bo kêr kirina xemên xwe bala xwe daye xwezayê û behsa xwezayê kirîye.

¹¹⁰ Soran Mamend, Nostalojiya Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî Da, r 334.

Beharî bo gull û bo mîwe payîz

Nezîrî ger bilêm nabê be cayîz

Be rengî asman tamî nebate

Be safî kewser awî heyate

Nimûney cennete şîwî Rezanî

Beharî şame eyyamî xezanî

Gullî hacîlekanî deştî Hamûn

Nekey bîdey be nergiscarî gerdûn

Leser kêwan gillûk û laleyî sûr

Yedî beyzayî mûsaye Leser Tûr (Dîwan, r 248)

Hacî Qadir di vê helbestê de xweza û sirûştê dike mijara xwe ya serekî û li dûrîya warê xwe behsa gulan dike, ku di buharê de welat û warê wî di xemilînin û behsa payîzê dike, ku digel hatina payîzê fêqî û mîweyên xweş çê dibin. Herweha Hacî behsa kanî û newalên derdora bajarê Koyê dike. vegeryana Hacî ji bo xwezayê piştî wê yekê dihêt ku êdî Hacî Qadir ne di warê xwe de ye, belkî di bajêrê Istenbolê akincîye, ku bajêrekê qerebalix û pirr amêre, êdî Hacî xwestîye bi rêya vegeryan ji bo nav xwezayê hinek ji xem û westiyana xwe kêmbike. Herweha Hacî di helbesteka din de weha xwezayê dike mijara helbestên xwe û dibêje:

Be gull û lale beharî ruxî razawetewe

Xabetî kwêrî were hîç nebê seyîrî ke be lût

Wekû deryaye nesîmî seherî sebzeyî gull

Pêkewe mewc û hubabî deheja û debizût (Dîwan, r 64)

Le golle şînê ke qaz û mirawî dên û deçin

Nezîrî mah û sitaren le qulzûmî mîna

Şiney nesîme seday awî safî ser qellbez

Be wirşe wirşî giya şengebî buwe şeyda

Xirîng û horrî qulîng û qetarî sî le seran

Deyêt û kew defîrêt û şehên çîrîke dekat (Dîwan, r 40)

Hacî Qadir bi xeyaleke pirr ciwan û wesfeka xweş xwezayê dike beşek ji wicuda jiyana xwe. wêneyên mang û estêreyan bi hûrî dikişîne û qaz qurîngan dike lehengên helbesta xwe û helbesta xwe pê ava dike, kevok û firîna çûkan di asîmanan weke ciwanîyeke taybet di nav mejî û dilê xwe di parêze. xweza li ba Hacî Qadirê koyî weke alaveke pirr girîng derketîye, ku bi saya wê xwezayê hinek rehetî daye dil û derûnê xwe û xwe ji wê rewşa Derûnîya ku di nav de bûye sermest kirîye. Mirov di wan deman de bala xwe dide ser xwezayê, ku ji wê jiyana niha tê deye xwe rehet nebîne û bixwaze ji jiyana qerebalixîyê xwe xelas bike, ev jî dibe sedem ku bikeve nav hestên Nostalojî û xem û xefatan li hemberî wan guhertinan bixwe ku bi ser jiyana wî de hatine.

2.5. Nostalojîya Giştî(Cem'î)

Nostalojîya giştî weke ku di berê de me bas kir dikeve nava qalbekê giştî û eleqeya wê ne tenê bi mirovekî ve heye belkî bi civakekî û netweyekî an jî bi hemû mirovan re eleqedar dibe. Hacî Qadirê Koyî weke helbestvanekê neteweyî xudanê gelek helbestne, ku fikir û nerînên xwe di xizmeta neteweya xwe di nav wan helbestan de belav kirîne. Ew fikir û nerîn jî bi sedema xem xwarin û hest kirin bi berpirsiyarîya Hacî Qadirê Koyî ye li hemberî welat û paşeroja welatê xwe, ku li vir de emê Nostalojîya giştî bi nimûneyên helbestên Hacî Qadir bidîn şirove kirin.

2.5.1. Nostalojîya Dûrî Li Welat

Hestên Nostalojî yên ku eleqeya wan bi bîranînên neteweyî û ji dûrîya welat tê hîs kirin di nav helbestên Hacî Qadir de gelek berçav in, çimkî weke xuyaye Hacî nîva temenê jiyana xwe di xerîbîya welat de bi ser birîye, ev xerîbî jî bûye sedemek ku Hacî bikeve nava hestekê kur yê Nostalojîyê, weke di helbesteka xwe ku bi navê *Le Roma kewta berçawim* nivîsandîye û tevahîya vê helbestê xemgînî û hesreta dûrîye ye ji welat, dema weha dest pê dike û dibêje:

Le Roma kewte ber çawim kesêkî haîm û heyran

Be heyet têgeyîm Kurde be şewey ehlî Kurdistan

Ke çûme xidmetî pirsîm birader xelkî kam cêgay

Le kam la hatûy? Gîrya gutî Baban gutm Baban

Dillm dawê gutm: bawke hemûman bê kesîn lêre

Çi qewmawe gelê heyfe megiryê her wekû baran

Gutî bo xurbet û rûfî nîye efxan û hawarim

Le daxî hakimî xome le şan û şewkefî Turkan (dîwan, r 100)

Mirov eger ji welatê xwe dûr be dibe kesekê xerîb û bi reng û rûyê wî/wê bi hêsanî dihête hîs kirin ku ev mirov ne mirovê wan derane û ji welat û cihekê din hatîye, Hacî jî dibêje: min kesekê xerîb dît û min zû hîs kir ku ev mirov Kurd e, wate Hacî bi rengê wî kesî ev yek jê re aşkera bûye ku ev Kurde û di xerîbîyê de sergerdan bûye, çimkî mirov nikare di nav welatê xerîbîyê de sergerdanî û kelecaniya xwe veşêre. Pişt re Hacî Qadir jê piris dike ka xelkê ku derêye, ew jî bi girîn ve bersiv dide û dibêje Baban, wate Kurde û ji Kurdistanê ve hatîye, lê li vê derê sergerdan bûye û ji dûriya welat rastî xemeke zêde hatîye. Herweha Hacî Qadir bi awayekî giştî behsa wan xem û hestên dûriyê ji welat dike, ku di helbesta xwe de weha dibêje: em hemû li vir bê kesîn, eve jî di astê hestên Nostalojîyê de dikeve qalbekê giştî û bi Nostalojîya giştî dihête nas kirin, dûr bûn li welat ji bo hamû kesan wek heve û xemeke giştîye wate hemû kes ji dûriya welatê xwe xemgîn dibe. Herweha ev xemên Hacî ji bo welatê xwe ji ber bin destîyê bûye ku hertim renc û zehmetîya wan hatîye xwarin. "Hacî bê hest nebûye li hemberî xwarina renc û zehmetîya Kurdan, wî dizanî ka çawa bi şev û roj mijûlê kar kirin û rencdanêye, lêbelê berhemê renca wî ne ji bo wî ye, belkî ji bo dagîrkerane, ku wê demê 'Ecem û Turkên Osmanî bûne"¹¹¹. Herweha di çend mînakekên din jî Nostalojîya dûrî ji welat tê berçavan ku dibêje:

Şî'rekanim ke xerîbî weten û new seferin

Were bîxûnewe em nuqte sewabêkî heye (Dîwan, r 127)

An jî dibêje:

Sibeynê heste, meweste xeber bigeyne willat

Diyare çende hezîn û xerîb û bê keyfîn (Dîwan, r 105)

Hacî Qadirê koyî bixwe wê yekê dide piştrast kirin, dema di mînaka yekemîn weha dibêje: helbestên min ji welat xerîbin û li benda sefereka taze ne ji bo welat. Wate helbestên Hacî bi hêsanî dihêne berçav û didin zanîn ku Hacî Qadir ji welat pîrr

¹¹¹ Mihemedî Mela Kerîm, dû babet le barey bîr û helbestên Hacî Qadirê Koyî, weşanxaneya Aras, çapa düyem, Hewlêr, 2008, r 92.

xerîb bûye û helbestên wî bêhna xerîbî kirina welat jê dihêt. Herweha di mînaka düyemîn jî ev yek bi aşkera dihête hîs kirin ku Hacî Qadir çiqasî ji welatê xwe xerîb bûye û ew welatê niha tê de dijît ji wî re tu kêfek û xweşîyek nîne, dema dibêje: subahî rabe û nesekine xebera min bigehîne welat û wê yekê jî bigehîne welat ka çend xerîb û bê kêfîn, eve jî Helbestvan bixwe wan xem û kovanan ji bo welat di nav helbestên xwe de belav kirîne, her çiqasî Hacî di bajarekê xweş û moderin jî jiyaye lê ev yek nebûye sedemê hindê ku Hacî welatê xwe û neteweya xwe ji bîr bike û di xeyalên xwe de bavêje der belkî hestên wî ji welat re zêdetir bûne.

Nostalojîya dîrî ji welat li ba Hacî Qadirê Koyî rengvedaneke têr kirîye, çimkî awarebûn û derbiderbûna Hacî xema welat dikeve nav dilê wî û bi zûyî ev xem û hestên Nostalojî li ser dêmên wî der dikevin, welat jî weke xemeke giştî û mijareke giştî li ba her kesî dihêt hîs kirin, ku derencamê wan xem û êşên dîrîyê ji welat dibe hestekê kur yê Nostalojîyê, wate dikeve nav çarçoveya Nostalojîya giştî, Hacî Qadir jî weke mirovekê Kurd û helbestvanekê Kurd ji wan hestên Nostalojî bê par nebûye.

2.5.2. Nostalojîya Bîranînên Dîrokî û Neteweyî:

Netewe li ba Hacî Qadirê Koyî ve ji servey her tiştî dihêt û hertim pesna neteweya xwe kirîye û bi rêya vejyandina dîrokê pêkol kirîye şîretên neteweyî ji bo mirovên paşeroja neteweya xwe bi cih bihêle, "di helbesta Kurdî de nerîta Nostalojîya dîrokî û di çarçoveya hizra neteweyî de şîrovekirina dîrokê, bi Hacî Qadirê Koyî dest pê dike. Hacî dîrokê ji bo gihîştina armancên neteweyî wek kana moralê bi kar tîne û hemû tiştên ku di roja îro de kêr in û ji bo paşeroja neteweyê pêwîstin, di dîrokê de berceste dike û bi vî awayî dîrokê dike awêneya paşeroj û armancên neteweyî"¹¹². Ev çende jî li ba Hacî weke xemeke neteweyî dihêt hîs kirin, her wek ku di nav helbestên xwe weha dibêje:

Hakim û mîranî Kurdistan

Her le botanewe heta Baban

Yek be yek hafzî şerî'et bûn

Seyîd û şêxekan le tirsî ewan

Munzewî bûn û zakîrî rehman

¹¹² Zülküf Ergün, *Nerî û Helbest*, Çapa Yekem, Weşanxaneya Nûbehar, Istenbul, 2017, r 203.

Her ke fewtan riyay ewan derkewt

Seyrî çon bûne pûş û agir û newt

Yekê lemlawe rû dekate 'Ecem

Dû lewlawe debne dûjminê hem

Dû hezar jin fesad kira lemla

Bûne qatîl ewanîtir lewla (Dîwan, r 212)

Hacî Qadirê Koyî di vê helbestê de ji bo dîroka neteweyî vedigere û bi awayekî jî hinek rexneyan ji dîroka şêx û mîrên Kurd digire, ku Hacî wan bi sedema nexweşiyên neteweya Kurdan dizane. Dijberî kirina şêx û mîrên Kurd digel hev bi dirêjahîya dîrokê û nebûna canê alîkarîyê digel hev bûye sedemê hindê ku hertim Kurd di bin destîyê de vemînin, ji ber vê çendê Hacî dibêje: yek ji vî alî berê xwe dide 'Eceman, dû jî ji vî alî dibin dûjminên hev. Ev çende jî bûye sedemê hindê ku helbestvan ji bo vê dîroka nebaş ya neteweya xwe dilteng bibe û xeman jê re bixwe, "nemana hakim û mîrên Kurd ku di berê de bi tu awayî nedihêla di penaya dîne dînya bihête peristin, digel vê yekê jî xuyaye ku merema Hacî heya birina şêx û seydên dînya periste, bi dor vê de jî bilindkirin û pesna Hakim û mîrên Kurdan e"¹¹³. wate Hacî xem û Hestekê Nostalojî ji bo neteweya xwe xwarîye ku di serdemên cuda cuda yên dîrokê de wan li hev nekirîye û hertim li hemberî hev weke dûjmin rawestane, Hacî Qadir jî xem ji wê dîroka nebaş xwarîye û xwestîye êdî neteweya wî rastî wan şaşîyan nehên daku bikaribin weke her neteweyeka din ên dinyayê bibin xudan dewlet, herweha di helbesteka din jî vedigere ji bo dîroka neteweya Kurdan û weha wesif dike:

Xo dezanin sulaleyî Ekrad

Lêrewê bigre ta degate Qubad

Hemû 'alîm, hemû şêx û mirin

Zîrek û jîr û ehlî tehbîrin

Wesetî panî pazde rroj rrêye

Pirr le rreşmal û xane û dêye

¹¹³ Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, Bergê Sêyê, Weşanxaneya Aras, Çapa Dûyem, Hewlêr, 2010, r 95.

Be dirêjî le qaf ke raburdin

Ta be Şîraz û Esfehan Kurdin

Şehswarin piyadeyan azan

Berdî Nîşan û kolkî meydan (Dîwan, r 211)

Di vê helbestê de helbestvan behsa neteweya xwe diket û weha dide naskirin ku bi dirêjahîya dîrokê Kurd neteweyeka baş û camêr û qehreman bûye, "bi çavê bilind kirinê ji neteweya Kurdan û sîfetên bilind ên Kurda dinêre û bi jêhatî û camêrîya ciwanên Kurd de gotîye û ji me re bas kirîye ku dîrok pirr e ji wesfa qehremanên Kurd û dîrokeke pîroz"¹¹⁴. Helbestvan digel wan rexneyên ku li neteweya xwe girtîne, pesna neteweya xwe jî dîke û ji me re dibêje ku di dîroka me de ewqas bûyer û mîr hene ku em şanazîyê bi wan re bikîn û wesfa ciwamêrîya ciwan û mirovên Kurd dîke. Ev vegeryane jî ji bo dîroka xwe li ba Hacî Qadirê Koyî hestekê Nostalojîyê berhem dihîne, çimkî ew bas kirin di encamê zêde hizir kirin û xwastekên zêde yên Hacî ne ji bo berev pêşveçona Kurdan, çimkî di gelek cihan weha rexne kirine ku Kurd digel hev nikarin xwe li hev bînin. Ev cureyê vegeryanê jî ji bo dîroka neteweyî hestekê Nostalojî yê giştî ye an jî civakî ye, ji ber ku ew xem û diltengîye hesreke ku li ba hemû kesekê Kurd çê dibe di dema hizir kirin ji dîroka xwe, Hacî jî weke mirovekê rewşenbîrê Kurdan ev xem û hestên bi êş li hemberî neteweya xwe bi awayekî zêde di nav dilê xwe de berhem anîye.

2.5.3. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Kesayetîyên Neteweyî:

Ev cureyê Nostalojîyê bi gelemperî li ba pirranîya helbestvanan tê bikaranîn, ku pêk dihêt ji vegeryanê ji bo kesayetîyên dîrokî û neteweyî. Ew kesayetî jî dibe ku kesayetîyekê Siyasî be an jî helbestvanekê kevnar be ku niha di jiyânê de nema be, an jî kesayetîyekê ayînî, dengbêj û nîgarkêş be, wate "anîna kesayetîyan bi rêya navanînê, an jî navanîna navudengê wî/wê, divêt ew kesayetî di nav helbestê de weke pîrensîpeke xwedî, an jî giştî bihêt bikaranîn, çimkî eger di têkistê de nebin, wê demê ew têkist hêza xwe ya remzî û bandora helbestê wê ji dest bide"¹¹⁵ Navanîn û bikaranîna kesayetîya ji aliyê helbestvanan ve ciwanîyeke zêdetir didin helbetên xwe

¹¹⁴ Mihemedî Mela Kerîm, *Dû Babet Lebarey Hizir û Şî'ri Hacî Qadirî Koyî*, r 86.

¹¹⁵ Ehmed Tel'emmet Helebî, *Tenas Beyne L-Nezerîyet Wel-Tetbîq Şî'ri L-Beyatî Nemewzica, EL-Heyet L-'Amet L-Surîyet L-kitab, Dîmeşiq, 2007, r 216-217.*

û hêza wan têkistan zêdetir dibe. Herweha navanîna wan kesayetîyan ji alîyê helbestvanan ve bi sedemên curbicur e, hinek ji wan jî ewe ku helbestvan dixwaze weke şanazîyeke neteweyî behsa wan bike, ku wî/wê kesayetîyê neteweyî karek ji bo neteweya xwe encam dabe û helbestvan wan kesayetîyan dike nimûneyên bilind yên neteweya xwe daku bibin şîret ji mirovên neteweya wî/wê re. Hacî Qadirê Koyî jî di nav têkistên helbestên xwe de bi awayekî zêde navê helbestvan û kesayetîyên Siyasî anîye ku di dîrokê de kiryarên baş ji neteweya xwe re encam dane û pesna wan bi awayekî bilind dide zanîn di nav helbestên xwe de. Weke di helbesteka xwe de behsa helbestvanên berê û serdema xwe dike, ku bi rêya navanîna wan hesret û xema xwe ji wan re dertêxe û pesna astê wanê bilind dike di nav dîrokê de, ku weha wesfa wan diket:

Şehswarî belaxetî Kurdan

Yekketazî fesahefî Baban

Mistefaye texellusî Kurdî

Xezelî kirde berbutî Kurdî

Nawî Sahêbqiranî xasî ewe

Çunke lem 'erse espî ew bedewe

Ew ke noşî şerabekî tallî

Nalî lew 'erseda bûwe tallî

Nalî ustadekî gelê ça bû

Xizrî abî heyatî me'na bû (Dîwan, 217)

Xuyaye Hacî Qadirê Koyî di vê helbestê de navê Helbestvanên mezin yên serdemê xwe anîye ku niha di asta neteweyî de bi awayekî bilind û payeyên mezin dihên hejmartin, Hacî navê Nalî û Kurdî anîye û bi swarên belaxeta Kurdî dide naskirin û mamoste û xudan ezmûnên bilind di mijara belaxet û ziman û nivîsînê dadinê, "merem ji navê Xizir jî hem navê Nalîyê helbestvanê meznê Kurdan e û hem jî hezretê Xizir e ê navdar bi Xizrê Zînde, çimkî wî ava jiyane yê vexarî û hertim bi zindî vedimîne"¹¹⁶. Herweha Hacî li ser helbesta xwe didome û navê hinek helbestvanên din jî anîye dema dibêje:

¹¹⁶ Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mistefa Şareza, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, r 217.

Salîm û meşwî, şêx reza û xeste

Şa'îran her çwarî berceste

Wek wefayî keme le şu'rayî

Xetî wek beytî çak û espayî (Dîwan, r 218)

Di vêrê de jî helbestvan ji bo komek ji helbestvanên din yên neteweyî vedigere wek Salîm, Meşwî, Şêx Reza, Xeste û Wefayî, ku ev jî helbestvanên navdar ên Kurd in û yada wan dike. Herweha Hacî Qadirê Koyî tenê wesfa helbestvanên zaraweya Soranî nake, belkî di astekê bilind yê neteweyî di hizire û li wesfa helbestvanan behsa helbestvanên Kirmancî jî dike. Ewe jî bûye sedem ku Hacî weke helbestvanekê pîrr girîng yê neteweyî bihêt hejmartin, çimkî xem û hesretên wî ne tenê ji bo beşek li dîroka Kurdan bûye an jî tenê wesfa helbestvanên cihekê diyarî kirî nekirîye, belkî bi giştî wesfa helbestvanên Kurdan kirîye û di xema hemû navçeyên neteweya xwe bûye, weke ku di dirêjahîya helbesta xwe de dibêje:

Be fidayan dekem sed Ibnu Yemîn

Çunke derbestî xîretî Kurdîn

Le Cizîre yekêke Şêx Ehmed

Sahîbî naw û murşîdî Erşed

Ewî Camî gutûyetî emeye

(pîremerdî bidîdem zi Cizîr

Nîk merdî bidîde em zi herîr)

Ehmedî xanî sahîbî Mem û Zîn

Şahbazî fezayî 'îllîn

Xelefî ew debîn le Godîngan

Le Cizîr pêy delên: Feqêy Teyran

Şa'îrî êre gerçî zor mawîn

Em dû sêyen ke wa le pêş çawîn (Dîwan, 219-220)

Di vê helbestê de Hacî Qadirê Koyî navê Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqêyê Teyran dihîne. Bi vî awayî bi rêya navanîna helbestvanên kevnar derûnê xwe ji nexweşî û xem û êşa tenêtiya welatê xerîbîyê rizgar dike û derûnê xwe rehet diket. Herweha helbestvan digel nav anîna wan, pesna wan jî bi awayekî bilind li hemberî

helbestvanên din yên neteweyên din dadinê û bi nimûneyên herî bilind di astê neteweyî de dide zanîn, herweha Hacî wan helbestvanan weke gewherên herî bi qîmet yên neteweyî dadinê ku careka din yên mîna wan dûbare nabin. Ev yad kirine jî bûye sedemê hindê ku Hacî Qadir hest bi xemgînîyeke zêde biket ji bo wan helbestvanan. Ev hestê Nostalojî li ba Hacî hestekê giştîye, çimkî ev kesatî ku Hacî di nav helbestên xwe de anîne kesatîyên neteweyîne û eleqeya wan bi dîroka hemû Kurdistan re heye û hestekê giştîye ji bo Kurdistan. Herweha Hacî Qadir girîngîyeke zêde bi mijara nivîsînê daye û li ser wê mijarê jî xemeke zêde ji bo dîroka Kurdistan xwarîye, ku beşeke zêde ji dîroka Kurdistan û kesayetîyên dîrokî wenda bûne, bi sedema ne nivîsînê bi zimanê Kurdî an jî nebûna nivîsan bi zimanê Kurdî, ku bas kirina wan pirsgirêk û xeman bi rêya vê helbestê dertêxe..

Were ba bot bikem basî nîhanî

Tefennun xoşe ger çakî bizanî

Selaheddîn û nûreddînî Kurdî

'Ezîzanî Cezîr û Mûş û Wanî

Muhelhel, Erdeşêr û deysemî şêr

Qubad û Baz û Mîrî Erdelanî

Emane pakyan Kurdin, nîhayet

Leber bê defterî win bûn û fanî

Kitêb û defter û terîx û kaxez

Be Kurdî ger binûsraye zubanî

Mela û Şêx û Mîr û Padşaman

Heta mehşer dema naw û nîşanî (Dîwan, 152-153)

Hacî Qadirê Koyî ne tenê xem û kovanên xwe ji bo wan kesan aşkera kirîye ku navên wan di nav dîrokê de bi awayekî zêde hatîye, belkî Hacî hesreta xwe ji wan xebatkar û mirovên mezin jî daye nîşandan ku di nav rupelên dîrokê de wenda bûne û tu kesî û li tu cihan behsa wan nehatîye kirin bi sedema tunebûna nivîsên dîrokî bi zimanê Kurdî. Ewe jî sedemeka herî zêdeye ku bûye egerê hindê ku ev kesayetîyên Hacî di nav helbesta xwe de navê wan anîye û dîroka Kurdistan di nav rupelên dîrokê de tunebe li hemberî dîroka netewe û welatên din, "Hacî suça wenda bûna dîroka teji ji

şanzîyê ya neteweya Kurdan vedigerande ser nebûna nivîs û helbestan bi zimanê Kurdî û digot eger heta niha bi zimanê xwe me tişt bi nivîsandiba em jî mîna neteweyên din çandêke mezin û dewlemend ji zanîn û helbest û dîrokê hedibû"¹¹⁷. Ev jî tê wê wateyê ku Hacî xem û hesretek mezin ji bo dîrokeka dewlemend û pirr şanzî xwarîye, ku beşeka pirr ji wê dîroka pirr serwerî bi sedema ne nivîsandinê ji nav çûye û her eve jî bûye sedemê hindê ku hestê Nostalojîyê li ba Hacî derkeve û behsa wê dîrokê biket, suçê vê çendê jî dide ber nebûna nivîsînê bi zimanê Kurdî.

Cureyekê din ji Nostalojîyê li ba Hacî Qadirê Koyî Nostalojîya xem û hesret xwarinê ye li zimanê Kurdî. Nostalojî û xem xwarina Hacî ji bo hejarîya zimanê Kurdî an jî ji bo kêmfîya nivîsînêye bi zimanê Kurdî bi awayekî zêde derdikeve û xem û hesreta vê feqîrîyê ji bo zimanê Kurdî di helbestên Hacî rengvedan kirîye.

Kurdî axir billê çîye 'eybî

Her kelamî heqe nîye 'eybî

Lefzî Kurdî billaw nebû gird bû

Wa le mabeynî êmeda têçû

Le fesahet billa mu'erra bê

Çi qiyamet be Ermenîş nabê

Be zubanî keç û xetî xwarî

Be cerîde û kitêbî xellwarî

Çûne rîzî mu'ezzematî mîlel

Weqte xoyan hîsab biken be dûwel (Dîwan, 237)

Hacî di vê helbestê de weha wesfa zimanê Kurdî diket û weha bilind diket, dibêje zimanê Kurdî tu 'eybek û kêmasîyek tê de nîna, herweha dibêje belaxet û rewanbêjîyeka bi hêz di zimanê Kurdî de heye. Lêbelê digel vê wesfê jî zimanê Kurdî dide ber rexneyên xwe û zimanê Kurdî û nivîsîn bi zimanê Kurdî bi nivîstî li qelem dide, dibêje çima û ji bo çî em bi zimanê xwe na nivîsîn û bi zimanê Farisî û "Erebî dinvîsîn, bi taybetî jî zimanê "Erebî, çimkî pirranîya nivîsînên wê çaxê bi zimanê "Erebî bûne. "Hacî Qadir behsa paşketîyê diket ji alîyê xwendewarîyê ve, çî pênevêt ji bo wê heyamê rast dibêje. bi taybetî jî ji alîyê xwendewarîyê ve di astekê gelek

¹¹⁷ Mihemedî Mela Kerîm, *Dû Babet Lebarey Hizir û Şî'rî Hacî Qadirî Koyî*, r 35.

nizim de bûye, bi taybetî ji alîyê zimanê Kurdî ve, yê ku aşkeraye ewe hucreyên mizgeftan navendeke xwendinê bûye ew jî tenê zanistên şerî'eta Îslamê û zimanê "Erebî dihat xwendin"¹¹⁸ ev çende jî weha kiribû ku Hacî Qadr rexneyan ji vê çendê bigire, ji wan kesên ku ji bilî zimanê Kurdî zimanên din dikin zimanê nivîsandinê, weke di vê helbestê de jî dibêje:

Ya legel Farisî çî ferqî heye

Boçî ew raste, boçî em keçeye

Ba wicûdî eger bikey dîqqet

Tê degey kam le kamîye sîrquet

Çûnke ême qedîmtirîn le ewan

Be tewarîxî cumleyî edyan (Dîwan, 237)

Li gorî helbestvanê me zimanê Kurdî ji zimanê Farisî kevintire, ji ber hindê jî dibêje: ji ber çî zimanê wan baş e û zimanê me xerab e, "zimanê her neteweyekî ji bo wê hindêye daku ew netewe dîrok û karên xwe pê encam bide"¹¹⁹. Ev girîngî dane jî bi zimanê 'Erebî û Farisî li ba Kurdan di wê heyamê de bûye sedemê çê bûna hestekê kur ji Nostalojîyê li ser zimanê Kurdî li ba Hacî Qadirê Koyî û xemeka zêde ji bo zimanê xwe bixwe û rastî hestên Nostalojî û rastî hizir kirin ji paşeroja zimanê netewya xwe bihêt, bi sedema feqîrî û hejarîya kitêban bi zimanê Kurdî ku ji alîyê helbestvanan rengvedan kirîye. Herweha ev girîngî dane jî bi mijara xwendin û nivîsandinê bi zimanê Kurdî ji alîyê Hacî Qadirê Koyî ji bo bilindîya hestê netewatîya helbestvan vedigere, ku xem û hesret ji bo wê paşketina neteweya xwe xarîye û xwestîye êdî Kurd jî mîna neteweyên din dest bavêjin zimanê xwe û bi zimanê xwe bixwînin û binvîsin.

2.5.4. Nostalojîya Vegeryan Ji Bo Efsaneyan:

Ev cureyê Nostalojîyê ji bo Efsaneyên neteweyî û Çanda neteweyî û Cîhanî li ba helbestvanan bixwe digire. Helbestvan bi van awiran hestekê giştî berhem dihînin û ev heste yadgarî û hizreka giştî li ba tevahîya mirovan berhem dihîne, çimkî hemû

¹¹⁸ Marif Xeznedar, Mêjûy Edebî Kurdî, Bergê Çarê, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2004, r 183.

¹¹⁹ Mihemedî Mela Kerîm, *Dû Babet Lebarey Hizir û Şî'rî Hacî Qadirî Koyî*, r 33.

mirov tê de bejdar dibin û hesret û xem xwarin ji bo wan Efsane û çanda neteweyî dibe para civakekî an jî neteweyekî.

Hacî Qadirê Koyî di helbestên xwe de gelek caran ji bo wan axftin û Efsaneyan vegeryaye ku di çanda Kurdan de û li ba mirovên berê hatîye vegêran, wate Hacî di helbestên xwe de hestekê Nostalojîyê giştî çê kirîye ku eleqe bi tevahîya neteweya wî ve heye, ew jî bi rêya vegêrana gotinên pêşîya, ku çandeke herî dewlemende li ba hemû neteweyan, hinek Nimûneyên helbestên Hacî ku weha dibêje:

Şêr wekû mûre le lay zulfî kemendî endazey

Fîle Mêşûle ye, lêy labde, 'Enqaş Megese (Dîwan, r 124)

Hacî di vê helbestê de ji bo dû mijarên çanda Neteweyî vedigere, yek ji wan gotineka pêşîya ye, dema dibêjin: Fîl kire Mêş an jî Mêş kire Fîl. Ev gotina pêşîya ji bo wan kesan dihate bikaranîn, ku karekê mezin biçûk dikir û ji bo wan jî yên ku karekê biçûk mezin dikin. Herweha mijareka din ku di vê helbestê hatîya bikaranîn ewe dema Hacî navê Teyrekê Efsaneyî dihîne ew jî teyrê 'Enqa ye, ev Teyrê Efsaneyî di nav Çanda pirranîya neteweyên Rojhilatê de heye.

Rostemî Mazenderan ew weqte destî birdewe

Hate rêy (Dêwî Spî) azane destî kirdewe (Dîwan, r 134)

Di pirranîya hekayet û çîrokên Efsaneyî navê Dêwên Reş dihête bihîstin, lêbelê Hacî di vê helbesta xwe bi wesfeka cuda ji wesfa wan çîrokên Efsaneyî navê Dêw dihîne û nevê Dêwê Spî dibêje ji şuna Dêwê Reş.

Emêstê Mûrî xettî Maç be wechî tuhfe ger bènê

Eger laqî Kuley pêda Suleyman xatemî dawe (Dîwan, r 145)

Hinek Efsane û çîrok hene ku girêdayî çanda gelek neteweyane û di nav wan neteweyan dihête vegêran, yek ji wan çîrokan jî çîroka hezretê Suleyman e, "Nîşaneyê ji bo wê çîroka hezretê Suleyman dema hemû Canewer xelat û diyarîyan ji wî re di anî, mûrîyek jî lingekê Kuley ji bo bir"¹²⁰. Herweha Hacî di helbesteka din jî behsa kesatîyekê din dike ku di nav hejmareka zêde ya çanda neteweyan de heye ew jî Hezretî Xizre. Li gorî çîrokên efsaneyî û têkistên dînî weha behsa Xizir dikin, ku wî ava heyatê yê vexwarî û ew nemire, Hacî jî weha navê Xizir anîye:

¹²⁰ Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mistefa Şareza, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, r 245.

Le 'eynî le'lî kanî sebzî bû be mîwanî

Nenazê ba xizir Êtir ke meşhûre be heywanî (Dîwan, r 175)

Gotinên pêşiya li ba Hacî zêde hatîye bikaranîn, Hacî xwestîye bi sedema wan gotinên pêşiya, armanc û nameya xwe ji xelkî re bibêje, herweha Hacî gotineka pêşiya gelek caran dûbare kirîye lê bi formên cuda cuda û weha dibêje:

Bax û raxî bulbule deykate cêy zax û ze'en

Gurg û Mam Rêwî le bêşe û laney şêran dadenê (Dîwan, r 183)

Şêrî dirrinde wek le bêşe nema

Gurg û Mam Rêwî dêne reqs û sema (Dîwan, r 214)

Herke bîstim pêm delê: Hacî Segî derganeme

Min le tirsî gurgî bedkarim kerî xom bestewe (Dîwan, r 135)

Di van nimûneyan de Hacî wê mebestê digêhijîne, dema ji şuna kesên zîrek û baş hinek kesên din xwe xuya dikin, an jî dema kesên bihêz û zîrek li meydana nebin kesên ne baş di wan meydana pesna xwe didin, di gotinên pêşiya de Şêr nîşaneyê bihêzîyê ye û Gur û Ruvî jî nîşaneyê ne başî û hîlebazîyê ye, Hacî jî weke Gotinên pêşiya bikaranîye, "Hacî neveroka wan ji gotineka pêşiya wergirtîye ku dibêje: ji cihê Şêran Ruvî dikin gêran"¹²¹ wate Hacî hizir û Endêşeya helbesta xwe ji gotinên pêşiya wergirtîye daku hêz û naveroka helbesta xwe bihêz bike, ku bi sedemê wê hindê hestekê Nostalojîyê giştî berhem anîye. Herweha Hacî di helbesteka din de vedigere ser gotineka din ku bi gotinên pêşiya dihête nas kirin dema dibêje:

Dest û pêy ew Padşahî husne kwêlem pê delên

Hênde engustî peşîmanîm le hesret gestuwe (Dîwan, r 137)

Ev gotin hertim li ser Ezmanê mirovîye demê dibêjin wî karî neke, neku hûnê poşman bibin û destê xwe bigez in. bingeha vê gotinê jî di nav çanda Kurdan de Dîrokek pirr dirêj heye û di zemenekê dirêj veye ku tê bikaranîn. Hacî jî li ser ezmanên wan ev gortin di helbesta xwe de bikaranîye.

Ev curyê vegeryanê jî ji bo efsaneyên berê û gotinên pêşiya hestekê xemgînî li ba mirovan çê dike, ku bi Nostalojîya giştî dihête nas kirin. Hacî daku hinek ji hesret û

¹²¹ Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mistefa Şareza, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, r 214.

xemên xwe kêr bike bala xwe daye ser van gotinan û bi wan çîrokan ku di çanda neteweyan de hatîye bikaranîn hestê xwe li ser rûpelan gotîye, bi sedema hindê ku ev gotin eleqeya wan bi tenê kesekî ve nîne, belkî eleqeya wan bi komek ji mirovan an jî bi neteweyekî û çend neteweyekan ve heye. di polîn kirina curên Nostalojîyê de dikeve nav Hestên Nostalojîya giştî.



Encam

Li dawîya vê vekolînê û piştî ku me Nostalojî da ye şirove kirin û bi awayekî piraktîkî rengvedana Nostalojîyê di nav helbestên Hacî Qadirê Koyî hatin şirove û piraktîze kirin. Em dikarîn weha bidin zanîn, ku ew encamên hatine bi destxistin ev çend xalên li jêr in:

Di vê vekolînê de ev yek ji me re aşkera bû ku Nostalojî pêkhatîye ji hesret û xem xwarinê ji bo rojên xweş û ew buhayên ku hafîne ji destdan û ew tiştên mirov hêviya hebûna wan dixwaze, çî giştî bin an jî taybetî bin. Herweha Hacî Qadirê Koyî bi sedema dûrketin ji warê xwe û derbider bûna wî ji bo bajarê Istanbulê rastî hestên Nostalojî yên kur hatîye. Çimkî Hacî Qadir bi heza xwe bajarê Koyê bi cih nehiştîye, belkî ji ber wê dijberî û zordarîya ku Axa û Melayên Koyê digel Hacî dikir, Hacî neçar ma terka bajarê xwe bike. Herweha Hacî Qadir di bajarê Istanbulê û piştî malbata Bedirxanîyan ji alîyê Osmanîyan derbider bûn, Hacî jî piştî wê bûyerê rastî rewşeke dijwar û awarte dihêt. Bê cih û kes dimîne di nav Istanbulê de. Ev yeke jî dibe sedemeke berçav ji bo çêbûna hestên Nostalojîyê.

Ji alîyê rengvedana cureyên Nostalojîyê li ba Hacî Qadirê Koyî, em gehiştî wê encamê ku li ba Hacî Qadir herdû cureyên Nostalojîyê yên Xwedî û Giştî bi awayekî zêde hene. Ew hestên Nostalojîya xwedî ku li ba Hacî Qadir hene ev in: vegeryan ji bo serdemê ciwanîyê, vegeryan ji bo bajar û gund, vegeryan ji bo xwezayê, dûrî ji malbat û hevalan, dûrî ji me'suqê, hestê ji destdana hevlekî an jî mirovekê malbatê, hestê Pîrî û hizir kirin ji mirinê. Herweha ew hestên Nostalojîya giştî jî ev in: Hestê dûrîyê ji welat, bîranînên dîrokî û neteweyî, vegeryan ji bo kesatîyên neteweyî, vegeryan ji bo dastan û efsaneyan, vegeryan ji bo hekayet û mijarên folklorî.

Hebûna hestê neteweyî li ba Hacî Qadirê Koyî sedemeka serekî ye ji bo çê bûna Nostalojîya giştî li ba wî. Çimkî bi sedema hindê ku hertim neteweya Kurdan ji alîyê dûjmina ve mafên wan hatîne xwarin û bin dest kirin. Ji ber vê çendê jî ev cureyê Nostalojîyê bi awayekî zêde di helbestên wî de rengvedan hebûye. Herweha bê kesî û dûrbûn ji xizim û hevalan sedemeka serekîye ji bo çêbûna hestên Nostalojîya xwedî. Çimkî Hacî Qadir di temenekê zû de dê û bavê xwe ji dest dide. Pişt re jî ji hemû

kesên xwe vediqete û dûrî her kesî jiyana xwe didomîne ev çende jî zorê û zehmetîyê ji Hacî re anîye.

Ji alîyê mijara ziman ve, Hacî Qadir bi zimanekê sade helbestên xwe afirandine. Çimkî xem û hesretên Hacî Qadirê Koyî bi awayekî zêde girêdayî civakî ve ye. Wate Hacî Qadir xwestîye gel helbestên wî bixwînin, daku hejmareka zêde ji mirovan bikevin dîv şopa wî. Ev yeka jî bûye sedem ku Hacî Qadir rexne û şîretên xwe bi zimanekê hêsan bibêje ji bo ku herkes ji peyama wî fehm bike û sedema rexne û Nostalojîya wî bizanibin.

Sedemeka din ji bo çêbûn û derketina hestên Nostalojîyê li ba Hacî Qadirê Koyî kesatîyên dîrokî û helbestvanên berê bûne. Bi taybetî jî Ehmedê Xanî, ku di vê lêkolînê de ev yek bi aşkera ji bo me jî xuya bûye û Hacî Qadir di gelek cihan de vê yekê amaje dike û Ehmedê Xanî weke nimûneyeka herî bilind dibîne.

Çavkanî

Çavkanî bi zimanê Kurdî:

- Bextiyar Elî, *Naşiwên*, Weşanxaneya Karox, Çapa Yekem, Silêmanî, 2019.
- Cegerxwîn, *Kî Me Ez*, Weşanxaneya Avesta, Çapa Şeşan, Îstanbul, 2014.
- Edîb Qadir, *Geranewe Bo Malî Yekem*, Weşanxaneya Hacî Haşim, Hewlêr, 2014.
- Eta Qeredaxî, *Govarî Raman*, Hejmara 262, Hewlêr, 2019.
- Ferhad Pîrbal, *Rêbaze Edebîyekan*, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2004.
- Gîwî Mukiryar, *Ferhengî Kurdistan*, Çapa Dûyem, Weşanxaneya Rojhilat, Hewlêr, 2017.
- Hejarî Mukiryarî, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Çapa Yekem, Tehran, 2014.
- Helmet Bayîz Resul, *Rehendî Nostalojî Le Çiyayekanî minî Hendirên Da*, Govarî Zankoy Soran, Soran, 2018
- Heme Se'îd Hesên, *Şî'r û Şimşêr*, Çapa Yekem, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2004.
- Hîmdad Husên, *Rêbaze Edebîyekan*, Çapa Sêyê, Weşanxaneya Rojhilat, Hewlêr, 2014.
- Kerîm Deştî, *Ebeb û Felsefe*, Weşanxaneya Şehab, Çapa Yekem, Hewlêr, 2013.
- Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergê Çarê, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2004.
- Mela Ebdulkerîmî Muderîs û Fatîh Mela Kerîm, *Dîwanî Nalî*, Çapa Dûyem, Tehran, 2010.
- Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, Bergê dûyê, Weşanxaneya Aras, Çapa Dûyem, Hewlêr, 2010.
- Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, Bergê sêyê, Weşanxaneya Aras, çapa dûyem, Hewlêr, 2010.
- Mes'ud Mihemed, *Hacî Qadirî Koyî*, Bergê Yekê, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2010.
- Mihemed Ehmedî, (Lemer Nostalojiyawe), *Govarî Raman*, Hejmara 196, Hewlêr, 2013.
- Mihemed Ferîq Hesên, *Hêmin û Bonî Xerîbî*, Çapa Yekem, Weşanxaneya Aras, Hewlêr, 2008.

- Mihemedî Mela Kerîm, *Dû Babet Lebarey Hizir û Şî'rî Hacî Qadirî Koyî*, Weşanxaneya Aras, Çapa Dûyem, Hewlêr, 2008.
- Pexşan Sabîr Hemed, *Remiz Le Şîrî Hawçerxî Kurdî Kirmancî Xwarûy Kurdistan*, Hewlêr, (1970-1991).
- Rêbwar Sîweylî, *Hawkatî û Hawşunasi*, Weşanxaneya Wezaretê Perwerdê, Hewlêr, 2004.
- Rêbwar Sîweylî, *Kitêbî Hacî Qadirî Koyî*, Weşanxaneya Rojhelat, Çapa Yekem, Hewlêr, 2016
- Rehîm Luqmanî, Nalî û Nostaliyî, *Govarî Zirêbar*, Hejmara 79, Îran, Merîwan, 1391.
- Reza Seyd Husênî, *Qutabxane Edebîyekan*, Wergêr: Heme Kerîm Arif, Weşanxaneya Wezaretê perwrdeyê, Çapa Yekem, Hewlêr, 2006.
- Sebah Îsma'îl, *Çemk û Êstatîkay Şwên Le Edeb da*, Weşanxaneya Aras, Çapa Yekem, Hewlêr, 2009.
- Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mistefa Şareza, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, Weşanxaneya Kurdistan, Sine, 1390.
- Serkewt Se'dî Qadir, *Namoyî Le Romanî Selah Omer Da*, Weşanxaneya Hacî Haşim, Hewlêr, 2011.
- Şêzad Hesên, Nazîla û Namoyî û Nostaliyay Nexos, *Govarî Raman*, Hejmara 210, Hewlêr, 2014.
- Siwarey Îlxanî Zade, *Xewe Berdînekan*, Weşanxaneya Selahedînî Eyubî, Çapa yekem, Îran, 1372.
- Soran Mamend, *Nostalojiya Le Şîrî Hawçerxî Kurdî Da*, Weşanxaneya Taran, Çapa Yekem, Tehran, 2016.
- Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Bergê Çare, Weşana Ehmedê Xanî, Çapa Yekem, Soran, 2018.
- Tel'et Tahîr Hemed 'Elî, Ferayendê Nostaloji û Muelefhayê an der Eş'arê Fenaî, *Govarî twêjer*, Bergê Yekê, Hejmara Yekê, Soran, 2018.
- Zülküf Ergün, *Nerît û Helbest*, Weşanxaneya Nûbehar, Çapa Yekem, Istenbul, 2017.

Çavkanî bi zimanê Îngilîzî:

- Barbara Cassin, *Nostalgia*, New York_U.S.A, 2016.
- Boym, Svetlana, *Nostalgia and Its Discontents*. The Hedgehog Review, 2007.

David J. Davies, *Memory and Nostalgia for the cultural Revolution*, Washington, 2002.

Hilary Dickinson and Michael Erben, *Nostalgia and Autobiography: The Past in the Present*. University of Southampton, UK, 2006.

Hirsch A. R, *Nostalgia: A Neuropsychiatric Understanding*. Advances in Consumer Research, North American, 1992.

Hornby, A. S, *Oxford advanced learner's dictionary*, Oxford University, London, 2003.

Jan Willem Duyvendak, *The politics of Home*, University of Amsterdam, Netherland, 2011.

John j.su, *Ethics and nostalgia in the Contemporary novel*, Cambridge University, London, 2005.

Michael S. Roth, *Dying of the Past: Medical Studies of Nostalgia in Nineteenth Century France*. History and Memory, France, 1991.

Nora P, *Between Memory and History: Les Lieux de Memoire*. Representations, University of California, America, 1989.

Pickering M. and E. Keightley, *The Modalities of Nostalgia*. Current, Sociology, London, 2006.

Sandra Garrido and Jane W. Davidson, *Music, Nostalgia and Memory*, Western Sydney University, Australia, 2019.

Stephen Cheek, *Byron and place*, Bristol, UK, 2003.

Sullivan L. G. O, *Dying for Home: The Medicine and Politics of Nostalgia in Nineteenth-Century France*, Queen Mary University, London, 2006.

Summers, Della, and Adam Gadsby, eds. "Longman dictionary of contemporary English.", London, 1995.

Wildschut, Sedikides and Arndt, *Nostalgia: Content, Triggers, Functions*. Journal of Personality and Social Psychology, Southampton, 2006.

Çavkanî bi zimanê Farisî:

Alin Aras, *Rewansnasîyê Şexsiyat*, tercemê: Siyawş Cemal Fer, Çapa Dûyem, Tehran, 1375.

'Elî Ebasabad, Yusif, *Xem û Xurbet Der Şî'rê Me'asir*, Danişgahê Peyamê Nûrê Semnan, Îran, 1387.

Hesen Anûşê, *Ferheng Nameyê Edebîyê Farisî*, Berga Dûyem, Çapa Yekem, Tehran, 1376.

Karil Gostav Yong, *Royaha û Endêşeha*, Tercemeyê Perwîn Feramerzî, Meşhed, Îran, 1370.

Kuruşê Sefewî, *Ez Zibanê Şinasê Bê Edebyat*, Berga Yekem, Tehran, 1380.

Mehdî Şerîfiyan, *Beresê Ferayendê Nostalojiyê Xem Xurbet der Eş'arê Sohrab Sêpherî*, *Govara Edebyata Farsî Zanîngeha Sîstan û bilûcistan*, Îran, 1386.

Mehmud Behbahanî, *Zeruretê Bazengerî Der Bexşê Terkîbatê Xariciyê Ferhengê Farisiyê Mû'în*, Îran, 1352.

Mehmud 'Ebasî û Yeşub Fuladî, *Beresê Nostalojî Der Şî'rê Menuçehrê Ateşî*, *Edebyata Farisî Mi'asir*, Sala 3, Hejmara Dûyem, Îran, 1392.

Mercan Kamiyat û Mihemedî, *Semîyê Beresê Ferayendê Nostalojî Der Eş'arê Mihemedemîn Şêx l-Salim(Hêmin)*, *Govarî Edebyata Kurdî*, Sala Dûyem, Hejmara 3, Sine, 1395.

Mihemed Ce'fer Mistefa, *Rabête*, Weşanxaneyê Nêgah, Çapa Dûyem, Tehran, 1384.

Nesrullah Îmamî, *Mebanî û Rewanşinasîyê Neqdê Edebî*, Tehran, 1378.

Rabert Seyr û Lûy Mîşêl, *Romantîsim û Tefekirê Ictimaî*, Çapa Dûyem, Tehran, 1383.

Zîgmond Firyîd, *Rewanşnasî*, Tercemeyê Mehdî Efşar, Tehran, Kawyan, 1363.

Çavkanî bi zimanê 'Erebî:

Ehmed Sabir Mihemed 'Elî, *El-Me'reb Mîn L-Lefaz L-Hizaret L-Madîyet Fî El-Qamus L-Muhît: Dîraset Tarîxîyet Fî Zewî L-Me'anî L-Mecumîyet*, Misir, 2012.

Ehmed Tel'emet Helebî, *Tenas Beyne L-Nezerîyet Wel-Tetbîq Şî'ri L-Beyatî Nemewzica*, EL-Heyet L-'Amet L-Surîyet L-kitab, Dîmeşiq, 2007.

Fethîye Dexmûş, *Tecrûbet L-Xerbîyetî Wel-Henîn Fî Şî'r Îbin Xefacet El-Endelûsî*, (Teza Lîsansa Bilind), Zanîngeha Mentûrî, Cezaîr, 2005.

JİYANNAME

Di sala 1995an de li gundê Sardawê a navçeya Barzan li derdora Hewlêrê hatîye dine. Dibistana seretayî, navincî û amadeyî li bajarê Soran xwendîye. Pişt re jî di sala 2017an de li Zanîngeha Soran Beşa Ziman û Edeba Kurdî qedendîye.





VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



17/01/2020

Tez Başlığı / Konusu

NOSTALOJİ Dİ HELBESTÊN HACİ QADİRÊ KOYÎ DE

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 103 sayfalık kısmına ilişkin, 17/01/2020 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından % 5 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezin benzerlik oranı % 5 (Yüzde Beş) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç.
- Teşekkür hariç.
- İçindekiler hariç.
- Simge ve kısaltmalar hariç.
- Gereç ve yöntemler hariç.
- Kaynakça hariç.
- Alıntılar hariç.
- Tezden çıkan yayınlar hariç.
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

17/01/2020

SHAKHAWAN KHOSHAWI MUSTAFA DOLAMARI
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı :SHAKHAWAN KHOSHAWI MUSTAFA DOLAMARI
Öğrenci No :17950001024
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Programı : Örgün Eğitim
Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

17/01/2020

ENSTİTÜ ONAYI

UYGUN DEĞER

17/01/2020

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Anabilim Dalı Başkanı